

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliya navîn

bîrnebûn

PAYÎZ/2009



bîrnebûn

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.
Sê mehan carekê derdikeve / Üç ayda bir çıkar.

Utges av Apec-Förlag AB

Hejmar 43 payiz 2009

Ansvarig utgivare

Ali Çiftçi

Redaksiyon

A. Çiftçi, Dr. Mikailî, H. Erdoğan, M. Bayrak, I. Türkmen
M. Duran, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Sefoyê Asê, Vahit Duran

Adress

Navnişana li Swêdê

Box: 8121, SE 163 08, Spånga/Sverige

Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

E-post

info@birnebun.com

Internet

www.birnebun.com

Têkili/lîşkî

Danimarka: Irfan Baysal, 0045-27 11 58 83

Avusturya: Cüneyt Dagdalan, 0043-69 91 11 55 294

Belavkirin / Dağıtım

Ewropa: Muzaffer Özgür/Birnebûn

Postfach 900348 , 51113 Köln / Almanyay

Tfn: 0049-172 298 24 51

Türkiye/Ankara:

Dipnot Kitebevi, Selanik Caddesi No: 82/32

KIZILAY / ANKARA

Tfn: 0312-419 29 32

Anatolia Muzik Center

Cumhuriyet Mah. Turan Cad. No: 29 A

Polatlı-Ankara

Tfn.: 0090-312-622 94 36

İstanbul: Selahattin Bulut/Medya Kitapevi

İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Fiyatı

Europa: 5 Euro • Türkiye: 2,5 YTL

Abone

Swêd: 400 SEK • Almanyay 40 Euro

Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

İsveç hesap numarası

(Birnebûn) postgiro: 468 65 12-7

Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê / İsveç dışındaki aboneler için

APEC, "Birnebûn" PlusGiro-Stockholm/Sweden

BIC: NDEASESS

IBAN: SE85 9500 0099 6026 4686 5127

Çap / Baskı

Apec-Tryck AB

ISSN 1402-7488



Hesê Feqês û kebanîya xwe

Her nivîskar berpîrsê nivîsa xwe ye.
Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Birnebûnê re
tên, serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li
xwedîyan nayên vegeandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û
Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.



Wêneya li berga pêşîn:
Bi cil û bergên xwe ve keç û jineka ji Anatoliya Navîn



- 2 Sala nû pêroz be! – *Ali Çiftçi*
- 3 Li Danemarkê di hîlbijartina meheli de kurdên A.N – *Irfan Baysal*
- 5 Lîsteya wezîrên hikûmeta Kurdistanê – *Pukmediya*
- 6 Şeva Kurd-DERê – *Mem Xelikan*
- 10 Rojên tenduristiya Mezopotamyayê li Diyarbekirê – *Hatice Polat*
- 17 Deklerasyona konferansa ziman û perwerdeya kurdî
- 19 Yekî ji me, Mam Recall – *Mem Xelikan*
- 29 "Vebûn" di parlamentoya Tirkîyê da – *Nebi Kesen*
- 32 Kurdên Xorasanê – *Dr. Kawa Khorasanî*
- 36 Qedera serserî – *Xizan Şîlan*
- 37 Rûreşîya dirav – *Xizan Şîlan*
- 43 Paça pêşîn – *Nuh Ateş*
- 48 Hevpeyvîn bi Mehmed Doğan re – *Brang Şêxbizinî*
- 52 Geşta Kurdîstanê I – *Xeyyam Rizgar Celikanî*
- 55 Fêz – *Seyfî Dogan*
- 61 Karpe Diem - Crea Diem – *Seyfî Dogan*
- 62 Ji stranên folklorik - *Hesê Fegês*
- 65 Ziman û edebiyata kurdî
di unîversîta Selçûkî ya Konyayê de – *Dr. Yusuf Kaynak*
- 69 Materyalên perwerdê û lîtteratura zarokan – *Ali Çiftçi*
- 73 Hûn Zanîne dizanin? – *Welat Baran Mîrdesî & Sedat Turan*
- 75 Aksaray zazacası – *Nêçîrvan Qilorî*

Sala nû pîroz be!

Bi vê hejmara 43an re em dawîya sala 2009an tînin. Dîsan salek di gelek warên cuda de bi bûyerên têrî xwe dagirtî, bi xweşî û nexweşiyên xwe ve bû dîrok. Salek ji bo me kurdan bi heyecan, bi hêvî, bi dîlşahî û di dawiyê de dîsan bi diltengî derbas bû.

Di aliyê ziman û nasname kurdan de li Tirkîyê, her çiqas nav lê nehatibe kirin û hindik be jî hinek tabû hatin şikeştin!

Dîtina fermîya Tirkîyê ku heta niha zimanê kurdî dihat înkâr kirin, bi weşanên TRT6a fermî ya dewletê, ew dîtîna hat pûçkirin. Dibe ku umrê TRT6ê hindik be lê bi weşana zimanê kurdî ya 24 saetan li seranserê welêt, hebûna zimên û nasnamê bi awayekî hat qebûl kirin. Ev helbet ne ji dilxwestina dewletê bû, ev piştî gelek salên têkoşîna gelê kurd bû.

Em hêvî dikin ev gavên ji bo mafê mirovan û fikra azad rojekê pêş de û bi rastî bên avêtin. Xelkê me hewqas êş û bêheqî heq nekiriye!... Mafê me kurdan jî heye ku em bi nasname û zimanê xwe serbilind bin, biparêzên û pêşde bibin. Bi vê hêviya jîyaneka bextewar û azad em sala we ya nû ji dil pîroz dikin!

Danîmerk di qedera kurdên me yê Anatoliyê de cîyekî xwe yê taybet heye. Ji salên 1960î vir de ye însanên me danûstandinek bi vî welatî re kirine, îro ji navçeya Anatoliyê ji her gund û bajarî ji endamên hemû malbatan însanên lê dijîn. Êdî em dibînin ku kurdên me li Danîmerkê bûne xwedî hêzeke aşîna ku partiyên siyasî li ser

bixwazin an nezwazin, divê hesabê xwe bikin. Di hilbijartinên şaredarî û meclisê ya îsal de kurdên me ev hêza xwe nîşan dan. Em bi hilbijartina van însanên xwe serbilind in û ji wan hêvî dikin ku dê ji bo civata me ya li Danîmerkê bibin nimûnên baş. Ji wan heval û nasên ku hatine hilbijartin re serkeftin ji dil dixwazim û herwiha bi navê redaksiyona Bîrnebûnê wan pîroz dikim!

Dema me ev hejmar hazir dikir, em pê hesiyar ku problemên nivîskara me, Ayşegülê yê tenduristiyê hene û tê dermankirin. Bi vê xebera nexwaş em pir bi ber ketin. Em hêvî dikin ku Ayşegül rojekê pêş da ji vê nexweşiyê xelas bibe. Em Ayşegülê wekî kesayetiyeke bi hêz, şên, jîyanhez û ji aliyê nivîsandinê da jêhatî nas dikin. Lewma em bawer dikin ku Ayşegül dê di hewldana xwe ya li dijî vê nexweşiyê jî bi ser keve.

Ayşegül, xwe qaym bigrê, em hevalên te yê kovara Bîrnebûnê li pişt te ne.

Em dixwezî ku tu bizanî, cihêkî te yî taybet li ba me û xwendevanên Bîrnebûnê heye. Em li benda nivîsên te û xeberên xweş in.


Dîya Îhsan Turkmen, endamê redaksiyona me di meha 11an de çû ser heqîya xwe. Bila serê Îhsan Turkmen û malbata wan sax û ciyê dayîka wî bihuşt be!

Bi hêviya ku ev hejmar jî li gor dilê we be, bimînin di xêr û xweşiyê de heta hejmarê bê!..

Ali Çiftçi

Li Danemarkê di hîlbijartina mehelî de kurdên Anatoliya Navîn cîh girtin

Îrfan Baysal



Mahmut Erdem
(SF)



Mehmet Küçükakin
(SF)



Serdal Benli
(SF)



Bilal Înekçi
(SF)



Erdal Colak
(SF)

Li Danemarkê di 17ê mijdara 2009an da hîlbijartinên Şarederî û Meclîsên mehelî pekhatin. Di vê hîlbijartinê da kurdên me yên Anatoliya Navîn ji namzetên xwe danîn. Piraniya wan jî di partiyên çep da xwe limandin.

Danmarks Liberale Parti: % 24,8
Socialdemokratiet, SD: % 30,5
Socialistisk Folkeparti, SF.: % 14,8
Dansk Folkeparti (DF): % 8,1

Tê wê manayê ku di hîlbijartinê da bi awayekî fereh cîh girtin, civaka me xwe nû dîke û polîtîzê dibe. Di hîlbijartinê da li tevayiyê Danemarkê ji nivî zêdetirî namzetên bîyanî ji kurdên Anatoliya

Navîn bûn. Namzetên ku navên xwe ketine dest me ev in:

Navenda Kobenhagê

Lars Aslan Rasmussen, ji Partiya Sosyal Demokrat (SD), Bavê wi ji Haymanayê ye.

Brøndby:

Mahmut Erdem, ji Partiya Sosyalîsta Gel (SF), ji gundê Hecilera

Hvidovre:

Firat Olgun, ji Partiya Sosyalîsta Gel (SF), ji gundê Hecilera

Mehmet Aksoy, ji Partiya Sosyalîsta Gel (SF), ji gundê Germikê girêdayîya

Kuluyê. Ömer Kuşçu, ji Partiya Sosyal Demokrat (SD), ji Germikê ye.

Ahmet Demir, ji listeya hêrîmê (lokal) namzetiya xwe dîna, ji Hecilera ye.

Albertslund:

Mehmet Küçükakin, ji Partiya Sosyalista Gel (SF), ji Kutuga ye.

Dogan Polat, ji Partiya Sosyal Demokrat (SD), ji Kutuga ye.

Mustafa Demir, ji Keskan namzetiya xwe dina, ji Celebê ye.

Gladsaxe:

Serdal Benli ji Partiya Sosyalîsta Gel (SF), ji Bumsuzê ye.

Glostrup:

Edibe Baran ji Partiya Sosyalista Gel (SF) ji Hecilera ye.

Hundige:

Battal Küçükkavci, ji Partiya Sosyalista Gel (SF), ji Kutuga ye.

Vallensbæk:

Erdal Colak, ji Partiya Sosyalîsta Gel (SF), ji Hecilera ye.

Firat Sari, ji Partiya Sosyalîsta Gel (SF), ji Hecilera ye.

Ishøj:

Bilal İnekçi, Partiya Sosyalîsta Gel (SF), ji Încovê ye.

Sami Deniz, Partiya Sosyalîsta Gel (SF) ji Hecilera ye.

Şengül Deniz, Partiya Sosyal Demokrat (SD), ji Omera ye.

Gülser Taşkıran, Partiya Sosyalîsta Gel (SF) ji Kelhasanê ye.

Erkan Yapıcı, Partiya Sosyalîsta Gel (SF) ji Încovê ye.

Di vê hilibijartinê da dengdayîna di nav kurdan Anatoliya Navîn da pir zêde bû. Ji bo vê jî gelek namzet bi serketin û di Şarederiyên da cih girtin. Kesên di şarederyandan da cih girtine vana ne:

Li navenda Kobenhagê:

Lars Aslan Rasmussen, (SD)

Li Brønby:

Mahmut Erdem (SF), alîgirê serokê şarederiyê duyemîn girt.

Li Albertslund:

Mehmet Küçükakin (SF), alîgirê serokê şarederiyê yekemîn girt.

Dogan Polat (SD).

Li Glatsaxe:

Serdal Benli (SF), serokê komîsyona Entegrasyon û îstihdamê girt.

Li Vallensbæk:

Erdal Çolak (SF)

Li Ishøj:

Bilal İnekçi (SF), alîgirê serokê şarederiyê yekemîn girt.

Sami Deniz (SF)

Şengül Deniz (SD)

Li gor nûçeyêke Pukmediayê di roja 27.10.2009an lîsteyêke wezîrên hikûmeta Kurdistanê hatibû amadekirin û roja piştî wê jî (28.10.2009) di meclîsê de bawerî wergirt ku dest bi kar û barên xwe bike. Em wê lîsteya wezîran ji bo xwendevanên xwe li vê derê diweşînin.

Redaksiyon

Lîsteya wezîrên hikûmeta Kurdistanê, Kabîneya 6'mîn.
Hikûmeta ku wê roja çarşemê were avakirin, ji 19 wezîran pêk tê.

Navên wezîran

Navên wezaretan

1- Reuf Reşîd	Wezareta dadê
2- Şêx Cafer Şêx Mistefa	Wezareta pêşmerge
3- Kerîm Sincarî	Wezareta navxwe
4- Bayîz Talebanî	Wezareta darayiyê
5- Dr.Ebdullah Ebdulrehman	Wezareta samanên xwezayî
6- Dr. Tahîr Hewramî	Wezareta tenduristiyê
7- Sefîn Mûhsîn Dizeyî	Wezareta perwerdeyê
8- Kameran Ehmed	Wezareta Avedankirinê
9- Semîr Ebdullah	Wezareta şaredarî, geşt û guzarê
10- Dilawer Ebdulezîz Eladîn	Wezareta xwendina bilind
11- Elî Osman	Wezareta palandanîne
12- Asos Necîbullah	Wezareta kar û karûbarê cîvakî
13- Hadî Mehmûd	Wezareta kultur û gêncan
14- Dr. Mecîd Mihemed Emîn	Wezareta şehîd û enfalkiriyan
15- Celîl Silêman	Wezareta zîraet û çavkaniyên avê
16- Sinan Ebdulxaliq Çelebî	Wezareta bazirganî û pîşesaziyê
17- Enwer Şabo	Wezareta gihandin û veguhestinê
18- Kamil Elî Ezîz	Wezareta diyanet û karûbarê olî
19-	Wezareta elektirikê

Jêder: *Pukmedia*

Şeva KURD–DERÊ

Mem Xelikan

Roja 13.11.2009an, KURD–DERA Enqerê li Hotel GAP ê, şeveke bi xwarin bi dar xist. Kurd–Der li sala 2004an bi alikariya mamosteyê rehmetî Nureddîn Aydin, İhsan Güler û çend hevalên din ve hat damizrandin. Armanca damizrandina komalê, ji bo kurd bibin xwediyê mafên civakî, çandî, mafên kesayetî û grûbî.

Di ber destpêka şevê de, min ji serokê komalêyî huro, birêz Ahmet Aday çend

pirs kirin. Bi kurtasî, bersîvên wî ev bûn:

"Di çarçoveya zagonên navnetewî de ji bona ku kurd bigihin mafên xwe yê kesayetî û civakî xebatan dike û ji xebatên tên çekirin re jî dibe alîkar. Di warê demokratîk û qanûnî de, ji bona parastin û pêşvebirina zimanê kurdî xebatan dimeşîne. Kursên zimanê kurdî saz dike. Di warê ziman, wêje, çand, huner û şanoya kurdî de xe-



Grûbeke ji kurdên Anatoliya Navîn li ber maseya xwarinê.



Îhsan Xelikan di şeva Kurd-Derê de.

batan dimeşîne. Ji bona çareserkirina û hwd. pirsgirêkên wek asîmilasyon, dejenerasyon, pirsgirêkên civakî û aborî ku di guherandina demografiya gelê kurd de derketine holê xebatan dike. (ji destûra komeleyê.)

Komeleyê hetanî îro gelek xebatên cûr bi cûr meşandine. Xebatên cih û warên kurdan yên ku navê wan hatine guhertin hatine meşandin, ji bo parastin û pêşvebirina zimanê kurdî kurs hatine saz kirin û ev kurs îro jî didomin. Ji bo bîranîn û nasîbûna navdarên kurd panel û konferans hatine çêkirin. Ji bo rojên zimanê kurdî û rojên zimanê dayikê dîsa panel û konferans hatine lidarxistin. Rojên gelê kurd yên taybet û cejnên mîna Newrozê hatine pîroz kirin

Em hêvîdar in ku di pêşerojê de gelê kurd, dê bigêje nîrxên xwe yên neteweyî. Disa em hêvîdar in ku di demeke nêz de gelê kurd dê li ser xaka Kurdistanê bi nîrxên xwe yên neteweyî azad bibe. Divê ji bo azadbûna gelê kurd û Kurdistanê yekîtiya gelê kurd pêk bê û têkoşina aştîyane û demokratîk bê navber bidome.

Wek hûn dizanin, têkoşîn û berxwedana gelê kurd ya demokratîk, her dem ji alî pergala Tirkîye ya paşverû ve rastî zixtan hatiye. Ji ber ku pergala mîlîtarîst û paşverû gelê kurd û nîrxên gelê kurdên neteweyî her wextî înkâr kirîye. Her wextî sîyaseta înkâr û îmhayê meşandiye.

Bêgoman mejî para xwe xwariye. Bêgoman ji bo ku navenda komeleyê li Enqerê ye bivê nevê têkiliyên me bi kurdên Anatoliya navîn re hene. Di nav kar û xebatên me de kurdên Anatoliya navîn hene. Bi kêmasî be jî li Konya, Kırşehir û Eskişehir xebatên me tên meşandin. Ez bawer im ku di rojên pêşiya me de dê xebatên me yên van bajarên navborî zêdetir bibin."

Şevê li seet 19:00 bi axaftina serok birêz Ahmet Aydın dest pê kir. Kek Ahmet ji dîroka kurdan de bi mînakên behsa xebata kurdan û zilm û zora ku wan dîtî. kir. Ji pêvajoya huro de behs kir. Qala rêvekirina pirsgrêka kurrî û demoqratik li Tirkîyê kir. Şaşitî û xelatîyên pêvajoyê anîn ziman û partî û

kesên li hember rêvekirinê rexne kirin.

Parlemanê DTP birêz Osman Özçelik ji xebata huro li TBMM. Partî dide de behs kir. Osman Özçelik, Parlemanê CHP, Kemal Kılıçdaroğlu, Onur Öymen û partîya wan CHP ji bo gotin û nêrînên wan yên ji bo serhildan û qetlîama Dersimê rexne kirin. Dû ve ji helbestvanê nemir, Cegerwxîn de helbest xwandin.

Şeva ku gelek rewşenbîr, nivîskar, sîyasetmedar û hunermend û gelê kurd beşdar bûyî:

Bi sitranên hunermendên weke:

- İhsan Xelîkan (Ji Anatoliya navîn dengêkî amator)



Dîmenek ji beşdarên şeva Kurd-Derê



Osman Ozçelik di şeva Kurd-Derê de.

- Mustafa Tural û heyder (Ji Koma Dimdimê)
- Hemê Hecî Û çend bi dengên amator ve çoşek mezin ve berdevam kir.
- Beşdarên şevê:**
- İsmail Beşikçi (Dostê kurdan, mirovê bi rûmet zanyarê bilind)
- Naci Kutlay (Rewşenbîr û nivîskar)
- Selim Sadak (Serokê şaredarîya Sêrtê)
- Gökçe Otlı (Serokê İHD)
- Yavuz Çamlıbel (Nivîskar û Rewşenbîr)
- Filiz Koçali (Nivîskar)
- Kemal Bülbül (Bi navê Komeleya Pir Sultan Abdal)
- Haydar Sayılı (Çigirê serokê Partîya Demokrasî û Aşitîyê)
- Adnan Ekmen (Wezîrê dewletê yê berê)
- Hüseyin Gevher (Serokê Komala 78 an)
- Cesim Soylu, Osman Ergin (Endamên meclisa DTP)
- Hatice Çoban, Şamil Altan (Endamên rêvebirya navendîya DTP)
- Tuncer Bakırhan (Çigirê giştîya DTP)
- Sami Tan (Serokê Enstîtuya kurdî ya Stanbolê)
- Seydi Fırat, İmamcan Polat (Ji koma aşitîyê ya yekemîn)

Êrê, mala wan ava be. Kurd-Derê şeveke xwaş bi me da jîyandin. Bi nav hêjmartinê, dixwaze ez 2-3 belikan binîvsînim. Hevalên ku beşdarî şevê bûyîn û min navê wan nenivîsandî bila qûsura min nenêrin. Lê li dawîya nivîsa xwe dixwazim hevalên hêjmara kurdên Anatolîya Navîn bidim. 20-30 kesên Anatolîya Navîn beşdarê şevê bûn.

Rojên tenduristiya Mezopotamyayê li Diyarbakirê 2009

Dr. Hatice Polat

Yekemin nasîna welatê dê û bav û kalan!
Payîz li Amedê wekî din e!

Rojek ber destpêka konferensa li Dîyarbakir em bi komek pijîşkên kurd va ji Ewrûpayê bi balefirekê ber bi Amedê difirîn. Ji min ra çûyina Amedê cara siftê bû û her ku em nêzî Amedê dibûn, meraq û heycana min pir dibû. Ezmanê bê ewir, çiyayên welêt, çemên bi nav û deng didît ku bi dirêjî û bêdengîya xwe ax û tebîyatê dixemilînin ber çavên min diket, him kêfxweş û him xemgîn dibûm. Gundên dor bajarê Amedê wek tîrên dora rojê dirêj xoy dibûn. Bajar bi sûrên xwe yên bi nav û deng darbas bûye, bela û mezin bûye. Bêsebir û hestgermî benda peyabûna ji balafirê bûm, pir dilîni bûm.

Li balafirxaneya Amêdê komekê bi lewheya „*Rojên Tenduristiya Mezopotamyayê*„ pêşwazî me kirin, em li cihên razanê parva kirin. Meriv germî

û dostaniya wan, ya bajêr dibîne, dilinî dibe. Ew pêşwazîyeke cûda ye, ya welatî û hemwelatîyê ye, tê da kêfxweşî, germî, serfirazî û serbilindî heye.

Dema di nav bajêr de derbas dibim, cih bi cih xaniyên bi kerpîç, kolanên antîk û modern dibînim. Kevneşopî û nûjenî li cem hev, li hev tên.

Roja din bi dostên xwe yên qedîm va, malbata ku ez 15 sal in nas dikim, bi germî, dostî û dilsozî pêşwazî li min kirin.

Em tevhev li bajêr geriyan. Hawa li payîzê heya 30 dereceyî germ bû. Niştecihên wê jî bi ewqasî germ û rûken bûn.

Min bi xwe xwe digot; gelo ew wiha rûnêrm û rûken in an jî ew bi min weng e? Li her derê şopên dîrokî û antîkî he ne. Meriv temaşe dike, difikire û dibê-



Dîmenek ji hewşa Xana Xusrew Paşa / Karwanseyê-Diyarbakir.

je qey her yek ji wan çîroka xwe dibêje, bê deng û bê hes li wir dawestîne, benda „xwedîyê“ xwe yên deh salan, hezar salan e...

Otela Kerwanseyê bûye rêpêketî û wargeha li ser “rîya îpekê”. Mizgefta bi navê Ûlûcamî bandora xwe dide însên; çarşiyên kevn û sergirtî, Xana Hesênpaşa atmosfereke germî ye, vêsandinê dide însên ku meriv bibêje, her kes di mala xwe de bi qedir û qîmet û rûmet e. Kilam û stranên evîn û cerenên li ber sûrên bajêr ber bî ezman terin. Qîrîn û dengê kilemên wek „agir ketîye dilê min, rinda min, çavreşa min, bêjne lê

bêjne“ hin di guhên min de ne...

Merasîma vekirina „Rojên Tenduristiya Mezopotamyayê“ di „birca bizinan“ ya li “derîye Merdîn” de bû. Avahîsazî(mîmarîya) salonê 5000 salî ye, muhteşem hatiye çêkirin. Tevî ronakbîr, endamên çapemeniyê, jin û mêr nêzî 650 kurd û tirk û alman ji Rojhilata Navîn û Ewropayê tev civînê bûn. Ji wan nêzî 350 kes doktor bûn. Di nav wan de Serokê şaredariya mezin ya Hannover, Herbert Schmalstieg ku 30 sal e li wî bajarî şaredar e, wezîra dadê ya kevn Heidi Merk hebûn. Ango ji 11 welatan beşdar hatibûn konferansê (ji

Swêd, Almanya, Ingiltere, Avustralya, Belcika, Iran, Irak, Sûriyê, Ermenistan, Gurcistan û Tirkîyê).

Di kokteyla vêkirine de Osman Baydemir, Tarik Ziya Ekinci, Selçuk Mizrakli (Serokê tabipler odasi), Dr. Abdullah Saed ji Kurdistana Başur (Mudirê giştîyê tendrûstiyê Dohukê), Prof. Gencay Gürsoy (Serokê Türk Tabipler Birliğı) û amadakar Prof. Dr. Huseyîn Bektaş ji zanîngeha Hannoverê axaftin. Axaftina serokê TBB yê Tirkîye Prof. Gursoy balkêş e, wi got: „bi salan e di heremên ku bi kurdî diaxifin de dixebitim, mêl û qîmeta ku em didin zimanên xerîb nadin zimanê kurdî, ez

ji vê şerm dikim“. Hêjayî gotinê ye ku ew bi xwe jî esilkurd e. Şaredar Osman Baydemîr, „zimanê me, dermanê me ye. Bizîşkên kurd wê xwîneke nû bidin vî zimanî, kurdîya me nûjen bikin, can bidin dilê me“.

Ronakbîrên ku bi sala ne hevûdu nedîtin, li wir hevûdu dîtin, dilzîz bûn. Bi muzîka kurdî ya enstrûmental êvarê dom kir. Piştra em hemû çûn „mala dengbêjan“. Li wir denbejen cîwan û kal wek pêşbirkekê kilam û awazên xwe ji dil û can bê enstrûmen pêşkeşî beşdaran kirin, ew kêfxweş û şad kirin.

Konferans roja yekem di „Navenda Cigerxwîn ya cîwan û çandê“ de çêbû.



Dîmenek ji Jan Cafe Nargîleyê.



Dîmenek ji bazareke Diyarbakir

Li konferansê bizişk bi dûr û dirêjî li ser tenduristîya Rojhilata Navîn, Ewropayê, dinyayê sekinîn, dest dide ser kula kurdan, qala nexwaşiyên enfeksiyon, zarok û jinan dike, dest dide ser rastîya koç û barkirina kurdên bêwar û welat, trauma wan pêşkêş kirin. Hemû axaftin bi kurdî, tirkî û îngilizî bi sîmûltan hatin wergerandin. Di nav axaftvanan de ji bilî Prof. Bektaş ji Almanyayê Dr. Fikret Yildiz û Dr. Fikret Zengin, Dr. Hilal Koç û xweşka wê Ebruhan Koç jî hebûn.

Roja îne, êvarê di Class Otelê de Gala hebû. Li wir jî coşek din hebû. Herkes hevûdu dinasî, heval û hogirên ku bi sa-

lan e hevûdu nedîbûn, dibînin; bi eynî hest, eynî ziman, hevûdu hembêz dikin, bijavîya xwe dişkenin. Min li wir kêkê Sertaç Bûcak dît, pir kêfxweş û serbilind bûm. Min serokê Odeya Tabîban yê Diyarbakir Dr. Selçûk Mizrakli û jina wî Zeynep nas kir. Çi balkêş û teseduf e ku dê û bavê wê ji herema me ne. Bav ji Kulu/Karacadagê, diya wê ji Cihanbeyli/Xelîkan e. Ew jî nazek tarîxê ye. Ji Altîlarê jî Dr. Z. Şener Bahçe hebû.

Di bernamêyê de 63 konferans û poster hebûn. Ji wan 47 jî alîyên doktorên ji dervayî welat hatî pêşkêş bû, yê din doktorên ji Tîrkiye hatî li dar xistin.

Di dawîya konferansê de Prof. Bektaş li ser girîngîya zimanê kurdî sekinî ku di civînek wiha zanyarî de tê axaftin û got, „ew ne meselaya kart- kûrt an jî zimanê ku ji 600 peyv pêk tê ye; ew zimanekî dewlemend, nûjen û jîndar e. Me hemûyan ew da çespikan û ew pesinand.“

Tiştêkî balkêş hebû ku doktorên eslî tirk, yên ku tev vê konferansê bûbûn, bi gotar û axaftinên xwe destek dan. Amadekar û xwedîye Konferansê Dr. Selim Ölçer kêfxweşî û serbilindîya xwe bona civînek wiha pêşkêş kir, got;

Diyabakir wê sala were jî bona konferansek nû Amede ye.

Tu dibêjî qey bajarê Amedê mîna dayikek kurê xwe an ji wek bûkek ku evîndarê xwe hembêz û oxir kir.

Destê min ji Amêdê û welatê qedîm nediqetîya û min biryar da, ez dîsa herim Amedê. Dema ku ez bi halê xemgînî di balafirê de bûm, hostesana bona ewleyî bi zimanê tirkî û îngîlîzî anons didan rewîyan, ku piraniya wan kurd bûn. Aceba rojek ê were ku ew bi kurdî jî anons bikin! Bi vî halî, min xatirê xwe ji Amedê xwest heya rojek din !



Dimenek ji kevîrên reş. Li Diyarbekirê dêr, camî, cihên pîroz û hemû avahiyên kevn ji kevîrên reş û sipî ava bûne.

Hevpişeyên hêja,

mêvanên delal,

birêz Dr. Tarik Ziya Ekinci,

serokê Kongra me, birêz Dr. Selim Ölçer, serokê Şaredariya Diyarbekir ya Mezin birêz Osman Baydemir, mudirê Tendrustiya giştî li Dohukê, birêz Dr. Abdullah Said û hemû hevpişeyên hêja ku ji hemû welatan hatine Amedê.

Hevalên me yê taybet xanim Heidi Merk û Dr. Herbert Schmalstieg,

Hûn hemû bi xêr hatin kongra me ya yekem bi navê Rojên Tendrûstiyên Mezopotamyayê li Amedê. Ez îro gelek kêyfxweş û serbilind im. Ez serbilind im ku xeyalekî me îro bû rastî.

Ez serbilind im ku em îro li Amedê Kongreyeke zanistî li ser beşa tendrustiyê û her wusa jî zimanê kurdi bi kar tînin.

Ev gaveke yekemîn û gaveke gelek girîng e. Ez hêvîdar im ku em vê gavê ji bo hemû beşên zanistiyê di pêşerojê da bi kar bînin.

Filozofê Alman Hegel di nivîseke xwe da dibêje: Ziman bedena Ramankirinê ye. Ango bê ziman fikirîn ne mumkun e.

Sidney Baca ku zanayekî mirovên îndîyanî bû li Amerikayê di axaftineke xwe da dibêje: Ku em zimanê xwe wenda bikin, em her tiştê xwe wenda bikin.

Ez hêvîdar im ku sibê di hemû zankoyên welatê me da xort û keçên me bi zimanê xwe bixwînin, bi zimanê xwe bifikirin, lêkolinên xwe bi kurdî biweşînin, zimanê xwe wenda nekin û wê hîn bi pêşta bibin.

Hûn çewa dizanin di Mezopotamyayê da bingehên ilmê bijîşkî hatine danîn. Ger mirov li dîrokê bifikire, mirov dibîne ku ameliyata yekem li sîngê mirovan di bi navê rojanî –Bulow-Drain– li Mezopotamyayê hatiyê çêkirin. Ameliyata yekem ya çavan –ameliyata perda sipî– ameliyata yekem ya perçekirina kevirên di kisikê mîzê de li Mezopotamyayê hatine çêkirin. Reçeteyên dermanan ji bo tedawiya gelek nexweşiyên li Mezopotamyayê hatine çêkirin. Em îspatê van tedawiyan dikarin îroj di British Museuma Londrayê de, di muzeya Bexdayê de, di muzeya Louvreyê Parisê de li ser kodeksa Hammurabî bibînin. Li gor hindêk zanayan zikkiratên bi navê „Gula“ di Mezopotamyayê da nexweşxaneyên yekemîn di dîroka mirovatiyê ne. Li her bajarên Mezopotamyayê sê zikkiratên wusa hebûn.

Ez hêvîdar im ku ew keç û xortên me li ser riya bav û kalên xwe biçin û di zankoyan da lêkolînan bikin û di zanistiyê de gavên mezin pêk bînin. Bira Mezopotamya dîsa bibe navendeke zanistê ya dinê.

Îro li Amedê li Navenda Kongra Cegerxwin gelek zana û pispor ji hemû parçên welatê me û her wusa jî ji gelek welatên din hatine gel hev. Em dixwazin di van du rojên pêşiya me da li ser nexweşiyên li Mezopotamyayê zêdetir tîn dîtîn, guftugo bikin, nêrîn û tercûbeyên xwe bi hev biguherin ku ji bo tendrûstiya mirovên heremê xebateke hîn baştir bê çêkirin.

Di sala dawî da em li gel delegasyonekê tev doktorên kurd ji dervayê welêt û ji Amedê çûn başûrê welatê me. Li dawiya guftugoyan bi hevpişeyên me li başûr, me bi hev ra biryar da ku em Kongrêyeki zanistiyê ji bo hemû Mezopotamyayê li Amedê pêk bînin. Me li Hewlêrê dest bi amadekirina programa zanistiyê kir û di serê salê da dest bi kar kir û me hevpişeyên xwe li hemû parçeyên welat û li dervayî welat li ser planê xwe agahdar kirin û me dest bi amadekirina Kongrê kir.

Hevalên me li Diyarbekirê kareki gelek xweş kirin. Em doktorên ku li dervayî welêt dijin jî, heta ji dest me hat, me hemû hevpişeyên ku me dikariya em bigehjîninê, me agahdar kirin û me ew dawetî kongrê kirin.

Pêşî me dixwest em di çar salonan da konferanseke mezin pêk bînin. Ji ber ku ev kongra yekemîn e û me nedizanîbû çend kes ê beşdarî vê konferansê bibin, me programa xwe xist ser salonekê.

Ew hêvîdar im ku dîsa jî me ji bo vê kongra yekemîn programeke zanistî ya balkêş amade kir.

Gelek pispor û zana ji welat û dervayî welat ramanên xwe li ser teshîş û tedawiya nexweşiyên ku zêdetir li Mezopotamyayê tîn dîtîn bi konferansan û posteran bînin ziman. Her wusa jî hindek pispor û zana lêkolînên xwe ji me ra pêşkêş bikin.

Em hêvîdar in ku di programa sosyal da ya ku hevalê Diyarbekirê amade kirine, em hev û din hîn baştir nas bikin û di Diyarbekir û heremê de du rojên delal derbas bikin.

Gelek sipas

Prof. Dr. med. H. Bektaş

*Klinik für Allgemein –Viszeral– und Transplantationschirurgie Medizinische
Hochschule Hannover*

Deklerasyona konferansa ziman û perwerdeya kurdî 5-6 teşrîn-mijdar [november] 2009, Bruksel Li parlamenta Flaman-Bruksel, Belçik

"Şûraya Ziman û Perwerdeya Kurdî", di rojên 5-6ê meha 11an [Teşrîn-Mijdar 2009] da, li salona Parlemeta Flaman-Bruksel kombû. Ji seranserê Kurdistanê û diasporayê zana, bispore û mamostayên Kurdî beşdar bûn. Pirs û pirsgerêkên di warê ziman û perwerdeya Kurdî da bi berfirehî hatin axivtin. Danezanên zanyarî yên li ser ziman û perwerdeyê hatin pêşkêş kirin. Di encam da li ser tesbîtên zanyarî ev biryar hatin standin:

1. Li Tirkîye, Îran û Sûrîyeyê polîtîkên asîmilasyonîst yên dijî Kurdî bi reng, metod û teknîkên cuda têne domandin û li van dewletan fermiyên jî perwerdeya bi Kurdî nîne û eve rê li ber asîmilasyonê fireh dike. "Şûra" lezînen û bi giringî bangî van dewletan dike ku Kurdî bibe zimanê duyê yê fermî yê dewletê û ji beşçeyê zarokan heta unîversîteyê perwerde bi Kurdî bête kirin. Bi vê xalê ve girêdayî, "Şûraya Ziman û Perwerdeya Kurdî" bangî rêvebirîya polîtîk ya Kurdistanê li bakur dike ku li cografyaya Kurdistanê "de facto" "du zimanî" yê bi kar bîne. Ji şehridarîyan heta sendîka, baro û organîzasyonên di yên sosyopolîtîk, sosyokultûrel û sosyoekonomîk divêt di hemû kar, xebat, kombûn, konferans, sempozyûm û kongreyên xwe da Kurdî û Tirkî bi kar binin û vê yêkê wekî wacibekî neteweyî qebûl bikin.
2. Di realîteya îro da kurdî bi du alfabeyan bi kar têt: Alfabeya bi tîpên Latîni û alfabeya bi tîpên Aramî-Erebî. Li Kurdistana Federal û li rojhilata Kurdistanê alfabeya fermî ya bi tîpên Aramî-Erebî ye. Li bakur, rojava û diasporayê jî alfabeya bi tîpên Latîni bi kar têt. Du alfabetî dibe binasê ji hev dûrketina zaravayên Kurdî û her diçe ji hev têgihîştinê bi zehmet têxe û diwarên destkir yên di navbeyna zaravayên bakur û başûr da xurt û stûr dike ku eve rewşeke negatîv e. "Şûra" di wê bawerîyê da ye ku ji bo parastin û pêşvebirina zimanê Kurdî yêkkirina alfabeyê pêdivî ye. Lewma "Şûra" bangî rêvebir û otorîteyên desthilata polîtîk û herweha cihana zanyarî ya Kurd dike ku yêkkirina alfabeyê danin serê rojeva xwe û di nav proseseke maqûl da û bi planekî zanyarî û pedagojîk rê li ber yêkkirina alfabeyê vekin.
3. Di bi kar înanî Kurdî da pirs û pirsgerêkên gramatîkî û rastnivisînî jî hene ku eve li ber standartbûna zimanî asteng in. Zimanzan û zimannasên Kurdî divêt bi organîze û bi norm, metod û teknîkên zanyarî, van kêma û kasîyên zimanî tesbît bikin û rêyên çareserîyê peyda bikin û bidine xizmetê.

4. Di perwerdeya Kurdî ya îro heyî da; ji aliyê materyal, naverok, form û metodîk ve paşvetîyeke konkret tête dîtin ku divê ev probleme bi planekî modern û pedagojîyeke zanyarî û pêşkevî bête çareser kirin.
5. Kêm û kasî û problemên zimanî yêkser tesîreke negatîv li ser weşangerîya Kurdî jî dikin û her dezgehekî ragihandina Kurdî di warê bi kar înanana Kurdî da lokal û otonom hereket dikin ku eve jî di pratîkê da kaoseke zimanî derdêxe meydane.
6. Ji ber van hemû problemên zimanî û perwerdeyî, pêdivî bi "organeke şewirî" ya ku ji bisporên zimanî û perwerdeyê pêkhatî heye, ku berbelavîya di van waran da bête rakirin û sentraleke kolektîv, organîzatîv û tewsiyekar bête pêkînan. Ji ber vê hewcehiyê, bi biryara "Şûraya Ziman û Perwerdeya Kurdî", ya 5-6ê Teşrîn-Mijdar [November] 2009ê li salona Parlemeta Flaman ya Brukselê kombûyî, "Organa Şewira Ziman û Perwerdeya Kurdî" hate damezrandin. Ji aliyê navên bispor ve ji bo pêkînana "Organa Şewira Ziman û Perwerdeya Kurdî", "Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKye" wekî organîzator û amadekar hate wezîfedar kirin ku piştî danûstandin û lêkolîneke berfireh, organê ji 20 [bîst] heta 25 [bîst û pênc] kesan pêkhatî teşkil bike. Herweha "Organa Şewira Ziman û Perwerdeya Kurdî", prosesa danîna "Akademîya Zimanê Kurdî" li Amedê, ku berê biryar hatibû standin, dê bi leztir bêxe.
7. "Şûraya Ziman û Perwerdeya Kurdî", rêzê nişanî dem û dezgehên ji bo ziman û perwerdeya Kurdî xebat kirine û hêj jî dikin dide û wan pîroz dike.
8. "Şûraya Ziman û Perwerdeya Kurdî" her du salan carekê ji teref "Organa Şewira Ziman û Perwerdeya Kurdî" ve dê bête kom kirin.
9. Ji bo destekdan û motîvasyonê kar û xebatên zimanê Kurdî, hersal "Xelatê Zimanê Kurdî" di roja dawîyê ya "Cejna Zimanê Kurdî, 14-15-16ê Gulanê" da ji aliyê "Organa Şewira Ziman û Perwerdeya Kurdî" ve dê bête dan.
10. "Şûraya Ziman û Perwerdeya Kurdî", zordariya li ser weşangerîya Kurdî ya li Tirkîye, Îran û Sûriyeyê şermizar dike û destekê dide Azadiya Welat ku dîsa ve ji aliyê dewleta Tirk ve hatîye qedexe kirin.
11. "Şûraya Ziman û Perwerdeya Kurdî", pêşniyara wezîrê berê yê kulture yê Kurdistan Federal, Felakedîn Kakeyî ya li ser komkirina "Konferansa Zimanê Kurdî li Kurdistan Federal" bi dilşahî pêşwazi kir û piştevanîya xurt lê dike ku di demekî kurt da li Kurdistana Federal kombûneke fireh ya ziman û perwerdeya Kurdî bête kirin.

Şûraya ziman û perwerdeya kurdî
5-6 teşrîn-mijdar [november] 2009, Bruksel
Parlemeta Flaman

Yekî ji me, Mam Recall

Mam Recall, yek ji kurdên Anatolîya Navîn e. Li gundê Karagedikê, di sala 1954 da ji dayîk bûye. Karagedik gundekî girêdayîyê Haymana û Enqerê ye. Mam Recall di nêv xizaniyê de mezin dibe. Lawê malekê ye ku bav bi şivaniyê debara xwe dikeye. Di zaroktiya xwe de dest bi xwendina erebî dike. Ji bo ku bapîrê wî dixwaze ew bibe mele. Mam Recall ji meletiyê bigirin wek bazirganî, stranbêjî û mamostatîyê pir kar guherîne. Cara paştin li Amerîkayê bi cî û war dibe. Li wir dersên zimanê kurdî dide û dest bi kurdî û tirkî bi nîvîskariyê dike. Serpêhatîyek kek Recall, pir balkêş heye. Min ji bo xwendevanên Bîrnebûnê bi wî re heypeyvînek pêk anî. Bawer im hûn ê bi kêfxwaşiyekê bixwînin.

Mem Xelikan

Mam Recall merheba! Dixwazim, bi pîrsek klasîk dest bi heypeyvîna xwe bikim. Mam Recall kê ye? Tu ê bi xwendevanên me xwe bidî nasandin?


– Merheba Mem!... Helbet, li ser serê min... Lê berî bersiva xwe dixwazim ji gelê xwe, ji kovara *Bîrnebûn* û ji cenabê we re silav û rûmetiyên xwe pêşkêş bikim.

Erê, ez Mam Recall Kart im (Mustafa Kart). Ez li sala 1954 an, li gundekî Haymanayê (Karagedik) ji dayika xwe bûyî me. Em pênc xwişk û çar biran in û ez di rêza sêyemîn da me. Bavê min rehmêtî, Şixo yê Bekirê Oxçî heta ku em mezin bûn, tim li gundên tirkî şivanî dikir. Ji ber wê hindê piştî dibistana destpêkê, bavê min ez

şandibûm medrese yê şevborîn. Min li Akara/Halkavun, Konya/Meram û Konya/Cıvıloğluyê dersên Erebi wergirtibûn. Paşê min destûrnameya xwendegeha navendî û ehliyetnameya keştîyê, ji derve de, bi azimûndayîne wergirtibû. Û niha jî li vir berdewamî kolejê dikim.

Ez bavê lawek û du keçikan im. Neh sal in li Amerîkayê dijîm. Ez di demên xwe yê vala de, dîrok, çirok û helbestan dinivîsim. Min heta berî salekê li zaningeheke Amerîkî dersên zimanê kurdî dida.

Niha firmek min heye, ez li ser internetê, www.mamrecallarts.com wêne, xalçe û tiştên kevnare (antîk) distînim û difiroşim.



Mam Recall li ber mala xwe.

Li gor bihîstina min, kalê te ji gundê Xelîkan, bar kiriye Karagedikê. Em malbat û navê eşîra te meraq dikin? Tu dikarî bi me re par ve bikî?

– Di dema padişahê Osmanî, Yavuz Sultan Selim de eşîra me Oxçiyên ji ber zilm û zorê, ji Kurdistanê koçber bûyîne û hatine Anatolîya Navîn. Nêzikî dused û pêncê salî li bajarê Kirşehirê, li gundên Awanê û Bîra tehl(Avanoğlu–Acıkuyu) bi şûn bûyîne. Paşê bar kirine gundê Kulu/Karacadağê. (Xelîkan) Hec Elîyê Oxçî, Mihê Oxçî, Hemê Oxçî û Hesê Oxçî pismamê kalê min in. Kalê min rehmêtî Bekirê Oxçî, di hevdehsalîya xwe de rojekê li Xelîkan ketiye

serê govendê. Wê rojê Elika Xelîkî dil dayîye kalê min û di navbera herdu ciwanan de eşqeke mezin qewimîye. Li gora gotina bavê min, ji ber tirsê revîne gundê Haymanê/Karagedikê. Û ji Mistefa begê axeyê Karagedikê piştbazî xwastine û êdî li wir jîyane. Wê demê Elik bîst, kalikê min hevdeh salî ye... Berî revê, Elikê bi kalê min re wiha gotiye:

"Lawê Oxçî! Ez li te bi dil im. Lê ez nexweşîyeke pir giran dikişînim. Dixwazim li cem te bimirim, lê ji hêla din ve, naxwazim jîyana te, di nav êş û şewatê da bihêlim..."

Kalê min wiha bersiv daye Elikê:

"Hiş be, keçê, dînik nebel!... Ez jî êdî bête nabim. Bihêle, rojek rojek e... Em jî ji bona xatirê wê rojê bijîn!"

Piştî du salan Elika Xelkî li Karagedikê, çûyîye dilovaniya Xwedê. Kalê min çend salan bi tena serê xwe jîyaye. Paşê bi bapîra min, Fata Hemê re zewicîye. Fata Hemê ji malbata mala Karta ye. Paşnavê me jî ji hêla wê rehmetyê ve hatiye mohr kirin.

Ez ji aliyê dayika xwe va jî ji eşîra Etmanî me. Ew kalên min jî koçberên Kurdistanê ne. Ew jî li gundê Bala/Çiğdemliye dijîn(Altunçanak û Etman).

Kekê, wek ji hêla we de jî diyar e, Cîgerxwînê rehmetyê, berê bûye mele, paşê jî meletî terk kiriye û bûyîye helbestvan û nivîskar. Li gora nivîsên te, jîyana te jî him dijar û him jî rengîn derbas bûyîye. Tu jî wek Cîgerxwîn berê bûyîye mele, paşê bûyî sitranbêj, helbestvan û nivîskar. Gelo, ev çawa dibe?

– Dema ku telika spî kişandin serê min, ez hîna heft salî bûm. Ez di çendek nivîsên xwe da carinan bi zimanê kurdî û tirkî, behsa wan rojên xwe dikim. Wek: Veysel Karanî olmak, Baldan'da zehir eyledik, stranbêj, Henîfe Xatûn û xoçeyê gund.

Ji ber sedema xopana xizanîyê, bavê min rehmetyê, sê rê şanî min dida û wiha digot: "**Lawê min, yan tu ê herî**

mizgeftê bibî mele... Yan tu ê wek min bibî şivan û di nêv jîyanek bi zehmet û dijar de bijîyê... Yan jî tu ê li nava gund vala û bêkar bigerî û helbet hingê jî, tu kes keçikên xwe nade te."

Piştî wan şîretên nedemokratîk, bêhêvî û neçarmayî bûm. Êdî dem dema biryardayîne bû. Û min bi qîretek mezin telika spî kişandîbû serê xwe. Êdî jîyan û rêya min hatibû guhêrin. Rêberê min Hz. Mihemed rûyê min ber bi Mekkeyê û enîya min jî hatibû erdê. Û min dest bi jîyana xwe ya nû kiribû...

Îkra, ya Mustafa! Elif, Bê, Tê, Sé, Cîm...

Û paşê jî bûyî mele?

– Hema hema amade bûm. Ji ber ku min li heft salîya xwe dest bi fêrî Quranê û li deh salîya xwe jî, dest bi fêrbûna erebîyê kiribû.

Lê min di şanzdehsalîya xwe de medrese terk kiribû û çûbûm Îstenbolê. Min li Çinar Otêlê dest bi karkirinê kiribû. Li sala 1977an jî dîsa li Îstenbolê, min bi sitranên kurdî û tirkî kasetek tijî kiribû.

Û min biryara xwe ya dawîye jî berî panzdeh salan(li 1995an) dayîbû.

Êdî rêber û mamosteyê min Musa Anter e. Qibleya min Amed, Hewlêr, Mahabat û Qamişlo ye. Enîya min êdî ber bi ezman, hemî xebat û dueyên

min jî ji bo ciwanên kurd û Kurdistanê azad e.

Mamoste, were em dişa vegerin dema zarokatîya te. Ez bawer im, tu yê ji me re qala bûyerên pir balkêş bikî.

– Ez li mizgeftê hafîz, li kolanan stranbêjê gundiyan bûm. Gundîyan ji min pir hez dikirin. Ji ber ku min bi stranên xwe dunya wan, bi ezan û xwandina selayê xwe jî axreta wan şên dikir.

Ji hêla dîn ve min di zarokatîya xwe da li hemberî dijberan, jîyîn û xweparastinê baş fêr bûbûm. Ji ber ku mamoste û şîretvanê min, kalê min Bekirê Oxçî bû. Dema ku ez ji kûçikan ditirsîm, wî ez li kûçikan siwar dikirim. Ji mêşan ditirsîm, mêş digirtin û dikir nav mista min û wiha digot: “Recalê min, dilê te, ji dilê wan hemîyan mezintir e lo!... Bihêle, bila ew ji te bitirsin.”

Rehmetî miroveki taybet bû. Rispiyên gund, hîna qala jîrekî û cêmerîya kalê min dikin û dipesinin.

Li dibistanê sala min a yekemîn bû. Mamosteyê me, Halil Kurtuluş miroveki rûgerm û zarxweş bû. Her çiqas zimanê kurdî qedexa kiribe jî, disa jî li pola me ewqas zêde rêzkarî û lêxistin tunebû. Lê ji polên din dengê girîn û qîjeqîja hevalan wek ku serbanê dibistanê didirand.

Mamosteyê me, ji bo çend rojan çûyîbû bajêr...

Ez serokê polê bûm û min ji hevalan pirsî bû: Hevalno!... Em wexta xwe çawa derbas bikin? Wan jî sitranek xwastin û min dest bi Zeryê kiribû.

Ez diherim leşkerê, lê Zeryê

Here mêreki xwe bike, lê yarê

Te mêr kir, xortan bike lê Zeryê

Te kal kir, min ji bîr neke can yarê

Nêzikî dawîya sitrana min, derîyê polê ji nişka ve vebû û memosteyê pola duyemîn ketibû hundir. Min di heman demê da sitran guherand û ji Zeryê derbasî *Mor Koyunê* bûbûm.

Aman Mor koyun meler gelir

Yavrum dağları deler gelir

Aman hakikatli yar olsa

Yavrum uykuyu böler gelir

Nesine de yavrum nesine

Sigara da koymuş fesine

Yavrum ben yandım birisine

Mamoste ez rawestandim û bi zimanê tirkî wiha got:

“Yeter ulan namussuz! Şu parmak kadar boyunla beni aldatmaya çalışıyorsun öyle mi? Sen beni o kadar sersem mi sanıyorsun? On dakikadır dışarıdan seni dinliyorum. On dakikadır le le, le le, ben içeri girince, Aman Mor Koyun.”

Bi kurdî, axaftina Mamoste:

“Bese lo bênamûs! Tu bi vê bejna xwe ya bi qasî tilîyekê, dixwazî min bixapînî ne wisa? Tu min ewqas gêj dizanî? Ev deh deqîqe ne, ez ji der ve li te guhdarî dikim. Û deh deqîqe ne lê lê, lê lê, ez

ketim hundir, Aman Mor Koyun.“

Helbet şelmaqên mamoste, rengê rûyê min, kiribû wek rengê alaya Tirkîyê.

Mamê Recall, dixwazim pirsên xwe li gora temen û jîyana te, rêz bi rêz bipirsîm. Te medrese terk kir û tu çûyî Îstenbolê. Te li wir di otêlekê da dest bi karekî nû û jîyanek nû kiribû ne wisa? Çima, ji bo çi te ew biryara dabû?

– Ez herdem xulamê azadiya xwe me. Ez xwe wek hespekî bê dizgîn û bê gem dihesibînim. Eger rojekê ez ji hêla nêçirvanekî ve werim girtin, ez ê wê gavê bibim dûpişkek û wî nêçirvanî bi wê nêçir kirinê, xemgîn û poşman bikim.

Wan salan, ji bona du sedeman min medrese terk kiribû...

A yekemîn: Ez her roj, gav bi gav ji meletîyê bi dûr diketim. Ji ber ku di navbera min û meleyan de ji bo pirs û bersîvan pir caran bûyerên naxwoş diqewimîn. Pirsên min ji hêla wan ve bi piranî bêwate dihatin nirxandin.

Ya duyemîn: Ez gelek rûmetê didim hebûn û azadîya xwe. Ji bo wê min nedixwast ji bona parîyek nan, bibim şîretvanekî bêbawerî. Wek îro, hingê ji armanc û arzûya min, wek bav û kalê xwe jîyanek xwezanî û bi rûmet bû.

Piştî medreseyê te çawa dest bi sitranbêjîyê kiribû?

– Min di zarokatîya xwe de jî distira. Ez hîna jî xwe bi xwe distirê.

Dilê min, bi huner û muzîkê zindî dibe. Cixarekêş çawa bêcixare nabin, ez jî bê muzîk nabim û nikarim bijîm. Ez ji hemî sitranbêj, hunermend û komên muzîkên kurdî hez dikim û lê guhdarî dikim. Tama hemîyan cûr be cûr e. Kazo, Şivan, Aynur, Aram û ji sitranbêjên Anatolîya Navîn: Mehmetî Kürt Remzî, Koma Xelîkan, Bilal, Serbûlent, Nurettîn, Şewket, Tûlay, Zeliha û ji yên din re silav û hurmeta xwe pêşkêş dikim û ji hemîyan re serketinek daîm û bê dawî dixwazim.

Li Îstenbolê tomarkirina kaseta min bi temami xebatek heweskarî bû. Wek ji hêla we ve jî diyar e, ez carinan dersên zimanê kurdî jî, bi sitran sitrandinê didim. Wek li malpera bi navê www.zincirlikuyu.net û www.kurdweb.com ê. Armanca min, zarok û ciwan bi kêfeke mezin him bixwînin û him jî lê guhdar bin.

Mamoste, em dora pirsan şaş nekin. Helbet em dê qala xebat û nivîsên te yên bi rûmet bikin. Pirs min, li Tirkîyê, an jî em bibêjin piştî Îstenbolê, jîyana te çawa berdeyam kiribû?

– Min çar salan li Çinar Otêlê, li Îstenbolê kar kiribû. Du salan li Ankara Otêlê, li Ankarayê. Çar salan jî li sefaretê Amerîkî dîsa li Ankarayê kar



Mam Recall bi kincên xwe yên sporê.

kiribû. Paşê min û birayên xwe, me li Ankarayê û li Antalyayê, ji deh salan zêdetir dest bi karê bazirganîyê kiribû. Lê me ji wî karî bazirganîyê, gelek xesar û ziyar dîtibû. Wan salan min rojên pir dijwar derbas kiribûn. Wek xopana xizanîyê dîsa û ji nû ve veqerîbû û hatîbû ber derîyê min.

Wan salan, rewşa siyaseta nijadperestî û aboriya Tirkîyê wek hemî kurdan dibû sedema wendabûyîna hêviyên min jî. Teşqele û berpirsariyê ez kiribûm nav lêgerîneke mezin.

Ji hêla din ve zarok mezin dibûn û helbet xwastinên wan jî roj bi roj zêde dibûn. Êdî wext wexta biryardayîne bû. Min pir dixwast herim Fransayê, lê ji bona zimên min newêribû. Min zimanê

îngilîzî, çand û têgihaştina gelê amerîkî piçek dizanîbû. Ji ber wê sedemê li sala 2001ê hatim Amerîkayê.

Kekê, li gundên me, gel herdem bi kurdî diaxivin. Lê xwendin û nivîsandinê, pir kes nizanin. Tu kingê nivîs û xwendin fêrbûy û tu çawa li Amerîkayê bûyî mamos-teyê zimanê kurdî?

– Ev pirsêk girîng û balkêş e. Min li wan salên xwe yê dijwar û vala dest bi fêrbûna pirsgerêka Kurdistanê ya siyasî û çanda kurdan kiribû. Gelek nas û hevalan jî alîkarîya min dikirin.

Min piştî sala 1993an bîranîn û helbestên xwe ji zimanê tirkî werdigereand kurmançiyê. Helbet gelek çewtî û kêmasiyên min hebûn û hîna jî hene. Lê disa jî min bi xîreteke mezin ew kêmasiyên xwe bi pîranî serrast kiribûn. Hevalan jî min ra carinan pirtûk, kovar û rojnameyên bi kurdî, yê kevn dianîn. Min hingê ev nivîsar wek xelatekê dihesiband û bi wê yekê kêfa min pêdihat.

Dema ku hatim vira, Amerîkayê, min nêzikî salekê li *Komela çanda gelê kurd û amerîkî*, dersên zimanê kurdî dida. Dîsa hema hema li hemî rêxistin, newroz û li konferansên kurdan jî, min alîkarîya gelê xwe kir.

Paşê min li zanîngeheke amerîkî, ji du salan zêdetir, dersên zimanê kurdî da. Û niha jî xudanê karê xwe me.

Mamoste, tu niha jî, bi awayekî cuda, him li ser internetê dersên kurdî didî û him jî bi kurdî û tirkî nivîskarîyê dikî. Ji xeynî çendek nivîsên te, tu bi gelemperî wek bîranîn û ceribandînen xwe dinivîsî, ne wisa?

– Bêguman, ev pêdandin û nirxandinên te, di cîh da û rast in. Bi rastî qet naxwazim, ji dil û can, ji bo dîn û sîyasetê tiştekî binivîsim. Mixabin herdu jî bi gelemperî bi derew û lîstikê tèn meşandin. Dema ku em bala xwe didin malbat, jîyan û ramanên rêberên dîn û sîyasetê, hingê her tiştek eşkere tê ber çavên me. Lê em dîsa jî hişyar nabin. Li ser mijarên rojane û sîyasetê, bi zîmanê tirkî, tenê sê nivîsên min hene.

Devlet İmralitya sığındı

Sine i Kurdistan

Barış Pilavı

Demokrasî, rexne kirin û nirxandin e. Lê mixabin, em hemî gelên Rojhilata Navîn, rexneyan wek çêr û heqaret dinirxînin. Lewma jî ji derîyê me, şer û şemate kê mabe.

Di her sê nivîsên min de, armanca peyamên min, çima ewqas rêzan û rêzanîyên me hene û tenê serok Apo dibê muhatabê dewletê? Mirovek, dikare çewtîyan bike. Lê sed kes an jî du sed kes nikarin bi hêsanî çewtîyek mezin bikin. Lewma bi piranî, helbest û bîranînen xwe dinivîsim. Ji hêla din

ve, ji bo ciwanan dersên kurdî amade dikim. Ez van xebatên xwe, ji bona ku piçek hêsantir bibe, carinan bi sitranekê carinan jî, bi çîrokekê pêşkêş dikim.

Mamosteyê delal! Hûn ji bo hebûn û xebatên kovara me Bîrnebûnê çawa difikirin?

– Ez bi hebûna *Bîrnebûnê* pir serbilind û bextewar im. Bi vê minasebetê hemî hevalên weke: Birêz Alî Çiftçi/ Dr. Mikailî/H. Erdogan/M. Bayrak/Î. Tûrkmen/M. Duran/V. Duran/S. Asê/Î. Baysal/C. Dağdelen/M. Özgür/S. Bulut/Ûnasên min, birêz Nuh Ateş û cenabê we, (Mem Xelîkan) û hemû hevalên din ji dil û can pîroz dikim... û tèm çavên we hemîyan. Û dibêjim: hûn pir bijîn!

Ez ji dil bawer dikim ku kurdên Anatolîya Navîn, bi van xebatên xwe yên bi awayekî demokratîk, ji bo her çar aliyê Kurdistanê bibin bas û bibin hêvîyeke pir mezin. Em dê di demek kurt de bi serkevin. Û helbet em dê hemî mafên xwe yên ku hatibûn nijdekirin û ji bîrkirin, yek bi yek, ji nû ve bi dest xwe bixînin.

Êdî bes e! Bila dawîya bindestî û zordestîyê were.


*

KARÎN

Hemî gel bi pêş de çûn
Tenê em man li seranserî cîhanê
Cîhana lal
Cîhana kûr
Û cîhana bi du rûyan
Tenê zimanê me qedexe ye
Û tenê navên me bi tirkî, erebî,
yan jî farsî ne
Tenê em bê welat in
Û tenê em koçber, tenê em mehrûm
û bindest in
Ereb dikarin bibêjin ku: hûn êzîdî,
zerdeştî û alewî ne
Lê em nikarin bibêjin ku em ne
misilman in.
Ew dikarin bibêjin ku hûn kurd in
Lê em nikarin bibêjin ku em ne tirk in.

*Mamoste, ez dixwazim ji bo kovara
kurdên Anatolîya Navîn, Bîrnebûnê
çend pêşnîyazan ji te bibihîzim.*

– Wek ji hêla we ve jî diyar e, kêmasiyên
me yên sereke, nezanîna ziman û dîrok
ye. Ciwanên me yên ku li bajarên me-
zin dijîn, kingê bi zimanê dayikên xwe,
li ser mijara dîroka kurd û Kurdistanê
axivîn, hingê em ê baş bizanibin ku
êdî roja me hatiye hilatin. Em dikarin
bibêjin, kovara *Bîrnebûnê*, ji bo per-
werdeyî û çanda gelê kurd, karekî baş
û girîng derdixîne holê.



Mam Recall

Arzû û xwastina min tevî *Bîrnebûnê*,
hemî rojname û kovarên me yên din,
li hemî gund û bajarên Kurdistanê, ji
hêla ciwanan ve werin xwendin û we-
rin par ve kirin.

Ji hêla din ve, hemî xizmet û alîkarî,
bi derfetên fireh tên meşandin. Ji ber
wê yêkê, rewş û cîhê aborîyê, divê baş
bibe. Ji bona wê, gerek em hemî ji dil
û can alîkarîya kovara xwe *Bîrnebûnê*
bikin, hêjmara wê hîn zêde bikin.

*Kurdên Anatolîya Navîn, bi xîret û
bawerîyeke mezin heta vê rojê, xwe wek
eslê xwe parastin û ji kokên xwe veneqetîn.
Çand û zimanê xwe parastin. Tu rewşa
kurdên Anatolîyê çawa dinirxîni û ji bo*

pêşeroja hemî kurdan, çi nêrînên te hene?

– Kurdên Anatolîya Navîn, li hemberî asîmîlasyon û înkarkirinê, her dem wek şêran dawestîn. Çend sedsalan berê, bav û kalên me, bi nîfir û şînan, ji war û welatên xwe bûn. Me hemî derd û êşên xwe, kiribû nav parîyek nan û bêhêvî û neçar daqultandibû. Me stûyê xwe bada û tucaran kîn neajot, lê me pismam, dotmam û welatê bav û kalên xwe, Kurdistan qet ji bîr nekir û ji *Bîrnebûn!*

Kîjan sîyasetvan, rêzan û serok, bê Kurdistan kîjan peymanê îmze dikin bila bikin, em kurdên Anatolîya Navîn, dev ji azadîya welatê xwe bernadin. Eger Kurdistaneke azad ava nebe, em li kolanên Ankarayê, Qonya û Qirşehîrê nikarin di nav aşî û aramîyê de bi kêfa dilê xwe bigerin.

Ez ji bo Kurdistaneke azad, bi hêviyek mezin dijîm. Dema ku em li bûyer û pêşketinên cihanê, yên li salên dawîyê dinêrin, hingê em têdigêhijin ku roja azadbûyîna Kurdistanê jî pir nêzîk e.

Ji hêla din ve gelek kêmasîyên me hene. Berî her tîşteki me hîna di nêv xwe de, aşî û biratîya xwe ava nekirîye û em nebûne gelê aşitîxwaz. Em hîna ji bo dîne ereban û ji bo jîyana ecem û tirkan, her roj hev û du dikujin.

Mamosteyê delal! Baş tê zanîn ku tu ji zarok û ciwanan pir hez dikî. Ji bo wana, çi

şîret an jî peyamên te hene, kerem bike.

Ciwanên delal!

- Hûn kingê zane bibin, hûn ê hingê bi xwe ewle, bêtirs û azad bijîn.
- Destên hevdu bernedin û bi alîkarîya hevdu fêrî ziman û dîroka xwe bibin.
- Bi kurdî bifikirin û bi kurdî biaxivin.
- Ji bîr nekin! Mîrov nikarin bêziman û bêdîrok azad bibin û azad bijîn.
- Kîjan kurd çiqas zirar û xesarê dide we, bila bide. Hûn her dem wan bibexşînin û her roj ji nû ve bibin heval û bira.
- Hemî têkoşînên xwe, bi bawerî û bi awayekî demokratîk bidin meşandin.
- Ji sazî û rêxistinên olî(dînî) û nijadperestî bi dûr bikevin.
- Tu car li ber mirovan negerin, tenê û her dem li ber Xwedê bigerin.
- Nebin xulamên tu kesî! Bila serok, şêx û mele bibin xulamên we.
- Şîret û ramanên Montaigne, Gandhi, Mandela, Leh Valesa, Apê Mûsa û Cîgerxwîn bixwînin, fêr bibin û ji bîr nekin.
- Her dem ji bo Kurdistaneke azad bijîn.
- Bi şev û bi roj di xewn û xeyalên xwe de li her çar alîyên Kurdistanê bijîn.
- Rojekê herin û hilkişin ser sûrên Kela Amedê, têra dilê xwe, lê temaşeyî çand û dîroka bav û kalên xwe bikin û wê şevê li wir bijîn.
- Rojek din derbasî Mehabadê bibin û seredana pismam û xarziyên xwe

bikin. Şevêkê jî bibin mêvanê wan û tevî wan bijîn.

- Paşê herin Hewlêrê, li wira destên met û xaltiyên xwe maçî bikin û şevêkê jî li cem wan rûnin.
- Mam û xalên xwe, ji bîr nekin! Herin Qamîşloyê jî. Ew camêrana, we zû bi zû bernadin. Li wira jî rojekê xwe bijîn.
- Ciwanên delal û gelê kurd! Serê we hemîya her daîm bilind bibe û qet neyêşê.

Û hûn pir û pir bijîn!

Kek Recall, tu ji bo pêşeroja xwe û gelê kurd çi difikirî? Çi planên te yên şexsî an jî ji bo gel hene?

– Birayê Mem! Ez pênçe û pênçsalî me û bi tena serê xwe dijîm. Zarokên min her sê jî mezin in. Êdî ew dikarin çawa li ser pêyên xwe dawestî û çawa jîyana xwe bidomînin. Gelek planên min yên şexsî hebûn, lê êdî neman.

Hemî plan û xebatên min ji bo zarokan in. Ji bo wan, sê projeyên min hene.

Dixwazim bi zimanê îngilîzî, kurdî û tirkî filmekî karton amede bikim.

Pirtûkeke helbestan û pirtûkekê jî ji bo jîyan û nêrînen xwe binivîsim.

Û rojekê herim Kurdistanê û li wira alîkarîya zarok û ciwanan bikim. Ji bo wan delalan, dersên zimanê kurdî û îngilîzî bidim û bi wan re bijîm.

Kekê delal! Ez ji bo hemî peyv û bersivên te yên xweş û zelal pir sipas dikim. Ez hêvîdar im, em dê carek din, ji nû ve û wê care li ser mijareke nû û cuda biaxivin. Û dibêjim: mala te ava be û tu pir bijî. Û gotinên te yên dawîyê, li ser ser û herdu çavan!

– Birayê Mem Xelîkan, ez ji sipasî we dikim û bi naskirîna cenabê we, kêfxweş bûm.

Li dawîya axaftina xwe, ji hemî gelê kurd re, silav û hurmetên xwe, pêşkeş dikim û ji her çar aliyê Kurdistanê re azadîyeke payîdar dixwazim.

Û ji bo kovara kurdên Anatolîya Navîn, *Bîrnebûnê* serketineke herî mezin dixwazim û hemî kedkar û xebatkarên wê careke din pîroz dikim.

Û helbet pirtûka te ya bi rûmet, "*Şevbider im*"ê jî pîroz dikim û ji bo hemî xebatên te, serketineke herî mezin dixwazim. Gelek sipas.

Mem Xelikan

memxelikan@hotmail.com

"Vebûn" di parlamentoya Tirkîyê da

Nebi Kesen

Di mehên dawî da li ser projeya AKPê ya "Vebûn" gelek tişt hatin gotin û niqaşkirin. Di 10 û 13ê mijdarê da di parlamentoya Tirkîyê da, cara yekem, li ser vê mijarê gotûbêja giştî pêk hat. Li hêla hikûmeta AKPê, partiyên din jî dîtî û pêşniyarên xwe anîn ziman. Carek din êşkere bû ku ji aliyê çareserkirina pirsgerêka kurd û projeya "Vebûn"ê ve pozîsyonên hikûmet, muhalefet û kurdan ji hev pir dûr û cûda ne.

Bi navê hikûmeta AKPê, wezirê karê hundir Beşir Atalay çarçeveya "Vebûn"ê pêşkêş kir. Li gora axaftina Atalay, armanca hikûmetê ew e ku wê gavên mafên çandî bavêjin û ji bona vê hinek qanûnan biguharin yan jî yên nû derxin. Hinek mijarên van gavên hikûmetê ev in: serbestkirina weşanên kurdî û yên zimanên din bo televîzyonên prîvat, avakirina enstîtuyan li zanîngan, serbestkirina navên berê yên gund û bajaran, rakirina qedexeyên li ser zimanên cuda (ne tirkî)

ji aliyê propaganda û xebatên partiyên sîyasî, serbestbûna axaftin bi kurdî bo girtîgehan, pêşgirtina cûdakirin (ayrimcilik) û îşkence, firehkirina mafên mirovan û hwd.

Naveroka paketa "Vebûn" a hikûmeta AKPê him kêr derket û him jî ji bo çareserkirina pirsgerêka kurd ne bes e. Êşkere bû ku hikûmet bo guhertinên bingeşî ne amade ye. Minakek: Kurdî di programa AKPê da jî wek zimanê perwerdehiyê cih negirt. Gavên ji aliyê mafên çandî û berdewamkirina "şerê li dijî terorîzmê" wek nakokîyeke sîyaseta hikûmeta AKPê dîsa derket holê. Serokwezir R. Tayyîp Erdogan di axaftina xwe da behsa "yekbûna netewî" kir û armanca "tevakirina terorê" anî ziman.

Wek sîyaseta hikûmetê û dewletê xuyaye ku ji aliyekî wê gavên mafên çandî bîn avêtin û ji aliye din ve jî operasyon û êrişên li ser PKKê wê berdewam bikin. Qebûlkirina nasnameya kurd û dayîna statûyeke fermî di programa

hikûmeta AKPê da tûne. Sîyaseta kurd ya hikûmetê jî li ser redkirina mafên grûbî bo kurdan pêk hatiye. Guhertina Qanûna Bingeh jî, ji aliyê Erdogan hat ziman, lê di demek nêzik da ne mijarek rojevê ye.

Gotûbêja di parlamentoyê da bi axaftina Ufuk Aras ku ji Istanbulê parlamenterekî serbixwe ye, ji aliyê mijarê hinek dewlemend bû. Aras jî wek Ahmet Turk behsa pirsgerêka kurd kir û pêwistiya çareserkirinê anî ziman. Wek parlamenterekî tirk, Aras hewldaneke bi rûmet û dostanî ji bo kurdan da ber çav.

Hevserokê DTPê, Ahmet Turk di axaftina xwe da bal kişand sîyaseta kurd ya dewletê heta îro û pêwistiya guhertina vê sîyasetê anî ziman. Ji axaftvanan tenê Turk, pirsgerêka kurd bi nav kir, li ser sedemên wê sekinî û înkarkirina nasnameya kurd şermezar kir. Bi zimanekî dîplomatîk, Ahmet Turk çarçevaya çareserkirinê di parlamentoyê da cara yekem da zanîn. Kêmasiya axaftina wî ew bû ku bi eşkere daxwazên kurdan û şertên Abdullah Ocalan û PKKê bo destberdana ji şerê çekdarî negot. Di vir da mimkûn e ku hewldana CHPê û MHPê rolek lihîst û Ahmet Turk nexwast di parlamentoyê

da niqaseke nû veke. Çima ku herdu partî li dijî projeya AKPê ne û mafên çandî jî qebûl nakin.

Bi navê CHPê, Onur Oymen û serokê partiyê Deniz Baykal axaftin kirin. Oymen bi eşkere berdewamkirina şer anî ziman û xwedî li qetliamên di serhildanên Şex Saîd û Dersîmê (di bin serokatîya Seyîd Riza da) derket. Axaftina wî bi xof, çarçevaya sîyaseta CHPê di pirsgerêka kurd da careke din eşkere kir. Ev partî ne tenê nijadperest û dijminê nasnameya kurd e, ew piştgiriya şer û komkujiyê jî dike.

Êrişên MHPê di parlamentoyê da bi giranî li ser sîyaseta "Vebûn"ê bûn. Wek tê zanîn, ev partî, her gavê mafên çandî bo kurdan û kêmetewan ji pêsta red dikir. Projeya hikûmeta AKPê, li gora MHPê, bo "perçekirina netewê tirk û Tirkiyê" hatiye amadekirin. Bona vê, serokê MHPê Devlet Bahçeli daxwaza destberdana ji projeyê anî ziman û wek CHPê berdewamkirina şer xwest. MHP, ku netewperestiya wê li ser înkâr û asîmîlekirina kurdan pêk tê, li dijî çareserkirina pirsgerêka kurd û projeya "Vebûn"ê ye.

Gotûbêja di parlamentoyê da bi axaftina Ufuk Aras ku ji Istanbulê parlamenterekî serbixwe ye, ji aliyê mijarê hinek dewlemend bû. Aras jî wek Ahmet Turk behsa pirsgerêka kurd kir û pêwistiya çareserkirinê anî

ziman. Wek parlamenterekî tirk, Aras hewldaneke bi rûmet û dostanî ji bo kurdan da ber çav.

Naveroka projeya "Vebûn"ê li gora Tirkîyê tiştêkî nû ye, lê ji bona kurdan û jî aliyê çareserkirina pirsgerêka kurd têrê nake. AKPê di sîyaseta xwe da guh nedaye rêxistin û şexsîyetên kurdan û di bin tesîra sîyaseta serokerkaniyê da maye. Hevdîtînen hikûmeta AKPê bi DTPê û saziyên cîvakî ra tu rolek mezin di tespîtkirina projeya "Vebûn"ê da nelîhistine. Ji aliyê din ve, xuyaye ku têkiliyên Tirkîyê bi herêma Federal ya Kurdistanê ra li ser hikûmeta AKPê pir tesîrek nekirîye. Çima ku nasnameya kurd wek netewekî, ji aliyê dewlet û hikûmeta AKPê hîn jî nayên qebûlîkirin û mafên netewî yên kurdan di rojevê û projeya "Vebûn"ê da cih negirtine. Bi vî şîklê PKK dest ji çekan bernade û pirsgerêka kurd çareser nabe.

Bi projeya xwe, îro AKP bi tenê maye û ji aliyê raya giştî ya kurd û ya tirk hindik alîkariyê dibîne. Daxwazên kurdan û gavên çandî yên hikûmeta AKPê ji hev dûr in. PKK û DTP bi projeya "Vebûn"ê ne razî ne û ji bona vê rexneyên xwe li gel hikûmeta AKPê berdewam dikin. Gotûbêja di parlamentoyê da eşkere kir ku partiyên wek CHP û MHP ji her aliyê ve li dijî "Vebûn"ê ne. Ji bona vê, nekonsensûsek tirkan û kurdan ne jî di navbeyna hikûmet û muhalefeta parlamontoyê da hevkarî bo çareserkirinê pêk hat. Gavên çandî yên wek projeya hikûmeta AKPê wê bimînî û him ji aliyê kurdan û him jî aliyê hêzên kemalîst, nijadperest û netewperest ve bên êrîşîkirin. Xuyaye ku ev rewşa niqaşên li ser pirsgerêka kurd û "Vebûn"ê wê heta hîlbijartinên 2011an berdewam bike.

Malperêka nû ya gundê Kelhasan, www.kelhasan.ch

Ev malpera, www.kelhasan.ch ji aliyê gundiyan ji Kelhasan ku li Îsvîçrê dimînin û Fonda Cenezeya ku bi vê platformê ve girêdayîye, tê çekîrin. Bi rîya vê malperê hem agahdariyên komelê û Fonda Cenazê û hem jî gundê Kelhasan bi endamên xwe didin nasandin. Ji bo ku ev bi rêk û pêk informasyon, dîrok, malbatên gund, çand, folklor, henek/yaranî, klam/stran, lîstîk û çîrokên xwe di vê malperê de berhev bikin û biparêzên, lazim e her kesek ji aliyê xwe ve, çî dizane ji malperê re bişînin. Deriyê malperê ji we giştîkan ra vekirîye! Eger li ba we resim/wêne, zanebûna li ser malbata we, video, yaranî, çîrok û wekî din çî hebe, ji malperê re bişînin. Werin, em bi hev re malperê bo pêşeroj û zarokên xwe dewlemend bikin û rind bixemilînin.

www.kelhasan.ch

Kurdên Xorasanê

Dr. Kawa KHORASANÎ

Kurd ku ji qomên hind û ewrûpayê ne, ji lêkolîn û kûzên kevinensiyê hatiye belîkîrin ku kurd xwediyê temodeneke mezin bûne û nêzikî 7000 hezar sal berî niha li welat û çiyayên bilind yê Mezopotamyayê jiyane.

Li destpêka sadsala 16an miletê kurd di navbeyna îparatoriya Osmanî û Îrana Şah Sefewî bûne. Zevî û xaka kurdan bûye daxwaziya herdu împaratoran. Şerê Çaldiranê di sala 1514an de çêbûye ku Osmanîyan şikest dane Sefewîyan û Kurdistan bûye du beş. PAREK çû ser împaratoriya Osmanîyan û parek

jî çû ser împaratoriya Îraniyan.

Xorasan ku ji paytexta Sefewîyan zor dor bû, Ebdol Momin xanê Ozbekî bi êrişeke xwe ya çekdarî li ser Xorasanê pêşrewî kiriye û heta nêzikî Damqanê û Simnanê pêş ve çûbûye. Li pêşrewîya xwe şehr, gund û dêhat wêran kirine û gelek mirov ji hatine kuştin.

Şah Ebasê Safewî ku lo gor felsefa Îbn î Emîd gotibû pêwîstî pê heye ku kurdan bikine sîpera xezeb û belayê, wî jî rabû kurd şandin Xorasanê bakurê rojhelata Îranê.

Lê Şah Ebas bi şandina kurdan û



Xorasanê, bi tîrekê li du nîşanan dixist. 1- Weziyeta xwe lê rojhilatê Îranê çêdikir, pêşî li hemlên ecnebî û Ozbekeyan digirt. 2- Kurd ji hevdu vediqetandin û di desthilatiya xwe de digirtin, bi vî awayî hingî dikanî pêşiyê li serhildan û serhişkiya kurdan bigire ku ji bo wî moşkileyeke herî mezin bûye li rojavayê Îranê.

Li ser herdu halan jî, çî bi serketina kurdan çî bi şikestina kurdan û nabûndiya wan ya li Xorasanê, Şah Sefewî fayde dibir.

Siyaseta Şah Sefewî karê xwe kiriye û welatê Îranê bi destê êrişgeran parçe nebûye, lê welatê kurdan bi xwe hate parçekirin û milletê kurd hat pijiqandin û ma li bin destên hakim û qasibên zalim.

Ji êl û eşîrên kurd hinek şandin Xorasanê ku di zemanê silsila padîşahiya Sefewî de, di sala 1590î de. Sebeba şandinê jî wek ku hat gotin bi rastî jî siyasî bûye. Kurd hatine şandin ku li dijî êrişên Ozbek û Moxolan bisekinin. Kurdan li Xorasanê şikesteke zor sext dane êrişgeran û ew vegerandine şûna xwe ya berê.

Li rêkoçan hinek ji koçberan ji ber sebebên cûr be cûr ku hîn jî li wan deran dijîn, mîna ku li: Rûdbar, Takistan, Veramîn, Demavend, Fîrîzkoh, Nûr, Kelardest. Lê tayfên wan jî mîna: Ka-

kavend, Amarlû, Şamlû, Kelhûr, Umeranlû ne.

Şah Ebasê ku ji camêrî û zora kurdan gelekî tirsiyaye, xwestiye ku herweha yekitiya kurdan xirab bike û wan ji hedu bipijiqîne ta hukmê xwe berde-wam bike.

Di salên 1590î de 5000 malbatên kurd bûne ji rojavayê Îranê koçberî hêla Xorasanê bûne û ber bi rojavayê bakurê Îranê ketine. Ev koçberîya wan nêzîkî sê salan kişandiyê û ji wan tenê 4500 malbatan xwe gîhandine Xorasanê. Yên din jî li ba rêkoçan mane û herd bi herd cî girtine.

Şah Îsmailê Sefewî kurdên tayfê qeremanlû bi serokatiya Beram begê Qeremanî li dijî Ozbekan li Xorasanê serast kiriye. Lawê Şah Îsamîl, yanî Şah Temasb jî kurdên tayfên Zengen, Çigînî û Kelhor koçandine Xorasanê ku alîkariya Beram begê Qeremanî bike.

Li sala 1595an, li menteqa Cacermêya Xorasanê şerekî mezin di navbeyna Ferhad xanê Qeremaqnî û Ebdol Momin xanê Ozbekî derketiye ku Ozbekan şikest xwariye û kurd jî her bi pêş ve çûne û Ozbek ji herêma Xorasanê derxistine.

Kurdên Xorasanê ji du êlan pêk tê û her êlek jî ji gelek tayfeyan pêk tê. Ew herdu êlên Xorasanê ev in:

برخی بر این عقیده اند که کاوه آهنگر که کردهای فراری را به دور خود جمع کرد و علیه ضحاک قیام نمود و فریدون را به تخت شاهی برنشاند از همین کردها بوده که بعدها کردها خود را بدو منسوب نموده کاوه نی نامیدند معروف به کاوانلو و بعدا به کاوانی تبدیل یافت) مرحوم دهخدا ذیل واژه کاوانی می نویسد: منسوب به کاویان و درفش کاویان منسوب به کاوه

1- **Zeferanlû:** Êlê herî mezin Zeferanlû ye ku nêzîkî 30 tayfeyên xwe hene.

Kawî (Kawan, Kavîyanlû), Amarlû, Qulîyanlû, Bîçeran (Şamlû), Sivikan, (Sivikanlû), Baçîyan, Badilan, Hîzolan, Birîvan, Hemzikan, Milan, Pahlîvanlû, Qeremanlû, Qaçikan, Reşvanlû, Rûtîkanlû, Îzanlû, Şerikan, Xelikan, Şîxikan, Sêlisipiran, Sêvikanlû, Topîkanlû, Vîranlû, Zeydanlû, Îzanlû, Celalî, Palîkanlû, Alxas.

Kawan (Kavanlû): Ev tayfe vedigere ser Kawayê hesinkar ku bi hev re textê padişahiya Zehakê mar li pîlan li her-dê xistine. Kawan li şehirên Cenaran, Quçan, Şîrvanê rûdînin. Hinek ji wan jî koçberiyê dikin di navbeyna Quçanê û Meravê tapê de.

Qeremanî (Qeremanlû): Ev tayfe vedigere ser qeremanên li rojhilata gola Wanê li Tirkîyê. Gundên Mayvan, Tî-


tikan, Qasimabad, Şerikan û Heştmerx hemû ji tayfeya Qeremanan in.

Qereçûrî (Qereçolû): Ev tayfe vedigere ser nakurê Diyarbekirê. Hin ji Qereçşliyan jî li Bojnûrd, Veramîn û Demavendê dijîn.

Qaçîkî (Qaçîkanlû): Ku li gundên Qaçîkan, Dîzavend, Şemsixan û Ceferabadê dijîn. Hinek ji wan jî di navbeyna Serexs, Deregez û çiyayê Hezar Mascidê de koçberiyê dikin.

2- **Şadlû:** Êla Şadlî jî gelek tayfeyên xwe hene, mîna: Alan, Dirqan, Garîvan, Gurdan, Înran, Jaban, Juyan, Kaqan, Mîran, Qiliçan, Qerebaşlû, Qupran, Qereçarlû (Qreçûlî), Zendiyan.

Kurdên Xorasanê piraniya wan musulman in. Şehrên kurdan li Xorasanê mîna: Quçan, Bojnûrd, Esferayen, Şîrvan, Çînarvan, Radkan, Deregez, Kelat, Lâin, Aşxane, Faroş, Bacgrîvan, Mane û Similqan. Lê herwiha piraniya



kurdan li gundan dijîn û hinek ji wan jî di navbera welatên Serdsîr û Germsîrê de koçberiyê dikin.

Jiyana kurdan li gundan jî aliyekê ve baş e ku asîmilasyona ziman û çanda kurdî kêr pêk hatiye, lê ji aliyê senetkîrî û mekanîze û modernîzekirina kar û barê xwe li paş in. Piraniya kurdan li gundên Xorasanê bi ziraetkarî, pez û maldarî mişqûl in. Jiyana koçberiya yêlaq û qêşlaqkirinê jî hîn di nav wan de didome. Ciyên ku kurdên Xorasanê lê yêlaq dikin mîna çiyayên: Golîl, Hezarmacîd, Aledax, Şaycanê ne. Cî û mekanên ku kurdên Xorasanê lê qîşlaqê dikin, mîna: Serexs, Deregez û Merave tepe ne.

Nêzikî 100-150 sal berî niha Serdar Ewez xan, Jeho xan û Golmehmed (Xanê kelmişîn) li Xorasanê gelek şer bi dijminên derveyî hukûmeta merkezî ve kirine ku hîn jî di sitran û kilamên dengbêjan de tê bihîstin.

Li Xorasanê lologer û dengbêjên kurd yê bi nav û deng, wekî Remezanzanê-Alî Azîzî, Yahya Baqçiqî, Niyaz-Alî Sehrayî, Anyêb-Alî Sehrayî, Hacî Qorban Solêmanî, Alî Abşûrî, Mohe-med Yêganî, Aqacan Etayî, Remezan Aşêq, Mecîd Etayî û hwd.

Şairê herî mezin yê kurdên Xorasanê birêz Ceferqolî Zingilî ye ku pirtûka wî bi navê "*Dîwana Şîrên Kurdî*" hatiye

çapkirin û herwiha li nav kurdên Xorasanê belav bûye. Ceferqolî di 1855an de li gundê Goglînê ku bi ser şehre Quçanê ve ye, hatiye dunê. Dibêjin di gencitiya xwe de aşiqê Milwariyê keça kurd bûye, hekayetên ku hingê ji bo eşq û evîna Milwariyê bi şîran danîye. Mezelê wî niha jî li gundê Goglînê ye.

Li Xorasanê gelek niviskarên kurdên netewehez hene ku yê herî meşhûr û navdar Kelîm Tevehodîyê jî şehre Şîrvan e. Pirtûka ku "*Hereketa tarîxa kurd bo Xorasanê*" weke heft cildan hatiye çapkirin esereka wî ye. Ji pirtûkên wî çendek jî ev in: Stranên kurdî, Rêzimanê kurdî, Quçan, Esferayên diho û evroj. Herwiha gelek pirtûkên kurdî hatine nivîsandin û di nava kurdên Xorasanê de hatine belavkirin. Hîn ji xeber û nûçeyên kurdên Xorasanê û çanda wan jî di rojnameya Xorasanê bi zimanê farisî belav dibe. ([www.khorasannews.com/ Northern Khorasan](http://www.khorasannews.com/Northern_Khorasan)). Her roj li danê êvarê bi qasî nîvsaetekê jî dengê kurdî ji radyoya Xorasanê bi zaravayê kurmançî ji bo kurdên mentiqeyê weşanê dike. Lê televizyon, rojname, xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî li Xorasanê tune.

Saz û muzîkên kurdî li Xorasanê jî wekî Kurdîstana mezin e mîna: Dihol û Zirne, Dotar, Qoşme, Bilûr, Deyre / Def, Kemançe, Vîyolîn û hwd.

Qedera serserî

pênûs
 di êşa rondikên awiran de
 helbesta kezzebşewitî
 dinivîse
 wêneyên bîranînan
 di albûma qalpaxên çavan de
 dilop dilop ziqim û mitikê
 vedirişin
 kul û derd
 keser û nalîn
 bûn rawestgehên temenê wêran
 ewrên xemgîn
 xwe dagirtine ser bafiroka
 rûyê demên min
 bêdengiya pêlên bayê mirinê
 qeraxên gola hestên şîrîn
 kuncirandin
 çeqelên serdema xopan
 hêvî û xeyalên rengîn
 ji baxê kêf û seyranên min
 dizîn
 şadiya bêhna gulên biharê
 li nav taristana lîtavên genî
 xeniqî
 bextewarî
 di quncikê şevên xewle de
 herimî
 wêrekî
 di xezeba tofana teyrokan de
 qurifî
 tûrikê jiyana bûdele û serserî
 bi teşqeleyan

hatiye dapisandin
 rûmet û hurmet
 xoşewîstî û dilovanî
 neqîşên keskesora exlaqê min in
 ez
 bi saya arifbûna giyanê hejar
 boxçeya tirî ya dilê xwe
 ji her kesî re
 vedikim
 bi pêpelokên xweşbîniyê
 ber bi asta feziletê ve
 hildikişim
 li rêwitiya çolbeyaran
 bi derwêşan re
 cil û bergên sebirê
 li bedena derûniya tazî
 dipêçim
 min
 qêrîna demsalên xemkêş
 bi şeraba xumrî
 meyand
 bi pembûya spî
 xemiland
 li ser hêlekana berfa cemidî
 hejand û kire xewê

Xizan Şilan

2009-08-15
 Stockholm

Rûreşiya dirav

Xizan Şîlan

Di ser jiyana min re pêncî û pênc sal derbas bûbûn. Min navê wî sedhez caran bihîstibû. Lewra mirovan bi dilekî şad gelek caran ji min re qala wî dikirin. Lê min nedizanî ka ew çi mehlûqat bû? Min bi dil û can dixwest ku nêzikî wî bibim, bibînim, nasbikim û di derheqê wî de agahdar bibim. Lê ew tim û tim ji min dûr bû. Wekî ku ji min xeyidibû an jî nediwêrî nêzikî min bibe û her dem berê xwe dida çol û beyaran û bi gavên lezok ji ber min direviya. Roj, meh, sal û demsal mîna ava lehiyan di jana henasa awirên min yên xemgîn de melûl melûl diherikîn. Her roj di êş û kesera sînga xwe de kal û pîr dibûm û temenê wêran li min kin dibû.

Rojeke biharê û danê êvarê li ber siya dareke stûxwar û piştxûz rûniştibûm û min pişta xwe jî spartibû dara piştxûz. Wek her demê min dîsa bi ramanên xwe yên tevlihevbûyî û bi laneta bîranînên zaroktiya xwe ve di deryaya xem û xeyalên bêbinî de avjenî dikir. Bayekî hênik û nermik rûyê min mizdida. Ji dûr ve tişteke jî li ber ba diket

û ber bi min ve dihat. Min çavên xwe berdabûn wî tiştî. Ew nêzikî min bû û li ber çavên min bi bayê nermik re hêdî hêdî difirî û di ber min re derbas dibû, diçû? Min hema hêz da xwe û rabûm ser piyan. Min xwe da pê û gêhîştim wî, min pê girt heyna û kir nav lepên xwe û lê mêze dikir. Kaxizek bû, wêneyeke mirov û nivîsa reqeman jî li ser hebû. Qey te digot laşê wî ji tirsan di nav lepê min de diricife. Di navbera awirên min yên mereqdar de, piştî demekê ziman kete devê wî û bi hêrs got; "Min ji nav lepên xwe berde, dê ez ê bi rêya xwe de biçim."

Min got; "Ez te ji destê xwe bernadim. Ewqas sal li ser temenê min derbas bûn, min tu ne dît û ne jî naskir. Ez bi dil û can dixwazim te binasim."

Min ew razî kir û da ber xwe û dest bi pirsan kir.

– Ji kerema xwe tu dikarî xwe bi min bidî naskirin, ma tu kî yî?

Got; "Ser serê û ser çavan."

– Navê te bi xêr?

– Dirav e

– Tu ji ku derê yî?

– Ez ji Dinyayê têm.
 – Kengî tu ji dayika xwe bûyî?
 – Dayika min nîne.
 – Ma tu çawa hatî dinê?
 – Mirovan ez afrandim.
 – Kengî tu bi destê mirovan hatî afirandin?

– Dema ku mirovan bi hev re dest bi danûstandinê kirin.

– Tu ji mirovan hez dikî?

– Got; Na, na...

– Gelo mirov ji te hez dikin?

Bi rûkenî bersiva min da û got; "Gelek."

– Çima ewqas pir ji te hez dikin?

– Dilê wan şad dikim.

– Ma tu her dem dilê wan şad dikî?

Got; Na, na...

– Çima tu dîsa dibêjî na, na?

– Ez carnana kêfxweşî û şadiya rojan li wan diherimînim, bi salan jiyane li wan dijehrînim û xewa şevan li wan derivînim. Li bejna bihara wan ya rengîn û bêhnxweş babilîsoka seqema zivistanan dipêçim. Di henasa gewriya wan de bîra êş û tirs demsalên kambax dikolim. Nefreta xweliya toz û dûmanan li ser gora wan dibarînim.

Min bi zimanekî nerm pirsra xwe dubare kir û got; "Çima tu bîra êş û tirsê di dilê mirovan de dikolî?"

Wî jî bi dengê bilind û ji xwe bawer bes got; "Ev karê min e."

– Tu cil û bergan jî li xwe dikî?

Got; "Belê..."

– Tu kîjan rengê cil û bergan li xwe dikî?

– Ez bi hezaran rengê cil û bergan li xwe dikim û dikevim her rengê û qaliban.

– Ma tu çawa fêrî wan reng û qaliban bûyî?

– Ji mirovên bêşeref, bînemûs û derewîn.

– Tu jî derewan dikî?

– Bi hezaran rengî derewan dikim.

– Tu di jiyana xwe de qet qenciye nakî û rastiye nabêjî?

– Girêdayî berjewendiyên min yê li ser cîhanê ne.

– Li min bibore, te gotibû kar... Ey Dirav, karê te yê li ser cîhanê çi ye? Meraq dikim ka tu çi karî dikî? Tu dikarî ji min re bi aweyekî aşkere şirove bikî?

Got; "Ser serê û ser çavan."

– Mirov te bikartînin an tu mirovan bikartîni?

– Bi awirên xwe yê zexelane li nava çavên min nêrî û got; "Ez mirovan bikartînim."

– Ma çawa dibe, mirov ji bo ku te bikarbînin tu afirandine, ne wisa ye?

– Belê, lê mirovan ez rasterast bikar ne anîme, îro jî ez wan di rêyeke nerast de bikartînim.

– Qesta te ji rêyeke ne rast çi ye?

– Carnan ji bo kuştin û xwînrijandina kesên feqîr û belengaz û talankirina welatên azadîxwaz, mirovan di rêya xirabiya hilberînan tang û top, tîfing û

bombeyên jehrê de bikartînim.

– Gelo rûmet hurmeta te ji mirovan re heye?

– Qet tune ye... Ez exlaq, şexsiyet, qedr û qîmeta wan dixim bin lingên xwe û bi salan diperçiqînim.

– Lê rûmet û hurmeta wan ji te re heye, ma tu çima heqaret û qeleşiyê li wan dikî?

– Min ji te re qalkiribû, ez ne diravekî rast û durist im. Di saya mirovan de ez dikevim her rengî û qalibî.

– Lê ji bo mirovahiyê qet ne baş e?

Got; "Karê min yê li ser dinê ev e."

– Ey Diravê rûreş, tu carnan dilê mirovan şa dikî, lê pirî caran jî neheqiyê, pîsitiyê û dijitiyê li mirovan dikî, ma tu çima hatî dinê?

– Ma gunehê min çi ye? Mirovan ez afrandim, here ji wan bipirse!

– Wekî din tu çi dikî? Hinekê ji min re behsa tiştên ku ez nizamim bikî, dê baş bibe!

– Ma tu çima ewqas tiştan ji min dipirsî?

– Ez dixwazim te hê baştir binasim.

– Ma tu ne mirov î?

– Belê ez mirov im.

– Te ez afrandim, divê tu min baş nas bikî.

– Ez bi serê gora kal û pîrên xwe sond dixwim, min tu ne dîti ye û ne jî naskiri ye. Min bes nav û dengê te bihîsti ye.

– Pir spas dikim ku te nav û dengê

min bihîstî ye.

Min di wê navberê de cixarek vexist û bi kişandina hilma cixarê re got; "Lê ez qet tu spasiyan ji te re nakim ey Diravê rûreş."

Wî jî got; "Ez gelek li te bi hêrsbûm. Çima tu ji min re dibêjî "Rûreş"? Dê min ê li vir tu yê bikuştû û parçe parçe bikira û goştê laşê te jî bida ber diranên rovî û çeqelan. Lê pir mixabe ku ez bi tena serê xwe me."

– Çima, tu bi tena serê xwe nikarî min bikujî?

Got; "Na, na... Piştbazî û hevparên min ne li derdora min in."

– Hevparên te kî ne?

– Sermaye ye.

– Tu dikarî wateya sermayeyê ji min re bibêjî?

– Sermaye, ji diravên wekî min pêk-hati ye. Em şîrikê hevûdu ne, eger yek ji me ji teqetê bikeve û nema bikaribe karê xwe yê mêtinî û kedxwariyê li ser û bin axê bidomîne, xwîna rayên cane mirovan bimijîne, hema em radibin û bi yek armanceke herî bingeîn xwe digêhêjnîn hevûdu û bi hev re – yekenyê – ava dikin. Navê me yê li ser rûyê dinyayê – YSNN – ye.

– Wateya wê çi ye?

– Yekîtiya sermaye ya navnetewan e.

– Tu li ku derê dihewî û li ku derê jiyana xwe berdewam dikî?

Wî serê xwe çep û rast zivirand, li jêr û jor temaşe kir û got; "Li her derê."

– Gelo qesta te ji her derê çî ye?
 – Ez carnan jiyaneke xweş û geş li mirovan dibexşînim û di hîqehîqa kenê rûyê wan de stêrkên asîmanê diçirîsînim û li nav xewn û xeyalan dilşad dikim. Lê carnan jî şewqa çira odeya malbatan vedimirînim, rondikan ji çavên dayikan dibarînim, porê serê wan dirûçkînim, dil û kezebê li wan dipertilînim, dayik û bavan ji hevûdu vediqedînim, kor û felc dikim û jiyane li wan diherimînim. Azadiya mirovan bi zorê, bi tade û lêdanan ji destê wan digirim, bi salan dikim zîndan, qeyd û bendê li lingên wan dixim û di ber êşkenceyan re derbas dikim û dikujim.

– Eger mirov an jî welatek azad bibe û di xweşî, rihetî û aramiyê de bimîne û bijî, ma kêfa te jê re naye, ma dilê te pê şa nabe?

Got; ”Na, na...”

– Çima tu dîsa dibêjî na.. na..?

– Ez xêrnexwaz im, bes berjewendiyên xwe diparêzim.

– Ma ew xêrnexwazî, tu ji kê fêr bûyî?

– Ji mirovên çavsor û zikreş fêr bûm.

Min got; ”Tu ji bo dergûş, zarok, xort û ciwanan çî difikirî?”

– Ez dergûşên ku hê ji dayika xwe nebûne, ligel dayikan di malzaroka wan de difetisînim. Keç, bûk, jin û xortên ciwan li ber kendal û dîwaran tazî, birçî û sêwî dihêlim û pişt re laşê

wan pêşkêşî firotna xirabiyê dikim.

– Tu ji polîtîkayê fam dikî?

Mirûzê xwe tîrş kir û got; ”Ma tu çî pirsên wisa tamsarkî dipirsî?”

– Ango bi pirsgirêkên mirovan û welatan jî mijûl dibî?

– Ew her tim karê min e.

– Tu karê xwe çawa bi rê ve dibî?

– Ez karê xwe di rêya dek û dolaban de dimeşînim.

– Tu dikarî wateya vê piçekê şirovekî?

– Ez hinek kesan dikim serok û serokwezîr. Wan mîna axa û began li ser textê koşk û qonaxan bi xwedî dikim. Hinek kesan jî dikim parsek û li kolanên bêxwedî di perîşaniyê de derbeder digerin. Saziyên dadgehan, qanûnên mirinê, girtûgeh û êşkencexaneyan ava dikim. Di van sazî û dezgehên de mirovên zilimkar, mêrkuj û Celadan bikartînim. Bi destê Celadan giyanê mirovên bêtawan, bêguneh jê dikişînim û bi zor û kotekê êrîş dibim ser gelên azadîxwaz.

– Karê te yê di navbera dewletan de çawa ye?

– Karê min fesadî, fitnekarî û xêrnexwazî ye.

– Armanca te ji fesadî û fitnekarî çî ye?

– Dema ku ez bikevim tengasiyê û qels bibim, ji taqetê bikevim, hema radibim ser xwe û bi hêzekî zikreş dikevim navbera dewletan, berdidim

hev, şer û fesadiyê derdixim. Di devê tîfingan de dibim gulle û di mêjiyê mirovahiyê de diçim xwarê. Di kezêba wan de kul û birînan vedikim, di eşq û hezkirina dilê wan de şûrê serdemên hovane dadiçikînim û giyanê bextewariya şev û rojên wan talan û wêrane dikim. Dibim bombe û li ser gund û bajaran agirê jehrê dibarînim û ji holê radikim. Bi sedan salan xwîna gelên xizan û belengaz dimijim û pêşkêşî kedxwaran dikim.

– Tu ewqas malê dinyayê dixwî û xwîna mirovan dimijî, ma tu qet têr nabî?

Got; ”Ji mirovên ku çavbirçî û çileyê dikin bipirse!”

– Navbera te û rewşenbîran çawa ye?

– Qet kêfa min ji wan re naye.

– Çima kêfa te ji wan re naye?

– Çi dek û dolab, derew, dizî, xapandin, nakokî, fêlbazî û xêrnexwaziyên min hebin, hema rewşenbîr radibin tiştên min yê veşartî derdixin holê û aşkere dikin. Min rexne û suçdar dikin û di derbarê hemû xirabiyên min de, ji gelên cîhanê re daxuyaniyan didin. Qedr û qîmet û rûmeta min li ber çavên xelk û alemê rezil û kepaze dikin.

– Ma ev kar ji bo rewşenbîran ne vatiniyeke herî pîroz e?

– Lê vatiniyeke li dijî berjewendiyên min e.

– Gelo tu belayek çawa tênî serê ronakbîran?

– Di çarenûsa wan de dilopên xwîna diniquatînim ser sînga pêşeroja jiyana wan. Nivisandin û çapkirina pirtûk, kovar û rojnameyan û zimanê wan qedexê dikim. Çapxaneyan jî hildiweşînim û di xezêba xwe de dişewitînim. Nivîskarên wan jî dîl digrim û di zîndanên de guhên wan lê ker dikim, çavên wan lê kor dikim û heta ku mêjî û raman li wan reş û rêş bibe di ber êşkenceya feleqeyê re derbas dikim.

Li ser piyan çokên min qerîmî bûn, westiya bûm. Min piştî xwe dîsa spart dara piştîxûz û rûniştim û min ji wî pirseke din kir û got; ”Navbera te û xwedê çawa ye?”

Bi awirên matmayî li derûdora xwe û li min nêrî û got; ”Ka ji min re bêje lo, ew kî ye?”

Min got; Yê ku roj, av, hewa, mirovahî, cîhan, stêrk, asîman û gerdûn afirandî ye... Yê ku jiyana hemû mehlûqetan û sîstema rojê bi rê ve dibe... Yê ku bi hezaran sal in, mirovahî li ber wî digere û ji wî re duayan dike û li wî diperêsin... Yê ku dogeh û bihuşt avakirî ye... Yê ku li her derê hazir û nazir e... Ango yê ku xwediyê her tiştî ye...

Wekî ku qerfên xwe bi min bike, kire hîqehîq û kenîya û got; ”Ey mirovê ehmeq û bêmeji, tu li nav xeyala xewnan dijî û rastiya jiyane nabînî.” Bi zimanekî tûj berdewam kir û dîsa

got; "Yê ku carnan ji derd û kulan re derman dibîne û dilê mirovan kêfxweş dike ez im. Carnan jî di bedena mirovan de yê ku nexweşiyê pêda dike û heta mirinê di keser û nalînan de dihêle ez im. Yê ku aboriya jiyana mirovan û Cîhanê bi rê ve dibe ez im. Yê ku xwedî xweşî û nexweşiyê ez im. Yê ku xwedî çêyî(qencî) û xirabiyê ez im. Yê ku mîna gerokan li her derê digere û bi saya kilîda pereyên destê xwe deriyê bihuştê û dojhê vedike û şun de digire ez im. Ferîşte û Ehrîman ez im. Li ser cîhana mirovan her tişt girêdayî min e. Mirovahî nikare bêyî min jiyana xwe bimeşîne. Ango xwedayê hemû mehlûqatên vê cîhanê ez im.

– Ey Dirav, heta kengî tu yê karê xwe li ser vê cîhanê wisa bi çavnebarî û hesûdiyê bimeşînî?

– Heta ku pirsgirêka berjewendiyê

xopan di navbera mirov û dewletan de ji holê ranebe... Heta ku aştiyeke rast û dirust ava nebe... Heta ku şerê qirêj bidawî nebe... Heta ku li ser axa cîhanê yek al û yek tixûb pêk nebe...

Piştî demeke dûr û dirêj min hîskir ku bêhna wî ji ber pirsên min lê teng dibê û got; "Êdî bes e min ji nav lepê xwe berde, heta ku min teşqaleyek ne anîye serê te." Ez ketibûm nav tariya tirs û gumanan û paşê min ew serbest berda û bi bayê hênîk re bejna xwe hejand û destê xwe jî dirêjî min kir û bi gefwarî got; "Bi hêviya ku em rojekê qet pêrgî hevdû nebin, bimîne li nav toz û bahoza pêşeroja ne diyar de." û xatirê xwe ji min xwest û di êşa awirên min yên hesretkêş de, li ber çavên min winda bû.

2008.08.28

Stockholm

Şeva şayiya Komela Încovê

(Yeniceoba Kültür ve Dayanışma Derneği-Yeniceoba Cenaze Fonu)

Di 15.01.2010an de Komela Încovê şevêka şayiyê li dar dixê.

Ji axêferên mêvanên şevê: Serokê belediya Yeniceobayê **Îlyas Kara**

û serokê belediya Ishøjê **Ole Bjørstorp** heye.

Programa şevê:

MUZİK: Şivan Perwer

Nûrettîn Çiçek

Hîkmet Çoban

Murat Küçükavcı

Cîhê şevê/Adres:

Başak Saray

Bädenhavnsgade 57

2450 Kopenhagen/Danmark

Paça pêşîn

Nuh Ateş

"Meke!" Elê bi denegekî nizm û tirs lê bar got. Bi gotinê ra berember wê bi lêz bi pîyê xwe kuta Miço û ew hendik ji xwe bi dûr xist û dû ra bazda çû nav hevalan. Serê peyîzê û şev li ber nivê şevê keç û xortên gundê Z. yên nûgihêştî tevhev li taxa jêrî li derva li ber şewqa hîv û hêstêrkan bi veşêrkirinî dilêyîstin. Bêyî ku wan hay ji hevdu hebûn, Elê û Miço li kuncêkî diwarê xanîyekî xerebe û goma pêz li teniştê hev xwe veşartibûn. Her yekî ji wan di rêyekê din ra di pêy bez û bazdanekê xwe avêtibû vî kuncikî. Piştê xwe dabûn diwarê xerebe û berê wan berve hîv û hêstêrkên li asîman bû. Dema ku sing berê wan ji ber bez û bazdanan bi lez heldihat û dêdihat pozê milê wan bi hev dibûn. Bi deng û germîya hilma hevdu dihêsiyan. Ji teqa gomê pêz da dengê xîrexîra kayîna pêz û rîngnîya zengilên stûyên wî her carekê bi awayekî din belav dibû û hevaltîya bêdengîya şevê dikir. Di bîra Miço da tenê gotinên hevalê wî yê şivantîya berxan digerîyan. Wî gotibû ku dilê

Elê li wî ye. Şeveşîyê cesaret dabû wî. Ji niçkava çû rûyê Elê û bi lez binguhê wê paç kir. Alafek li nav rih û canê wî belav bû. Bîstekê bi tîn û tama vê paça pêşî şad û mest bû. Şa bû ku ew jî êdî xwedîyê paça pêşîyê ye û yê bikanê xwe pê di nav hemsalên xwe da bipesine. Di vê gavê da şîret û azarên dê û bavên yên ku wî di temenê xwe yê çardeh salî da bêhesab li ser arparezî, destdirêjî, gunekarî û heremkarîyê bihîstibûn qet nehatin bîra wî. Pêçekê şûn da bi gotin û kutana Elê ew hêşarê xwe bû û di derheqa gotinên hevalê xwe yên derheqa hezkirina Elê ji wî kete gumanê û dudilî bû. "Ma wî yarênî bi min kir yan bi min kenîya!?" Wî di ber xwe da got.

Miço devê xwe negirt, ji çend hevalên xwe ra qala paça xwe kir. Xebera paça wî belav bû û li gûhê birayekî Elê ket. Wî Elê da ber kut û pînan. Elê suc avête ser Miço. Malbata Elê halûmesele bihîst û pê bi ber xwe ket. Ku li ya bavê Elê, Hemê Mozê bima, ew ê ji malbata Miço ra derketa pêş malê û jê ra yên

nemayî bikira û hing û şerê derxista. Bi fikra wî eger meriv derbekê li malbata Heyderê Alê, bavê Miço nexê, dolle wî şûnê xwe nizane û yê sibê destdirêjyên din bike. Jina wî, Fatbiaqilê pêşî li wî girt. Wê nedixwazt ku mesele li nav gund zêde belav bibe. Wê layiqî xwe ne dîdît ku sewa paça cahilekî hing û şer derkevin û bi vê rê malbata wê bibe mihetabê malbata Heyderê Alê. "Ku te wer kir tu yê kerra jî bi gûh bikî û me têkî qawa malbateke ku di jêr me ra ye û me li nav xelkê piçûk bikî" wê ji mêrê xwe ra got. Fatbiaqilê pê dizanî ku hevdu paçkirina keç û xortên cahîl ne tişteki nû û sêyr e. Dihate bîrê, mêrê wê jî hîn ku ew ne bidergîstî bûn, ew paç kiribû. Lê niha cahilekî ji malbateke ne beremberî malbata xwe keçika wê paç kiribû, ew pirtir bi vê diêşîya. Wê difikirî ku meselê bi rêya dîplomasîya bidizî û tirsandinê hal bike. Bi şewr û şîretan wê ferdên malbata xwe anîn ser rêya xwe. Li ser vê malbata Hemê Mozê şandeyek bi dizikî şand ba Heyderê Alê. Şande va peyama Hemê Mozê gîhande Heyderê Alê: "Ezê xaniyê te bi ser te da helweşînim! Çir dikî bike, ew lawê te yê destdirêj qet bi ber çavên min nekeve!"

Li Mala Heyderê Alê tê bigota şîneke bê girî heye. Ferdên malê giştik bi xwe da ketibûn mina ku gunekarîyek kiribin. Bav û birayê mezin li Miço xistin û ew xişûhal kirin. Birê bi panîya şimikekê li nava brûyên wi xist û xwîn

bi ser xist. Wana bi lome û lêdanan hundurê wî anîn xware. Miço serî di ber da ji neçariye sond xwar ku wî tişteki neçê nekiriye. Lê tu kes bi wî qanî nebû. "Te serê min kire ber min, êmegê min li te heram be, here ma çavên min te nebînin!" bavê got. Birayê mezin jî da ser got "ji avûrûyê nefspîsiya te da ka hîn çi bela tên serê me!" Miço piçûkê lawên malê bû û li ba dayika xwe, Sena Mihê delal bû. Wexta ku wê jê hez dikir, tim digot "ez di dorê bi dê û bavên xwe va!" Lê niha ew bêdeng bû û carna wexta ku mêr û lawê wê yê mezin li Miço dixistin dilê wê pê dişewitî û xwe diavête ber wan. Tenê dapîra Miço ya heştê salî bi ser newiyê xwe da hat. "Dêste delalî min medin, çir kiriye, ma cahîl qet di serê we ra derbas nebû!" wê ji kuncê odeyê da got. Lê kesî guh neda ser şorên wê. Malbata Heyderê Alê ditirsî û dizanî ku ew di hing û şeran da bi malbata Hemê Mozê nikanin. Loma wan şore xwe kirin yek ku gava ew raste ferdên malbata Hemê Mozê hatin rê û rûyê xwe biguhêrin û Miço jî demekê bi dizî bişînin Anqereyê, ba xalê dayka Miço, Mestê Simo. Miço ji gundê xwe yê ku li nava Anatolîyayê li rojavayê gola xwê diket bar kir û çû Anqereyê.

"Va sirgunê paçê ye!" Mestê Simo bi zimanê tirkî Miço weng bi jinên kerxanê da naskirin û qala serpehatîya wî kir. Ji ber ken û vîqevîqa jinan û leq û lokên bedenên wan yên nîvtazî Miço

fedî kir û serî kire ber xwe û di şûna xwe da bêdeng û nelivî ma. Jinekê destê xwe di nav porê wî ra bir û anî û pê şa bû û bi çavnêrineke bazirganîyê lê mêz kir û got "çi lawikek rind e, xwedêkî cakê li vî porê gijik, çavên reşik û pozê berankî mêzkin!" Yeke din jî berbi Miço çû got "fedî meke şîrînê min, paçkirin ne tişteki xerab e, te baş kiriye". Mestê Simo da ser got "paçkirin li vira ne heram e, serbest e. Bi jinan ra raketin jî serbest e û bihayê xwe jî sivik e!" Ew zûva bû ku li Anqereyê dijînî. Merivekî bejndirej, qolinc pan û bi heybet bû. Wî dergevanîya kerxaneyê bajêr dikir, odeyên jinên kerxaneyê pak dikir û xwarin û vexwarînen wan dikirî. Wi bi ken û qîrf ji jinan ra qala durûtiya merivan ya li ser nemûsparêzîye kir. Bi ya wî ew mêrên ku Miço sirgun kirine, wexta ku tèn Anqereyê yên zewicî jî tevê berê berê xwe didin kerxaneyê û li vir vedisên û xwe nerm dikin û jinên wan jî pê vê dizanin, lê dengê xwe nakin. Bi gotina wî cihê bajarê Anqereyê yê ku pirtir mêr lê kom dibin qehwexane û kerxane ye. "A xwedê ku kerxane heye, lê ku tune bûya mêran ê çi bikirina!" wî got. Navê "sirgunê paçê" li ser Miço ma û jinên kêrxanê bi vî navî bange wî dikirin. Ew di serî da bi vê navlêkirinê xûlî dibû. Mestê Simo bi ber dil da çû got "xwe pê mêşîne kuro, Jinê kerxaneyê jî sirgunê nemûsê ne û ez jî sirgunê xizanîyê me û ji ber wê min kur û kulfet li gund bi

tenê hîştin!" Miço gavekê berdestîtiya Xalê xwe kir. Pêda pêda fedîya wî ji ser çû, wî jî êdin bi jinan ra yarenî dikirin û bi çendekan ra bû yek. Mala Mestê li teniştê xaniyên kerxane wû. Kerxane ji nava bajar ne dûr li kaşeyê çiyakî bû. Navê wî bi tirkî "çiyayê zêrinî" bû. Lê li derdawên vî çiyayî ne bazara zêran ya canfiroşîyê dihate kirin. Derdora vî çiyayî ji xanî û avahiyên bi şev hatibûn danan tijî bû. Jar û xizanên ku ji gundan barkiribûn Anqereyê ew bi şev û ji neçarîyê bê destur danabûn û tê da rûdiniştin. Hen ji wana weng xuya dikirin te digot qey ew ê bi zinarên çiyê da nûskandine. Mestê Simo jî di şevdanayîkê da bi kirê rûdinişt. Odeyek û niv bû. Bi şev wexta ku xal û xwarzi li ser nivînan xwe dirêj dikirin, Mestê destpê şîretan û heşberxistinê dikir. Li gorê dîtina wî şîret û heşberxistinên berî raketine di serîye merivan da diman. Wî dixwest ku Miço karekî din bike û desthunerîyekê bihêvîse. Bi wî ne bi xwaşî bû ku Miço mîna wî li kerxanê kar bike. Sewa vê ji Miço ra serpehatiyên jinên kerxanê û şerên li ser kar û qezenca wan kat dikirin. "pirê wan ji ber zilma bav û bira û mêrên xwe revîyana û ketine vê rê û ji neçarîyê canê xwe difroşin. Ew ê bi canfiroşîyê debara xwe dikine. Xwedê ji wan razî be, ez jî ji wan bi gihanim" wî ji Miço ra qal kir. Bi heldana wî pir kesên din jî ji kêskî jinên kerxaneyê bigihan bûn. Wî ew wekî xeracxur binav kirin û da

ser got "ew li ser jinan û qezenca wan şerê hev dikin û carna ji bo vê meriv tèn kujtin". Lewma wî Miço da ba nasekî xwe yê ku xwediyê tamixaneyekê bû. Miço li ba wî desthunerîya lêhîmkariye hû kir.

Ew li ser hev heyşt salan li Anqereyê ma. Di nava van salan da careke tenê şevêkê bi dizikî çû serdana mala bavê û di eynê şevê da şûn da vegeyîya. Ew sewa xatirê dapîra xwe çû gund. Xeber hatibû ku ew ê li ber mirinîyê ye. Ew ji malbata xwe sar bûbû lê dîsa jî birîya wan û pirtir jî ya dapîra xwe dikir. Wexta ku êvarê ji kar dihat û dest û serçavên xwe yên ku ji ber toz û dumanê temîrxaneyê reş bûyî dişûştin û di nêynukê da li xwe mêz dikir şopa birîna navbera brûyan ya kewandî jê va xuya dikir. Hîngê dîmenên serpêhatîyên paça wî ya pêşî di ber çavên wî ra rêz dibûn. Ew pê geh kelegîrî geh jî bi hêrs dibû. Mirûztahl û awir xembar dibû. Miço di bîst û du salîya xwe da bi keçîka xaltîya xwe ra li gor toreyên hîngê yên li rewacê zewicî. Ji tîrsa hêriş û xerawgotinên malbata Hemê mozê dohl li Anqereyê lêxistin. Ew têgihêştibû ku pîvana rûmetdayîne û rewadîtinê biheyîbûnî ye û qîymeta merivan veqasî mal û milkê wan e. Sewa ku bibe xwediyê qezenceke têt û pereyên pir xwaztek û xîretkêşîyeke pir bihêz li wî pêya bû. Lê dizanîbû ku tenê bi qezenca xwêya henîyê û karê lêhîmkirinê ew nagihê vê armancê. Dîsa jî nedixwazt ku ji xeyala

dewlemendbûnê fereket bike, ew bi wî xwaş dihat û quwet dida wî. Ji bo xatirê vê xeyalê wî sala 1968 an xwe li banga karkirxwaztina Almaniyayê girt û dev da rêya xerîbîyê. Pêdîvîya Almaniyayê bi karkirên xerîb hebû. Miço banga Almaniyayê wekî dengê xelasbûna ji xizanîyê û fersenda dewlemdbûnê dihesiband. Bi deh û hedhezaran merivên din jî mîna Miço ji gund û bajarên Anatolîya û Kurdistanê bi ber bayê vî bangî yê ku ji dûr da xwaş dihat ketin. Di paşlê da omdîya qezenceke bi xêr û ber wan warên bav û kalan ji paş xwe va cihîştin û dan rêya welatên Ewropayê.

Sala ku Miço çû Almaniyayê li wê derê serheldana 68 an destpêkir. Xort û xwendevanan bi vî serheldanalidiji qeyd û bendên kevneperestîyê û bi taybetî tabûyên li ser jîyana seksî derketin. Ji ber vê, va serheldana wekî "şoreşa seksê" jî dihat binavkirin. Serheldana 68 bandora tabûyên li ser seks û hezkirinê yên ku serê Miço jî xwaribûn şikand. Xwe tazîkirin û li qehwexane û seyrangehan hevdu aşkere paçkirina keç û xotan ji alîyekî da bi Miço ecêb dihat. Lê ew di dilê xwe da pê şa dibû û wî van rûdanan wekî tolhildana xwe mitale dikirin. Gava ku ew di tren û otobusan da raste keç û xortên ku hevdu paç dikirin dihat, serpêhatîya paça xwe ya pêşî diket birîyê û wî lanet li bend û tabûyan dikir. Ew ji dûr va da û bi dîzî bû alîgirê "şoreşa seksê".

Ne ziman dizanî ne jî wexte wî hebû ku teve kar û hewldanên vê şoreşê bibe. Mêla wî tim û tim li ser kar û qezencê bû, wekî tê gotin şev bi ro dişuxilî. Bi salan di kargehên curbicur û pirtir li ba Telefunken û Opel şixulî. Xeyala wî ya dewlemendbûnê û xwazteka vegeerîna welat neçû sêrî. Wî jina xwe jî anî ba xwe û ew li Almanyayê man. Zar û zêçên wan li Almanyayê hatin dinyê û mezin bûn. Salan da dû salan û demek hat firmeya ku Miço têda kar dikir hate girtin. Ji ber ku salê Miço li ber şêstî bûn, ew derxistin tekewûtê. Wî êdin wexta xwe pir caran li qehwexanê bi nas û hemsalîyên xwe va derbas dikir.

Di ser paça Miço ya pêşî ra nêzikî çel sal derbas bû. Ji hingê vir da malbata Hemê Mozê bi malbata Miço, mala Heyderê Alê ra deng nekir û lê sûvahatî ma. Di vî çel salî da Miço ne raste Elê ne jî raste kesekî ji malbata wê hat. Elê

di şanzdeh salîya xwe da bi pismamê xwe va zewicîbû. Berê mêrê wê û di pêy va Elê bi zar û zêçên xwe va hatibûn Awisturyayê. Rokê Miço li qehwexanê raste mêrê Elê hat. Ew hatibû serdana nasekî xwe yê ku li bajarê Miço dima. Li qehwexanê hevalekî Miço ew bi wî nimand. Miço ji şûna xwe rabû û berbi çû û silav dayê, lê wî silava Miço lêvenegerand û destê Miço li hewa cihîşt. Miço bi ber xwe ket û poşman bû û vegeerî hat şûna xwe. Mêrê Elê bi nasê xwe va cîlê qehwexane terk kirin. "Xwe pê mêşîne tişt nabe, hen kes hîn di dewrana cahîliyê da ma ne!" hevalê Miço got û bi destê xwe milê Miço mist da û xwazt ku wî avênî bike. Di pêy kişandina keserek kûr ra Miço bi dengêkî sivik got "here lo here, va çi hîkmet e, toreyên weng di herdê reş kevin, qet meriv sewa paçkirineke cahîlane çel salî li hev sûvahatî dimê!?"

AGAHDARYEKE GIRÎNG

Em dixwazin di her hejmareke xwe de, ji cil û bergên kurmancên Anatoliya Navîn wêneyekî kevn di *Bîrnebûnê* de biweşînin. Bi vî awayî em ê him bi tevgirêdana kurmancên Anatoliya Navîn bizanin, him jî em ê hay jê hebin ku kincên wan ên berê bi çi awayî ne.

Ji ber vê yekê, bi rîca û bi kêfxweşî em bi hemû kurdên Anatoliya Navîn didin zanîn ku: wêneyên kesên ji malbatên we (jin-mêr), bi kinc û tevgirêdanên kurmanciyê li ba we hebin, ji kerema xwe ji me re kopiyekê bi rê bikin. Bi vê yekê em ê bi dewlemendiya tevgirêdana xwe bizanin û em ê wan kesan careke din bi bîr bînin.

Redaksiyon

Hevpeyvînek bi Mehmed Dogan re

Brang Şêxbizinî

Delal Memed Doğan ejneftimke hatiye we Heymane. Xêr hatê Xêr le rut. Erê nêzîkî sê mange demsal i sur û kîrwetîgel ru mal nerînandîn. Dê we dê dîyar dîyar diyerdayn. Mangi rûjige hat ke îme jî tikey ferihî rîn. Ra îgavejî hatim we Heymane mênîdiyi sê mang re banim woyjim hatim ve germawê Heymane.

Delal Memed egerge tûjî dixwaze ra Bîrnebûn roportaj wikerîn.

– Erê Bra Egerge ra Bîrnebûne we şawîn da wikirim.

– *Kek Memed tû Bîrnebûnê dizanê?*

– Erê dizanimê firsend ge rînim dixunimê. Qali çand û muzîkû folklori Kûrde Anatolîa nawîn dikirî.

– Erê. Vitîn î care hunermendî sêxbizinî mewan wikirîn. Dizanînke Memed Doğan hunermendî delal e.

– Spas heval.

– *Memed Doğan raman qali xût nêkirê Memed Doğan kî ye? Je kû we? Çi kari dikirî? Ke dixwazê tû winasîn.*


– Min Memed Doğan; Je nawçê Heymane dê yê Kaltaxlî'm. Je eşîretê şexbizinî yim. Le 1969 ye le dêye hatim ve dinya le



dêye gewro wîm. Zewcay im. Bovik i çar zarû wim. Îgave le şêre (Engûrî) dinuşim.

– *Baş e. Memed Doğan çun wîye ve hunermend. Çun nawdaro wîye. Çe Memed Doğan kirde Memed Doğan?*

– Erê Memed Doğan çun wîye Memed Doğan. Yan Memed Doğan çun wîye Îbrahîm Tatlisêsê Heymane. Vercê zoni kirmance qedexê wî. Televîzyon îşnevî herkes re yeg bî xewerî. Redyongel hewî ew jî kirmancî nerivit. Gewretirgeliman bantgeli Kurd Remzî temîn dikirdin. Belkî zonê fem nerikirdîn lakîn hewaze keyday firê xwaşî. Cayjî le dêgeliman dengbêjgel hewî. Le surgel gûranî riwitin. Ewangele fire hez



dikirdim. Dengim xweşî min jî gordiyan divitim. Wî ge gewrow îm. Nezîkî salê 1988 /1989 en dî le her surî min diderkefîm. Surî ge min le newîm tamê îşnewî... Wêm divitin Haymanali İbrahim Tatlises. Min le 1988 e bantî we tirkî le 1989 e jî yegî we şêxbizîni ve heweskarî derxistim. Endî Memed Doğan wîwî we Memed Doğan. Min û Şevket Kağıtçı nû bant derxistiyîn. We zoni şêxbizîniyo je dinya nû bant derkeftiwî. Demi kî rokire gûranîyel îme. Erê valla min jî ejneftimêt. Guhdarit dikirdim. Hele Gûranîyete ge riwî ege xwesîyê pîse kefenîyan terîse... ege xwesîyê baş e kefenîyan kûmaş e; yekîjî ege riwîte nawçê nîmrû dîyar e sûziyam le veri xwar e... î gûranîgelit je zoniman neriderkeft.

– *Memed Doğan Gûranîgelit çun elawîrde çun gûrdê kirde.*

– Min bante yekemîn gûranîyelê je dêyeli girdiman gûrdekirdim. Henîfe je

Kûlû Dîpdede, wênewitim je Sindiran elgirtim. Wîjdansize vû çêwsîyem je Sînop Boyabat je Sîyamî Yaman elgirtim. Le sale 1993 Ahmed Demîr nasîm. Ewî beste nîwisan dikirî. Min û ewî ge yektinî nasîn we duyaw banteliman gordiyeg derxistîn. Gordi yek Bo kekom, Wigîrin ra Kûddûsî, Tû Gûlcanê, Nezanistim, Le 2009 e jî Albumê NÎWÎR derxistîn. Tam dêwşêş sale ge gordi yekîn wîyîn we birangi yek. Erê...

– *Ahmet Demîr kî ye?*

– Ahmed Demîr je Nawçê Heymane dêyê Sazağasi ye. Bestekar e. Bantgelim gîşt bestegeki ewîyo derxistim.

– *Tû xûr qe bestet heste yan îşnîye?*

– Na min qe bestem îşnîye. Xwûda her yegî hunerî raye wê hunerê min jî dengime.

– *Kek Memed tû kî guhdarit dikirî?*

– Min le nawçê Heymane le cîwar i Konya wû nawçê Kûlû, Cihanbeyli, le Polatli guhdarim dikirin. Dê ge neçiyime wê neçiyim we sur îşnîye. Le demsali surgel rûjew diçim ve surî. Rûj û şew heste ke diçim ve dû sur sê sur. Je nuyaw gûranîy dilo yan jî ê şiwîn dixunim. Je ewe duyaw ê govende. Cayge ser dixîn we govende le şuni dêgel heta nîmê şewe nêvîstîn govend dikîşîn.

– Bantgeli tû hewazê çune... ê diloke, ê şiwînîye yan govendî ye? Gûranîgeli min her çeşit je heste. Him dilokî ye him şiwînîye, him govendîye. Le govengel kan gûranî dixune ê firê kan gûranî jet dixwazin. Le Govendi sêpa Zebo, Bostanê, Ax min mirdim min mindim, Hesigo dixwazin.

– Spas dikim Memed Doğan.

Roportajeman xilas wî. Tû kiset heste
ra îme ra Bîrnebûn û ra guhdargelit. Min
jî je tû je Bîrnebûn je malbati Bîrnebûn
spas dikim. Je guhdargelim spas dikim. Yek
jî sipas Bîrnebûn dikirimke îme jî vîro ne-
kiriye vû şun daye we îme. Rojbaş Rojbaş.

ÇÊWSIYE

Çevsîyem fire rinde çevsîyem
Qere xever erdande çevsîyem
Vitin min danwe juye çevsîyem
Hawar emirim birde çevsîyem

Çevsîyem raçe kirde çevsîyem
Hawar emirim birde çevsîyem

Çevsîyem çewesîyem çevsîyem
Kirdiyê mî diwi dîye çevsîyem
Qaymin derdim frîye çevsîye
Derdem wîşim rakîye

Çevsîyem raçe kirde çevsîyem
Hawar emirim birde çevsîyem

Jörmaletan kuye kûçike çewesîyem
Hawar ay mirdiyim dîşin sale bîcike
çevsîyem

Çevsîyem çundikerê çewesîye
Emir le boşe diverê çevsîye
Qedireman je yek nîye çevsîye
Raçe niwirim dikerê çevsîye

Çevsîyem raçe kirde çevsîyem
Hawar emirim birde çevsîyem

Kise vû muzîk: Sîyamî Yaman

HESÎGO

Hespê Hesigo xûylî ye
Hefsar de serê nîye
Kesî zeftê nekirî
Hesigom dale zemî ye
Hesigo heyrani tû wim
Hesigo qûrbani tû wim
Pa hespet we çaqil e
Serit boş bî aqil e
Je çîlsalî we duyaw
Hesigo man we dil e
Hesigo heyrani tû wim
Hesigo qûrbani tû wim
Şew hespet tîmar kirde
Yemê verê bol kirde
Çiyê ge dut viwaynê
Debançat je wîr kirdê
Hesigo heyrani tû wim
Hesigo qûrbani tû wim
Xwardê çayê demlî ye
Çaye dale zemî ye
Ra hesigo çay newû
Warin şûşay rekîye
Hesigo heyrani tû wim
Hesigo qûrbani tû wim

Kise: Hikmet Özkan

Muzîk: galerî (dûpa)

RÎNDÊ RÎNDÊ

Pirce dirîj yan dikeftî
Çalim meke lêt nêkeftî
Emirim ratû herima
Ariyî ve malet keftî

Rindê rindê salem çil e
Çil salem gî derd û gûl e
Gedirê min zaten sî ye
Xweşî kirdem re mezel e

Resmet derxistim yîristim
Tû re naw dilim derxistim
Bî tû jîyan le min heram
Je xwûda mirdinî xwastim

Rindê rindê salem çil e
Çil salem gî derd û gûl e
Gedirê min zaten sî ye
Xweşî kirdem re mezel e

Malet ale peri çem e
Dimîne gûli badem e
Set sal viçû tû vîr nêkim
Bo mekefe re gûnam e

Rindê rindê salem çil e
Çil salem gî derd û gûl e
Gedirê min zaten sî ye
Xweşî kirdem re mezel e

Çêwe sê ebrû qelem e
Veranver dinyawmale me
Min rind em je vîr nekirim
Are xewû xeyale me

Rindê rindê salem çil e
Çil salem gî derd û gûl e
Gedirê min zaten sî ye
Xweşî kirdem re mezel e

Kise vû muzîk: Brang Şexbizinî



Hunermend Mehmed Dogan.

Gešta Kurdistanê

Xayyam Rizgar Celikanî

Di encama rêwîtîyek dijwar de em gihîştin Celikana xopan. Mala minê! Navçeyek biçûk û wêranmayî derket hemberê me. Di navbera newalekê de maye. Xelkê niştecih karê reşandina tûtîn û xûdikirina mêşên hengiv dikin. Bi me ra gotin: Hengivê me gelek bi navûdeng e. Gotin: "geven balî" bi tirkî lê belê qay me got ev "geven" çî ye. Piştra min hizr kir ku di kurmacîya me de peyvek bi vî rengî heye "gûnî". Meger ne "geven" gûnî be. Nizanîm ji tirkî derbazî kurdî bûye yan ji kurdî derbazî tirkî bûye. Weke pîrî caran xûya dike ku ji kurdî derbazî tirkî bûye.

Gešta Kurdistanê I

Min bi xwe Kurdistan gelek hindik ji nêz ve nas kir. Hemû agahîyên min bi rîya xwendinê hatin civandin. Ez û derûdora min helbet kurd in. Em li nava Anatolîya Navîn dijîn. Me ji zû de koç kiriye. Bi nêzikahîya 150 salî ye ku me Kurdistan terikand û em li nava Anatolîya Navîna xopan li hêla gola xwe niştecih bûne.

Dîsa ji her çiqes em vê cîhê nû wek welatê xwe jî dibînin û dihejmêrin,

dilê min, rihê min, mêjîyê min û hestî û henavê min bi Kurdistanê re ne. Em Anatolîya Navîn jî adetkî wek Kurdistanê dihesibînin. Pir caran dema em behsa welêt dikin, bêbiryarî em xwe weke ku em li Kurdistanê ne dipejirînin. Her çiqes di rastîya xwe de em li derveyî Kurdistanê dimînin jî em perçeyek ji wî welatî ne. Hezkirina me, hesreta me, keser û kovanên me hê kurtir in, hê jî tîrtir in.

Me havîna rabirtî bi çend pismaman ve biryar da ku em geştekek biçûk li welatê navqedexê bikin.

Pismamê delal Sado ku rondika çavê min e, erebek nû kirîbû, tê birt û da bin me, em herçar qafadar lê siwar bûn û me dev da navçe Kuluşê û di wir re ajot Meqesê ber bi Şereflî Koçîsarê.

Me cara yekem li Aksarayê bêhna xwe veda û nanê xwe xwar. Gelekî kêfa me jêre hat. Cîhekî baş bû bi rastî.

Şoferê me şoferekî gelek baş bû. Kek Mendo neba me tucar nedikarî û nediwêrî derketina rê. Kek Mendo mirovek wêre, dilsoz û çilekêş e. Ez ji wî zehf hez dikim.

Çunkû berî her tiştî kek Mendo biraye min ê delal e.

Aksaray xaçerê ye. Ji wir rê vediqete ber bi Kayserîyê. Rê gelek xweşik hatine çêkirinê. Bi rastî em herçar qafadar mat man. Me tucaran wisa riyen xweşik nedîtîbûn. Hikûmeta Erdogan bi rastî bi çêkirina van riyen çêr û xizanîya deştên beyar yên Anatolîya Navîn gûhartine.

Kayserî bajarekî metropol e. Qasî ku me ji dûr ve temaşê kirî bajarekî zehf pêşketî ye. Navenda pîşesazîyê ye. Tu kemasîyên xwe ji bajarekî ewropayî nîn bû.

Ji Kayserîyê bigire heta Meletîyê valahîyeke mezin heye. Hema hema sêsed kîlometreyî ne bajar hene ne jî gund û însan hene. Bi rastî cîhnîgarîyeke zinarîn e ku ji latekî sor hatiye pê. Xûya ye ku Kurdistan ji Meletîyê dest pê dîke. Ev deşta zinarîn ku ji Meletîyê dest pê dîke û ser sêsed kîlometreyî didome, Kurdistanê ji Tirkîye vediqetîne.

Di nava wê deşta zinarîn de navçeyek derket pêş me. Gûrin navçeyek dora deh hezar kes lê dijî. Em li nava wê sekinîn. Me vêsîna xwe helna. Me çay vexwar. Me hinekî bi gelê navçê re axaft.

Di diroka eşîra Celikan de Gûrinê grîngîyek xwe heye. Bav û kalên me di çîrokên xwe yên nostaljik de hertim navê Gûrina xopan derdibirin. Lewma em li wir sekinîn. Me raman dikir ku ev navçeyekî kurd e. Dema me bi gel re xeber da me dît ku gel tirk in hem jî tirkên mormorî ne.

Dialoga me wiha bû:

– *Selam amca!*

– *Aleykim salem gardaş! Lem gardaş ni idersingiz burda?*

– *Amca biz gezmeye geldik.*

– *Alla alla ne işiniz olur ya?*

– *Amca biz aslen buraliyiz.*

– *Get işine be siz kurdlere benziyonuz burda kurd yok.*

– *Yok ya!*

– *Peki Yukari Bektaşlı'da da mi yok?*

– *Orda da kurd yok.*

– *Peki ya Aşagi Bektaşlı'da?*

– *Orda hiç yok!*

– *Ya Uzunyaylı'da.*

– *Aha! Şimdi anladım!*

– *Temam gardaş orda kurd çok.*

Em gelekî şah bûn dema me bihîst ku li Uzunyaylayê kurd hene. Kifş bû ku em li ser rêça rast in. Me fahm kir dema ku eşîreta Celikan ber bi Konyayê koç dikir zemanekî jî li Uzunyaylayê rawestane yan jî hinek ji wan li war mane.

Piştî bêhndanê me dîsa berê ereba xwe da Meletîyê.

Gava em nêzikê Meletîyê bûn pismamê delal hate zar û go: welle ez vira nas dikim. Ev der Beyler Deresi ye. Em gîşt şaş man û me pirsî: tu çawa nas dikî? Nuro go: min li wir leşkerîya xwe kir. Me gîştan kêf da ku pismamê me ê hêja Nuro ku ne tenê pismamê min bû hem vêre destbirayê min bû, wê me li Meletîyê bigerîne.

Me ew şeva xwe li wê derê bihurt. Li nava sûka Meletîyê em zehf gerîyan.

Lê mixabin destbira Nuro tenya Beyler Deresiyê, postxana Meletîyê tenê nas kir. Xûya ye ku Meletî jî mîna Kayseriyê zehf pêş de çûye. Her tişt hatiye guhartin. Meletî bi dar û berên xwe, bi bax û baxçên xwe, bi dehl û daristanên xwe, bi çiya û banîyên xwe, bi çem û robarên xwe bajarekî Kurdistanê bû ku min jê gelek hez kir.

Spêdeyê, piştî ku me di hotela xwe de taştîya xwe xwar, em ketin rê û me dev da rîya Celikan. Her çiqas min bîhîstî bû ku Celikan li gor sîyaseta asîmîlasyonê navê we guhartin û kirin "Çelîkhan" ez ne ewle bûm. Me tim di çîrokên mezinên me de dibîhîst ku em Ji Nurdagiya Entebê hatine lê xizm û merivên me gelek li Semsûrê jî hene. Em di nava gelî û newalekê re daketin ser navçeyê. Kifş e robarê ku di nava newalê re radibihûre, şaxek Feratê ye. Ferat ku her navê wê derbaz dibe û ev nava li guhe min dikeve gava ev peyv, ev kîte di rahên min de, di mêjîyê min re digîhîje navenda xebitandina agahîyên mêjîyê min, dile min disoje, hundirê min diçizire, kezeb û pişikên min dikewijin. Ew robar ku min di temenê xwe de carekê dîtîbû, wê ez carek din bibînim. Cara yekem ez li dora salên bîstan bûm, lê îro ez li dora çelî me. Lê ez hest dikim ku hesret zehf bûye, bêrî pir bûye, birîn kur bûye û dilîn tîr bûye.

Di encama rêwîtiyek dijwar de em gîhîştin Celikana xopan. Mala minê!

Navçeyek biçûk û wêranmayî derket hemberê me. Di navbera newaleke ku me behs kirî de maye. Xelkê niştecih karê reşandina tûtîn û xûdîkirina mêşên hengiv dikin. Bi me ra gotin: Hengivê me gelek bi navûdeng e. Gotin: "geven bali" bi tirkî lê belê qay me got ev "geven" çi ye. Piştra min hizir kir ku di kurmacîya me de peyvek bi vî rengî heye "gûnî". Meger ne "geven" gûnî bûye. Nizanim ji tirkî derbazî kurdî bûye yan ji kurdî derbazî tirkî bûye. Weke pir caran xûya dike ku ji kurdî derbazî tirkî bûye. Bi hizra min "geven, geviş, gevelemek" ji peyvên kurdî "kayîn" cûyîn, cutin"ê tên. Navenda Bajêr ji kolaneke bi tenê pek tê. Em tev de bi mezinên navçê li qehvexaneyekê rûniştin, me gilî û gazincên xwe ên bi sedsalan di hundirê katekê de bi hev kirin. Gelekî xwîna me kelî ser wan. Wan jî ji me zehf hez kirin. Xwe seba me kuştin. Gumana min ji holê rabû. Qinyata min pê hat ku em ji wan in û ew jî ji me ne. Kurdîya wan eynî kurdîya me bû. Hemû însanên qahwê li serê me civîyan. Gelekî ji dil de em pêşwazî kirin. Em bi tûtîn û hengiv xelat kirin. Em bi kêfxweşiyek mezin ji Celikanê ber bi Kolikê derketin rê...

Zurich, 6 Sermawez 2009

Beşê duduyan di hejmara bê de dom dike.

Fêz

Seyfi Dogan

Ji xwarzîyê xwe re kat kim. Xalê min wang dest bi sohbêtên xwe dikir.

Xwendin li eskerê êfsî bû. Lê pirî bimeraq bû. Ci didît dixwand. Ji teleban kitêb dendikirin û dixwandin. Gelekî zana bû. Mêlê xwe dida tişt. Katbejêkî jêhatî bû.

Ji şevîne bişunda, min pêz da fêzê, di bin tarlê malê Hacbekir re û bi hevale xwe re got; tu here rakevê, ezê miqête pêz bibim.

Havelê min cû, li perî bakur, xwe kire nav kulavî xwe û raket.

Min tebaxa xwe yê zîvînî ji berîya şalî xwe ji herîye reş hatî tevnkirin derxist û cixareke xwe pêça.

Xewa min nedihat. Lê dîsa jî min pizbên avite sûyê miya sewr û ketime nav kulavî xwe. Pezî wek derguşake têr, rehat bû. Ki pez têr bû, kerî yê kî ji pensesd pezî yê bi lapekî be. Bayê bakûr serin û serin pêl dibû. Hewayê sar bû. Min ji têrê, parcek goştê kavirê ku me ji şivanên Kozanliyê dizî, derxist û xwar.

Bi xelkî Kozanliyê ve navbarê me pir baş bû û hîng jî wang e. Ez, îro herim kîjan malê Kozanliyê yê min bi ser serî xwe din. Em jî yê ji wanan re wang in.

Lê me dîsa jî ji hevdû pez didizî. Gundî me hemî merîyên hevdi ne. Ya jî axzê dê ve an jî ji axzê bavê da. Lê

dîsa jî şivanan ji hevdû pez didizî û serî hevdû tişkênan.

Pez dizîn, ne ji dijmînatîyê bû. Îhtiyacak bû. Tuneyî bû. Pîranîyên şivanan desteng bûn. Dizîyê jîyana şivanan yeknesak, qelav dikir. Dizî dişlikek bû.

Tiştên ku şivan jê da behs bikin pir dibû. Dizîyê heycan dida û xeyalên şivanan fera dikir.

Ez ê Xwedê bêm, ci derewan bikim, derew hevalên şeytênin, me şivanan ji hevdû pez didizî. Pezî ku me didizî, yek caran me difurt, hîn caran me şivanan li wî cîh, laşê ji hevdû dertêxist û dikeland anjî dibiraşt ya jî me post dikir û bi şev ji mal re dibir.

Pîranîya şivanan desteng bûn. Tuneyî û xizani; kurasekî ji cermî şilê.

Herkî ziwa bû ê biguwişê û nefesê li insên teng bike. Tu bi dilê xwe yî, li caraserkirinê magere!

Wexta ku pezî axekî wenda dibû, şivanên ku dizî jê guman dikirin, dikşandine odê mixtêr û tenekê mist didan. Pîranî şivanên xeşîm dizî dikirin.

Şivanên bisal hêjayê xwe li ba xwedîyên pêz û xelke gelek bilind bû.

Ve çend sal in, ez î li wan çîyanan digêrime û şivanîyê dikime. Şopên

lingên min ê li ser herderê wê axên e. Tu derên ku çavên min li negerîne, tunene. Bawer bike xwarzi! Ez nikanim bibêjim ku ez î wan çîyanan baş nasdikime. Ruhî çîyan qolay û qolay nayê naskirin.

Zimanî demsalan, çîyayên baş dengdikin. Ruhî çîyayî, bi şev û roj ji hevdû cûda ye. Ruhî çîyan li gor demsalan, li gor hewayê, li gor sewqê, li gor danan û rojhelat û rojava tê guherandin.

Bi hevalî çîyan be ku tu tamê bibînî. Çîya te nedin dest. Ê meriyan bi şev û roj biparêzên. Ê merîyan têr bikin. Dişlikî merîya li çîyê bi tenê wera. Li bilûre xwe, dengî bilûrê ê vegere te u ji te re bi heval be. Çêşit û çêşit heywan û nebat heye.

Eynî çîya, ji her aliyekî da mina çîyakî din xuya dike. Li gor tarî û ronahiyê û li gor rewza ruhî kî insan têda ye, şekile çîya tê guherandin.

Ca çîyan, wextê ku berfê xemililand temaşake, çîya dibin wek bukekê.

Ca çîyan, dema ku ser wanan mij û duman girt bibîne. Çîya dibin wek gilokên sirrê.

Ca çîyan, wexte ku roj tere ava temaşake, bibîne, ka pelikên darên behîvan, çîng arrang reng didin û zinar dibin yek pêtî, berve ezmên pêl û pêl dişewitin.

Dema ku ba, di navbarê qaleştankê zinaran da bi çêşit û çêşit li friskiyê texê guh bi ser de.

Bi hezaran nebat û heywan hene. Ez hemîyan nasnekim. Heywanên henê bi rojê aktiv in, henek ji bi şev. Henek heywan demsalî ne. Tê n û terin. Di bin her kevirî û zinarekî de bi sedan zindiyê dijîn.

Biharê û payîzî, dema ku baranên payîzê dest pê dikir, me pez li çîyan dişêrand.

Havînan, axê çîyan hişik e, ya simên pêz biqelişîne. Loma me pez havîna nedibir çîyan. Hema hema, min her şev sîhên zinarên çîyayî Beşaxila ku li rojava mêsdikirin dûr û dirêj temaşê dikir. Li hîvronîyê sîyên zinarên çîyayî Beşaxilayê wek sîrrên bêdawî dedikevin ser singê çîyê.

Ez, zinarên çîyayî Beşaxila yek bi yek nasdikim. Bi roj li sîhên wanan runuştim, cixare pêcan, nan xwarin, xeyalan xewnên min xemilandin, girîm û kenîm.

Bi şev, li hîvronîyê ew zinaranan bi min xerip dihatin. Ne bajnên wanan ne jî sîhên wanan bi min nasdihatin. Dunê ke din bû. Dunê ka ku merî tê nîne derê.

Wexta ku min, ew zinaran temaşê dikirin Meraqakê ez digirtim. Xeyalên min diherikîn û difirîn. Wêlhasilî kêlam, sîhên zinaran bi min pir esraringîz û dilşewatî dihatin.

Dema ku min sîhên zinaran temaşê dikirin hecanê kê xwe li min dipeça û ez ji xwe derbas dibûm.

Serîyê xwarzî nêşînim.

Pezî xwaş û xwaş bi aheng dikayê.
Herîyê pêzê mina ziv dibirikê.

Biharê û hîvronî ye
Dilê min mal dixwest.

Şev, demsal û sal li bin hivê, bi tene
derbas bûn.

Roj helatin û roj cû avan
Hasretên min, ji min re kar man

Di jêr fêzê ku me pez lê mexildikirî
re, fêzeke biçuk hebû. Li wê fêzê, kerîyê
ku hejmera xwe hendik pezî xwe lê fêz
dikirin. Wê şevê fêze valabû.

Şevê berê, Çeçî Şerifê kulekên
xwe dabûn ser wê fêzê. Wê şevê tunê
bû. Here ku, ka çu kêderê. Wexta ku
Çeç, li fêzê dibe, kêfî tê navê. Ji me re
kilaman tewê û li bilûrê têxe. Yarinîyê
dikê. Devî tiji şore. Welhasil, dişlikî me
pê dihat û bi hemdî xwe dikeninî.

Mal ji bîra min necû. Virda û wêda
xwe tevda, tu feda nekir. Bedelêke
giran e, ji bo jîyanê. Tiştî, di demê xwe
da xweş in û li cîh û warên xwe da bi
rûmet in.

Ki hîn ez î, di wan mal û xilenanda
da bûm, min dît ku ji aliyê başur da
qeratîyêkê tê. Min mêla xwe rind dayê,
lê min dernexist ki çî ye. Nawalê pîrikê,
bi nav û deng e. Ê ji pîrikeke merxwar
da behsdikin. Pîrikeke cezû. Pîrikeke
insanan dixapîne û tiştên bitirs tîne serî
merîyan.

Her tiştêkî tê bîrê merîya.

*

Hekateke hetiyê serî Mehmedî Elê
Simo, heta bîra min. Min bi xwe ji
devî Mehmed nebihist. Ê qalê dikine.
Mehmedî cogiran û li ser xwe bû.

– Çileyê paşinê bû. Eyam li gorê
demsalê pir sar diçûn. Em ê li hewşoyê
Beşaxilê pêz bi xwedî dikinî. Zehmet e.
Berf tune. Erdî bûyê zinar. Em ê pêz
du danan yem dikinî. Kayê herdem di
wextê xwe da yê nayê. Yekcaran pezî
bircî dimînê.

Êwarê, pez yem xwer bişunda, min
pez ajote hundirî hewşo û derî qêmcene
girt û ketime hundirî tolikê.

Kolîtê me, nivê xweyî di erdê da bû.
Ser tolikê, bi daran girtibû û di ortê da
jî kutekek hebû. Ji bo ku pez, helnekişa
ser tolikê, me sirî li ser kolîtê rexisti bû.
Di kelekê diwarî ku li başur mêsdike
da, bacek ji tandirê re vekiri bû. Me
şivên xwe, li wê derê dikalandin û xwe
zivistanî li ber agirê tandirê germ dikir.
Me zemînî holikê bi hasira rexisti bu û
ser hasira jî kulavên şivanên yên kevn
dabûn ser.

Min lamba idarê vexist û bi kerman
û zermasîyên hîşik, agirekî xwe dada û
biroş da ser êr. Sarmê û di du pêz gerînê,
tu hal di min nehîştî bû, westiya bûm.

Min teboxê xwe titûne derxist û
cixareke xwe pêça. Pîlawa min ê dikelê.
Min ji cixarê nefeseke okkali kişand.
Hevale min, dilê xwe mal xwest, min
mîsade kir û ew cû mal. Ez bi tenê
mam. Li dor aliyê min hewşoyên din jî
hene lê ê ji min fîrk in.

Pîlawaya min, bûlke û bûlke ê dikelê.

Xeweke giran ê li canî min digêrê.

Tolike me ê nezike hewşo bû. Min mêla xwe dayê ku girpe û girpên têne. Ez derketime derve. Ji nişkeve bêdengiyekê ortalix heyna. Şevê tarî bû. Tariyeke kûr. Di doralîyê hewşo re cexbûm û bi ser pêz re mêskir. Min dît ku pez neyî rehat e û yî li şunekê danawestê.

Kuçikan dest bi lêtiketînê kirin û ba şên bû û kamişê hewşoyî bi lez ba babûn. Min li derdorên xwe nêrî min tişt nedî.

Dengê perikê çuçikekê û qirnîyekê hat.

Ez wegeriyam hundirî kolîtê û pîlawaya xwe yê bi cizirik, ji ser êr dîna û li ser nanî sersêlê kir. Bûxeke xweş û xweş ji ser pîlavê bilind bû. Min pîzafêke xwe bi mistê hûr kir û da sar hewanê.

Min hîn parîyê xwe yî siftê nekiribû devî xwe ku di navbarê qalîştankên derîda, bê li firiskîyêke xemgîn xist û ji nişkave derîyê tolîkê li ser piştê vebû û bayekî şên li hundirî tolîkê geriya û agirê min û îdare vemirand. Hundirê tolîkê bû qetran û cemed. Por li min gij bû. Ezî bi tene me. Dengê min di tu kesî negehê.

Min duxê xwandin û bi ruda jî hastê xwe ji berîya xwe dertêxist. Hemî kucikên Beşaxilayê lêtiketîn. Wek orkestrakê. Ortalixê bêaramî bû.

Min lamba îdarê bi hêsta vexist û tenekê da ser koziyan êgir û pifê kir

û bi destîvê tevda.

Wexte ku min serê xwe, ji tandirê heyna, min dî ku meriyî kî li hemberî min runiştîye.

Lal bûm! Mat bûm, dawestim.

– Lawî Elê Simo!

Dengê jinekê lê bedenê xwe a mêre kî ye

– Ê we rastê ê me?

Deng ji min derneket.

– Mehemedî mino! Ji min re cixarekê bipêca.

Dest û piyê min le hevdu piçikîn.

– Şeve dirêj in û rojên kut in.

Min cixarê dirêjê kir û bi hêsta vexist. Dema ku min cixarê jê re vexist, min dî ku qulên bîlivan tunên!

– Rojê heye lê yê bê tîn e.

Min zanî ku danîyê bi kevir in.

Min li derî nerî ku îmkanê ku ez di kelekê wî re derkevîm derva yê heye. Min, mina ku ez dê ardû bavêjim argûn kir û bi lez derketim derva û di ser diwarî hewşo re bazda û xwe gehanda nav pêz. Ew şaxsa, li ber derî hewşo demakê dawestî. Lingên xwe li erdê xistin û kira mire û mir û dît ku î tu avile nekê, berva rîya jêr hawşo, xuş bû cû.

Ez heta ku hevalê min, ji mal vegeirî li nav pêz tî û bircî dawestîm.

*

Neyse xwarzê, em werin Katê xwe. Karatî tenekê dîn nezîk bû. Li gor şewqê hîvê û rewza rûhê min şeklê karatîyê

dihate guherandin. Carna karatî dirêj, car û carna jî qût dibû.

Min xwe topa ser hevdû kir û şiva xwe yê zoxale, ji kelekê sêmer derxist, ji nav kulêv derkatim û li ser cokan runiştim. Ma xilafi nekavê, min li xwe anekir lê ez tirsîyam.

Sihê karatiyê, li gore şewqê hîvê dihat guherandinê. Ki yî wek gur an jî kuçikekî ye. Ki tam nezîkê fêzê jêr ma bû min dî ku gur e. Kî şik dibe ku gurê wîqas nezîke fêzan were!. Min bi xwe û xwe got; gurekî heşîm e ne weng bûye! gur li hivroniyê wîqas nezîkî fêzan nabin.

Ji ber ku gur, ji alîye başur da hat kucike bîne wê heynane.

Ez î lê temaşa dikime. Hivronî ye herstişteki xuya dike. Gur, dema ku keta nav fezê di jêr me re xwe avite erdê û xwe li ser kix demake dirêj lût kir.

Şivanê zana, şivanê jêhatî Apoyî Fatê Qirê digot; ji bo ku bîne xwe nere pêz û kuçikan, gurê xwe di kix bide.

Min demakê, gur temaşe kir. Kuçikên me, yekî li jor fêzê û yê din jî li jêr fêzê keti bûn. Dêmekî kuçikan him gur nedîn him jî bîna gur heynenan. Wekî din, ê li ser xwe ne, yê heft çîyan bi paş xwe din û xwe berdine gura. Ê mina yek şerê bûn.

Gur, demakê li fêzên xwe lut kir bi şunda, berve pêz hêza xwe kir. Min hewli rekir û kuçik kişê kirin û şivanên din hişyar kirin û bang kir got, dev direjî cax dibê. (Me navî gur hîlnadida. Ma

jê re digot, dewdirej, sûqalîn, pocpan û hwd). Gur şarpaze bû û bazda. Lê hîn bi nekevê fêzan nekati bû, kuçikan xwe gehendînê.

Kuçikên keriyên cîranan din jî gehiştinê. Min pîzbênd, ji destî xwe kir û meşîm.

Wexta ku ez gehiştme, kuçikan hatê hîngê gur wepcirandi bû.

Min kuçik ji ser gur qewitandin. Rewza ku min dît, ez kelegirî kirim.

Dêlegureke jincav û guhandîr lê micikî yê li erdê, xwe nûr kirîye.

Min laşê delegurê bi Bêremî Malê Fatê Reşê ve yekî ji me reyne pêşilê î din ji reyne paşilê hate dawiyê cîyayî Beşaxila bir û li vir kortek kola û veşart. Em veşariyan cihê xwe. Bi rê da kesî ji me deng nekir. Şivanên din jî cûn herdê keriyên xwe.

Gurî pir zîyankar û çavbircî ye.

Ji fêzên li ser pî rastê de, dengê bilûrê ke yê zîz û hesret tiji pêl û pêl dihatî, destpêkir.

Dengê bilûrê Çîno ye. Nasdikim! Bi salan e ku guhdidime ser.

Ziravê Kamûşî Qulê.

Weylo û weylo

Zirawê, hasretê.

Zirawê, xeyalan heşuyê.

Zirawê, li ser yare ku wenda buye.

Zirawê bêcaretiyê.

Bilûr digirî, dinalî û şîn dikir.

Merî dikane bibêje, ew zirawe, ziravê Çîno bu.

Ne ziravê Qamûşî Qul bu.

Dema ku Çîno, ji hewdu diçû û ji bilûrê wedikîştî, bilûr di dest Çîno da dibû hevîr.

Tilîyên wî dibûn yek cambazên li ser bên.

Hestîyên tilîyan dihêlîn.

Her quleke bilûrê dibû cemekî şên û pêl û pêl diherikî.

Eger Çîno, bilûr ji dest xwe berda, bilûrê bi xwe ziravê dombikira.

Çîno, ci kar û barên xwe hebûn, li qulên bilûrê barkiribû. Bilûr bibû wesita qirnîyê Çîno.

Efkarekê ez mahkum kirim.

Serpazê bûm.

Mina marî ku rojê pêvedayî regarîyam.

Min nizanî ci bikim û min di ber xwe da, hûr û hûr hestirk barandin.

Bayî bakur, dengî bilûra Çîno yî xemgîn, li deştê zîwên, nok bi nok belavdikir.

Dengî bilûrê li nav zavîyê genim da geriya. Darên zavîyê di jor fêza re, li ber hewayê bilûrê, xwe mina bûkên bî, badikirin û kelên genim xwe dihêjandin.

Erdê ku me, lê laşe gur veşartî yê li hemberî fezan bû. Dorê dinê rê bi şev, karetîyak li êrdê laşi delegurê xuya kir. Ji ber ku tarî bû min fark nekir ku ci bû. Demakê bi şunda wexte ku hîv helat min dît ku nêregurek e.

Gur, di dor axê li ser laşi delgurê re gaveke çerx bû. Der û dorên xwe bîn kirin. Paşê, bi pencên xwe erd kola û dawastî.

Serê xwe berjor heyna û dest bi zûrezûrê kir. Zûrezûre wî, demeke dirêj ajot.

Dû ra, seri heyna û di navbarê zinaran da wenda bu.

Min şivan gişt tema kirin û got; qêmişê wî nêregurî nebin. Kuçikên xwe girêdin me nêregurî neşînin.

Nêregur, dore dine rê jî hat. Vê carê ku du çelîkê pê re bûn. Nêregur, dîsa di derdorê cihê ku dêlêgur tê da veşartî re çerx bû û kire zûrezûr. Celikan doraliyê xwe bînkirin û li hevdû meskirin û kêlekê kortê ketin.

Dema ku zûrezûre nêregur qadiya, di dor laşe delêgure re çerxbû. Serê xwe heyna û çelîkan jî dan dû. Di nav zinaran da wenda bûn û cûn!..

Me carak din ew nêregur û çelîkanaan nedîtin.

Vegerîn– Yanki

Desteng: Yoksul

Ji hevdûcûyîn: Kendinden gecme, extas

Jêvekşîn: hakkından Gelme

Nêregur: Erkek alfa kurt

Kolît: Kulube

KARPE DIEM—CREA DIEM

Seyfi Dogan

1— *crea diem*

2— *Carpe diem quam minimum credula*

postero

3— *cura, ut valeas*

4— *ergo bibamus*

5— *nos cedamus amori*

Ew her penc rêz, min ji zimanî latînî heynen û asîmilê kirin. Belkî, ne tam asimilêyê jî yê. Cimkî; her rêz bi serî xwe bû. Min ew rêzan hûnîn ba hevdû û da ser hevdû. Ji wan rêzên, bi serî xwe, min helbestek peyda kir.

Ew rêzê avil min ji gotinên latînîyê girt.

Rêza dudîya a şair Horatius a.

Reza sisîye min bi xwe di nav gotinên Latînîyê da dît.

Rêza caran nave helbesteke şairê Alman Goethe yê

Reza pêncan min ji gotinên latînî girt. Xeyrî rêza didûya, min rêzên din tercumê kirin. Rêza didûya min şîrove kir. "*Carpe Diem quam minimum credula postera*" eger merî tam vegeîne kurmancîyê, mana wê rêzê dibe; —Rojê bigre, bawerîyê bi sibê make— . Lê min ew rêza— rojê di berîya xwe ke îşî sibê beli nebe— şîrova kir.

Dema ku min ew rêzana tercume û şîrove kirin; wa şîra derkete hole.

rojê peyda bike

rojê di berîya xwe ke, îşî sibê beli nabe qîmetê xwe bizane

berde em vexwin

berde ma asq me mat bike

Dema ku ez kûr fikirîm, helbestê hebûnî, hedonism, anarchism û mana jîyanê hûnî bîra min. Helbest ne fatalîst, ne teslîmbûnî ne jî aktorîter e. Peyxama şîrê; a ji te re dunê û jîyane te. Heqî jîyanê bide û naveroka jîyanê bi mana bike û li gor dilê xwe tijike. Berpîrsîyarê jîyanê te, tu yî. Ez nexwazim naverok û mana şîrê ji xwendawanan re hîng fere vekim. Hîngê tamê şîrê namê. Herkes li gore xwe şîrova bike û mane kê bide. Tama şîrê jî bi rast di virdayê û şîr wê demê dibê şîr. Şîrove û mana şîran li gor cîh û demê tê guherandin.

Horatius —Quintus Horatius Flaccus. Şairê Romayî. Ber Hz. Îsa 65 ciliyê pêşin 65 li Venosa hatîye dunê û berî Îsa 8ê cîriya pašîn mirîye.

Johann Wolfgang von Goethe. Şairê Alamanîya yê bi nav û deng e. 1749 li Frankfurt am main hetîye dunê û 1832 li Weimar dûne xwe guherîyê.

*Hebûnî —(eksîstensîalîzm)— Jîyanê xwe bi xwe mana bide. Herkesek ji buyêrên xwe mesûl e.

*Hedonism— Fêlsefeya kêf û sefa ye. Hema hema di her kulturekê de hedonism heye. Di mîtolojiya yûnanîya da Epîkurîs û Dionysos. Di mitolojiya kurdan da jî dewre ke Mitra û Mitojîya Haoma. Her dewrekê, hedonism li gor rewzê ekonomîya civatê şîrova kirîye û naveroka wê guherandîyê.

Anarşîsm — Antî aktorîtera doza anarşîsmê, civateke bêdewlet, bêsinif û bênavendî ye.

JI SITRANÊN FOLKLORÎK

YAR ÇELENGÊ

De wer were zend kilot bazing tengê
Ber ve xelkê diwêm bûkê, xwangê
Di pê xelkê ve diwêm vir de were yar çelengê

De yar yar yar neqewe ge
yar yar ma kula mitikê li mêrê te we
de yar yar yar sweda zû de bejna xwe herikand
Yar yar pêşîya qeytanê Samûlê perikand
Yar yar çavê min bejna kibar keto
yar yar parî devê xwe terikand

Yar yar yar şeva pêncşemê
lê lê zend kilote bazing tengê
Ezê berve xelkê diwêm bûkê xwangê
di pê xelkê ve diwem yar çelengê yar çelengê

RÎNDA MÎN

De bajarê rindê min Maden e
navê rindê min Rabi min Xanê
Her sê zerî ber malê dawestîne
Nizam ku rinda min kîjan e
Nizam ku gewra min kîjan e

De ez heyrane te malkê di ber girde
Terzîyan kerî yê berdan bi ser de
Dilê xelkê giştikê hewû
Dilkê min li rê ya mêrikê şar bi per de

De lê et etê ezê bimirim roka çara
Hûnê cenezê min dînin ser du dara
Her ku hêla goristanê şevitî re çûyî bavana
mêrî merdê te Mestê Hemê cahilê çing xaro



Hesê Feqês û kebaniya xwe.

Herem: QIRŞEHÎR

Gunde Bizbenge Jor
(Tosunburnu köyü)

Gotin: Hesê Feqês

Çavkanî: Bûka Hesê Feqês

Nurika Mehmikî Hecikê

bayî hêdî û hêdî dilivê
û binê sapî genimî ku nû hatine çinînê
hate ber malê me tînê
min ava çayê da ser êr
rûnê xinêzê tunebû
lê rûnê mangê sorî li ser sifrê bû
min çay dem kir
hêkên kelî sîpî kirin
tomatîz hûr kirin
zeytûnên reş dan ser masê
merîyek bi lez derbas bû
û silaveka bitisi da
kasetê koma xelika da ser têyîp
li ser sendelîyê runiştim
û xwarzîyê xwe pa

xwarzî min î deh salî
her sibê kê nanî teze ji dûkanê distand û tine malê me
mala wî ava be
min ji heqê internet cafê dida wî

du teyarên eskerîyê bi deng û werwerê
ji ezman dûr lê nezîkî serî min firin
du mêrên navsalî ketin herime
silav dan bi şunda xêr xwastin
min henek pere danê lê ne bi dile min bû
min çay îkramê kir
gotin ecele me heye emê dereng bimênî
hîng ew ji herime derneketine
du xort ketin hundire herime
û xêr xwastin
min ji wanan re got wî sirî di herimê da pakbikin ci dixwazin biwedim
wanan got; me mijûli meke me ji te ne îş ne jî heş me ji te xêr xwast
destbetal vegeîn

gundî xevle yê wê wextê
xwarzî belî nekir

axê zer û ezmanî heşine
gulvekirin û cilmiskî bûyîn ne xeme kesîyê
fezîletê li bilinga bi cîh kirine
cucikên kocerên bi lezîn
û berê xwe dan çîyan
di nav zinaradan wenda bû cûn
me rêwendî ye rê li ber wanan jî saşkirî yê

dêngê ziravî bûkê yî ji dûrê da tê
ba yî dengî ziravî bûkê derî bi derî digerîne
bîranînên insanan teze dikê
hekatên têne katkirine
hinek bîranînên mina tîran diqalişînine û wek kozîyên dişewitinîne
û hinekên jî yê bê dikine bin bîlivan

xwarzî min ji jêr da xay bû
lêbelêm ki î bixeda ketiyê û i destbetale
deriye herime vekir û kate hundir
– haco ka nan
– tu cima bê nan hatî
– dukana hesenê girti bû
– te ji ba memê bista
– cendermê li ber dukanê memê bûn.

Seyfi Dogan

Ziman û edebiyata kurdî di Unîversîta Selçûkê ya Konyayê de

Dr. Yusuf Kaynak

Ji kuderê ev sernava ket bîra min divê ez ji we re eşkere bikim. Di van çend mehê dawî de gelek nûçe û nivîsar di derbarê zimanê kurdî de di çapameniya Tirkîyê de hatin rojevê. Helbet tê gotin bi pêvajoya demokratîzê kirina Tirkîyê re çend mafên serekî bo kurdan ê bên realîze kirin, yek ji wan: "Ziman û edebiyata kurdî" ye. Bo vê yekê divê di zankoyên Tirkîyê de beşên kurdolojîyê bên vekirin, lewma navê Unîversîteya Artuklu ya Mardînê bi piranî derbas dibe. Ev unîversîteya wekî pêngaveke nimûne ya destpêkê tê hesabandin. Lê di gengeşiyên çapemeniya Tirkîyê de her carekê jî tunebûna dersdarên kurdî tê pêşîya desthilatdarên Tirkîyê.

Me jî di tatîla havîna çûyî de li Tirkîyê serlêdanek li Unîversîteya Selçûkê ya Konyayê kir, berî çûyîne me ew fikra di nav çend hevalan de, bi berfirehî niqaş kir ka em ê ji bo çî û bo kê, serî li Unîversîteya Selçûkê bidin. Me berê ji gelek hemwelatîyên li Konyayê niştecihî ne pirsî, ka raya wan derbarê vê serlêdanê de çî ye? Me daxwazên xwe bi yek dengî formule

kirin: divê tenê ji Unîversîta Selçûkê pirs bikin ka fikreke wan derheqê kurdolojîyê de heye an na? Û raya wan çî ye û derbarê vê xwestokê de, ji berî me kesekî hewldana serlêdanekê ji unîversîta Selçûkê kiriye? Mijara me her ev bû.

Dema çûna serlêdanê, heftê pêşî yê tebaxê bû, me ji rektorê zanîngehê rendevuyek xwest, wan got rektor ne li vir e, lê gotin ger hûn bixwazin rendevuyekê tev cîhgirê wî çêbikin, kerem bikin werin. Ji xwe daxwaza me bîstineke fermî ji bo beşa kurdolojîyê di zanîngeha Konya de bû. Ev daxwaz mimkûn e an na. Sedema vê serdanê li vî bajarî bi sed salan e bi sed hezaran kurd tê de dijîn wekî niştecihiyê qedîm. Loma mafê kurdên Konyayê heye doza ziman û edebiyata kurdî di qada unîversîteyê de bikin. Her çiqas Tirkîyê ne li gor dilê me û pîvanê navnetewî demokratîzebûyî be jî, divê kurd mafê xwe yê mirovî ji Tirkîyê bîstînin û bi serekî jî yê li Konyayê niştecihî ne. Roja em biçin rendevuya li zanîngeha Selçûkê, em bi xwe diponîşîn ku ev

daxwazeke wusa realîst e û mimkûn e. Dîtina min a şexsî pêwsîst e, em kurd mafê xwe ên nîştîmanî bi her cure ji Tirkîyê bîstînin û dest pê bikin, bi kar bînin û têkin jiyana xwe ya rojane.

Hemwelatîyê me yê li Konyayê dijîn jî ramanên me pejirandin. Em rabûn wek heyetekê çûn sekretariyeta Unîversîteya Selçukê. Cîhgirê rektor li benda me bû. Wî ez û biraderê li gel min ji dil pêşwazî kir. Unîversîta Selçukê yek ji zanîngehê Tirkîyê yê mezin e. Bi deh hezaran xwendevanên keç û xort tê de dixwînin û jê mêzûn dibin. Rektoriyatê berî çûyîna me kifş kiribû ku mijara me çi ye? Hêj me hevoka destpêkê neqadand û sedema serdana xwe eşkere nekir, cîhgir bi xwe şîrove kir, wan li ser navê Unîversîtaya Selçukê bi fermî ji YOKê (Sazendeya Perwerdeya Bilind) daxwaza beşa "Ziman û Edebîyata Kurdî" kirine. Hêdî ji me re zêde gotin neman; cîhgirê rektor bi xwe mîrovekî nûjen û xwedan peyam û şarezayî bû: hinekî ket nav guftugo, wî master û têza doktoriya xwe li Ewrûpayê amade kiriye û li Finlandiya û Holandayê jiyaye û ji van welatan bi kêfxwaşî behs dikir. Piştî me hevdu nas kir û hal û xatir pirsîn, min xwe teqdîm kir û got: min li Ewropayê di unîversîteyêke bijarte de turkolojî xwendiyê û bi eslê xwe kurd im û min têza qedandina zanîngehê li ser edebiyata kurdî amade kir û bi kurdî jî dizanim, ger unîversîteya we pêwîstî bi

docentên dersdarê ziman û edebiyata kurdî hebe, ez amade me arîkariya we bikim, ji bo ku beşa kurdolojiyê di zanîngeha Konyayê de bi rêkûpêk bibe.

Cîhgirê rektor gelekî kêfxwaş bû bi gotinê min. Li gor mevzuata YOKê divê ji bo Unîversîteya Selçukê berê ez îmtîhana Aleksê (Alex) bikim û divê ji zimanekî bîyanî jî îmtîhan bibim û bi devkî jî ji aliyê mutevelî heyeta zanîngehê bêm îmtîhankirin û divê ez serfiraz bibim. Cîhgirê rektor mevzuat ji me re wiha neql kir. Ew bi hevdu dîtî û naskirina me dilşa bû, got: divê em li çavnêriya biryara YOKê bibin, çunkî prosesa beşa "Ziman û edebiyata kurdî" tê re derbas dibe ne hêsan û maqûl e. Çunkî destûra bingeşî ya Tirkîyê maddeya 42an, ji bilî tirkî, bi tu zimanên din nahê perwerdekirin, lewma ev kar ne hêsan e, li Tirkîyê her tişt li gor destûra bingeşî tên erênîkirin, kes nikare ji serî xwe de weke zanîngeheke Ewropayê beşeke zimannasiyê yan beşeke zanyariyê veke. Niha hemû zanîngehên Tirkîyê guhdarî û çavnêriya biryara YOKê dikin. Em bi dilekî şa û kêfxwaşî ji sekretariyata unîversîteya Selçuk ya Konyayê derketin. Bandora vê serdanê û dîtîne hêviyêke nû da me ji bo pêvajoya me kurdên Anadolîya Navîn ku em hêdî di dîrokê de nebin peleke ji darê weşiyayî. Em mîna teyreki bi bask bûn, em dikariyan bifiriyana ji kêfan, em bi hêvî bûn ku Tirkîyê êdî

ber demokrasiyê ve diçe.

Lê kêfa me dirêj neajot, em hatin malê li benda biryara YOKê bûn. Roj hat YOKê biryareke nebistî û neyêt aqilan kir ku hêviyên meheke berê tev pûç bûn, em şaş man ku Tirkîyê doza demokratîzebûnê dike, qala vebûna pirsgrêka kurd dike. YOKê biryar li ser beşa kurdolojiyê an beşa ziman û edebiyata kurdî da ku ev hêviyên hatine holê hemû şikandin, navê beşa kurdî nepijerand, got: "Zimanên Jîndar- Yaşayan diller", ev navkirin tê wateya zimanên zindî. Ger YOK weha bidomîne di demê nêzîkî de kurdî têxe nav zimanên mirî, mînak: asûrî, hîtîti, latinî, aramî, sumerî... hwd. Tirkîyê naxwaze kurdî wek ku zimanekî zikmakî di dibistanê Tirkîyê de were xwendin, bi serekî di dibistanên serate de. Dizanin bi milyara mesrefê ji dewletê re çêbibin û pêwîst e mevuzata Wezareta Perwerdeyi bi temamî were guhertin û bêt serrastkirin û berçavkirin, kurdolojî navê zanyariyeke divê derheqa kurdan çî hebe ji aliyê vî îlmî de bêtin xwendin û lêgerîn. Ev beş ji butçeya Tirkîyê re ekstra mesrefên giran derxîne û hinek rewşê nû ê derkevin hole, dewlet ê bikeve tengasiyê û ditirsin bi destê xwe kurdî pêş ve bibin û kurdî bikin zimanê duyemîn.

Divê em bi kîjan hîs û helwestê ji Tirkîyê bawer bin, ew di rîyeke rast û maqûl da ye. Ez bi xwe bi vî navî û navandine beşeke ku ji kurdan re bibe

yar nabînim. Çunkî mebesta Tirkîyê derheqê kurdan de nezelale. Ger Tirkîyê hêj ji navê kurdî bitirse divêt ev çawan rê li ber otonomiya kurdan ya sîyasî vebikin. Kurdî ne zimanekî kevnareyî ku ketiye rûpelê pirtûkê kevnare û kurd hê nebûye malê arkeolojiyê ku arkelog lêgerîna derheqa wan de bimeşînin. Ev navê nû li mîletê kurd heqeret e, çimak miletekî zindî ye, hejmara wan 40 mîlyon e, navê wî heye... û zimanê wî hebe, çima wî bi navê wî bi nav nekin, bibêjin: "Zimanê jîndar - Yaşayan dil". Ma ew navkirin li mîletekî ne heqeret e tu kes dengê xwe bilind nake! Li dinyayê di 30 welaatî de kurdolojî wek beşeke zanistiyê heye, gelek kesên akademîk tê de ders didin. Ma Tirkîyê heta kîngê bi çavekî nebaş û piçûkî li kurdan û zimanê wan binihêre. Bi baweriya min ji hebûna kurdan ditirsin, lewma ne bi dilsozî, lê bi tirs in, gavên newêrekî diavêjin. Sedem naxwezî di zanîngehê bajarên kurd û tirk tê da, kurdolojî bê damizrandin, ger hatin damizrandin wateya wê di van beşên kurdolojiyê de ev ders û lêkolîn û lêgerîn ê bîn kirin. Mînak: a. gramera kurdî ya nûjên tev zaravan bê hînkirin, b. klasîkên kurdî yê hemû zaravan bîn xwendin, c. tekstê kurdîya hemdem ê bîn xwendin û analîzkirin, d. tarîxa kurdan a kevin û ya vedora navîn bête xwendin, e. tarîxa gelê kurd a nûdem ê bêt xwendin, f. hemû hunerê kurdî: hunerê destan û hunerê hemdemî ê bîn xwendin,

g. erdnîgeriya welatê kurdan ê bêt xwendin, h. folklor/ zargotina kurdî ê bèn xwendin, i. îslam û mezhebên wî û olê cuda di nav kurdan de ê bèn xwendin... hwd.

Ez realîzekirina van dersan hemûyan vê gavê li Tirkîyê di bin magezagoneke nijadperest de mimkûn nabînim. Lewma Tirkîyê gavek pêş de gavek şûn de diavêje, nikare were ser rastiye û hebûna mîletê kurd û çanda wî qabûl bike. Ji wan re giran têt ev dersên ku min bi nav kirî di zanîngehên wan de werin xwendin. Ev dersên min gotî ger kurdolojî hebe, bivêt nevêt divê ev ders wek tadrîsata kurdolojîyê hebin. Loma Tirkîyê xwe badide ku bi erzanî ji kurdan xilas be.

Ger ev tadrîsat hebin û bêtin pejirandin, divê gorî temaya lêkolîn çêbibin û li ser daxwazê xwendekaran cûre cûre têzên doktora û pisportiyê werin kirin. Ev niqte bo Tirkîyê hêj ne zelal in. Ger kurdolojî hat damezrandin, divê nakokiya nekin nav kurdî û zimanê wan, divê kurdî tev erdnigarî, etnoxaftî, demoxrafiya kurdan li gel dîrok û edebiyata kurdan bê xwendin, çî di beşê turkolojîyê de li cîhanê tîn xwendin, divê kurdolojî jî li tirkîyê wusa bibe, tu kendûkosp li pêşiya wê neyên danîn.

Rastiya Tirkîyê newêrekî ye û bêcesaretî gavan diavêje, ew dersê ku me li jor jê behskirî ji bo kurdolojîyê "to be or not be" yanê hayatî ne, ji bilî

vê tadrîsatê kurdolojî nabe kurdolojî, dibe kurseke zimanekî bîyanî. Li vê dûmayikê serokê YOKê prof. Yusuf Ziya ÖZCAN di derbarê kurdî de gotinek kir ku mirov ji guhê xwe bawer nedikir, çawa mirovekî li postekî payebilind û rêvebirê saziyekê zanyarî û weletekî giredayî ewrûpayê, dikare tiştêkî dijî îlmî derheqa zimanê kurdî de bibêje. Ez bawer nakim ku serokê YOKê lînguîst e an jî edebiyat zana bibe, lewma gotinên wî ne îlmî ne, bi hîsên turkewarî diaxife. Prof. dr.Yusuf Ziya Özcan dibêje kurdî zimanekî deynî ye, ne serbixwe ye, belkû mîksîya (têkelî) çend zimanan e, wek: 60% farsî ye, 30% erebî ye, yê mayî jî tirkî ye, li gor vê şîrovê û nêrînê, divê kurdî nîne, wateya vê ew e. Baş e wê çaxê bi beşa kurdî û kurdolojîyê çî pêdiviya xwe heye. Heyf e ku serokê YOKê bibêje kurdî ne zimanekî serbixwe ye, wê demê gotin namînin ji bo "vebûna kurdolojîyê" û "vebûna kurd". Li Tirkîyê bi dehan belkî jî bi sedan kesê bi ûnvana prof. û dr. hene û li ser înkara zimanê kurdî têz nivîsandine bûne doçent û profesor. Ev tevkuştina kurdî di nava hejmarek akademîsîyenên Tirkîyê de her heye. Ez ê di nivîsara xwe dahatû de li ser çend navên akademîsîyenên tirk yê derbarê kurdan de û bi gelemperî jî derheqê kurdî de nivîsandine rawestim. Çunkî mebesta nivîsarên wan qirêj û gemarkirina kurdî ye û şelokirina mêjuyê gelê tirk e.

Materyalên perwerdê û lîteratura zarokan 6 november 2009

"Ziman û zarok pîroziyên me ne!"

Ali Çiftçi

Hîndekariya kurdî li derveyî welêt, bi taybetî bo kurdên bakûr, rojhat û başûrê biçûk li Swêdê bi dîroka perwerdeya zimanê malê ve destpêdike. Dema em li programa perwerdê ya Swêdê dinêrin, cara pêşî di programa perwerdê ya Lgr 80î (mufredatê ya Swêdê ya sala 1980) de bi navê zimanê malê (hemspråk) lê rast tên. Berî vê di programa Lgr 69an (mufretadata-1969an) de tenê meriv kurseka bi zimanê finî dibînin.

Li gor Lgr 69an di heftê de du saet, di şûna dersek din de ev perwerdeya tenê bi zimanê finî hebû. Heta sala 1975an li Swêdê dîtineka ku xerib li nav civata Swêdê de bên asîmîlekîrin hakîm bû.

Piştî lêkolîn û encamên perwerdeya asîmîlekîrinê, di piraniya raporandê hat diyarkirin ku ev di aliyê perwerdê de ne serkeftî bû. Bilakis ji bo fêrbûna zimanê serdest astengî derdixist pêş.

Bi biryara parlamentoyê ya 1975an de, perwerdeya bi zimanê dayîkê bi fermî hat qebûl kirin.

Bi vê polîtîka nû, xerib di gelek

katên civakî de bûn xwedî mafên wek azadiya hîlbijartinê, wekhevî, xwedî berpirsariyê û mafên demokratîk û kesayetî, wek hemwelatîyekî Swêdê.

Bi vê biryara fermî ya meclisê, di sala 1977an de reforma hîndekariya zimanê malê jî destpêkir. Li gor vê reformê, mafê her zarokê di heftê de du saeta hîndekariya zimanê xwe yê malê bibe û heger hewce bike du saeta jî bi zimanê xwe yê malê alîkariya dersên din bigrê, heye. Ev maf jî her li ser daxwzeka azad e. Lê ne mecbûr e. Yanî bi daxwaza dê û bav ve girêdayî ye, heger dê û bav nexwazin zarok naçin darsa zimanê malê.

Heta sala 1997an ev reforma fermî bi navê hîndekariya zimanê malê hatibû qebûl kirin. 1997an de di şûna zimanê malê, gotina zimanê dayîkê wek fermî hat bi nav kirin. Sebeba vê jî ev bû ku bi lêvkirina zimanê malê, ji bo kesayetiya zarok tu tiştêk îfade nedikir. Ji ber wê ev guhertin kirin, perwerda zimanê dayîkê (modersmålsundervisning).

Ew reform li Swêde, bi qanûnî di-

keve berpîrsiyarîya hemû Şaredariyan. Şaredarî ji bo belavkirina agahdariya vî mafî berpîrs e. Ji bo peydakirina mamosta, kitêbên perwerdê û peydakirina hemû îmkanan berpîrs e.

Bi vê reforma hîndekariya bi zimanê malê re, di pîla universitê de, di dibistana bilind a mamosteyan de, beşa mamosteyên bi zimanên malê (Hemspårakslârlarlinje) hat vekirin. Di destpêkê de ji bo deh zimanên mezîzin beş hatin vekirin. Di nav van deh grubên xerîb de beşa zimanê kurdî jî hebû. Beşa zimanê kurdî 1985 heta 1995an berdewam kir.

Hîndekariya zimanê kurdî li Swêdê jî bi vê prosesa li jor destpêkir. Yanê bi mafên ku ji bo xerîban ji teref dewlêta Swêdê ve hatibûn dayîn, kurdan jî jê feyde dîtî. Bi taybetî jî kurdên ji Bakur û Başûr hatibûn, bi aktîvî ev maf bi karanîn.

Materyalên perwerdê û lîtteratura zarokan jî li derweyî welêt, berî salên 1980î em lê rast nayên.

1980î bi desthilatdariya eskeriya Tirkiyê ve pîraniya kurdên politîkên Bakur derketibûn derveyî welêt. Pîraniya wan hatibûn li Swêdê bi cîh û war bûbûn. Mamoste Mehmet Emîn Bozarslan jî ji destpêka 1980î hatibû Swêdê û li wir Alfaba kurdî ku li welêt çapkiribû, li Swêdê careka din da çapkirin. Wek materiyala perwerda kurdî

tenê ew hebû. Di destpêkê de ev Alfabe dihat bikar anîn. Piştîre dema hêdî hêdî malbatên kurdan li Ewropa zêde bûn û peyderpey xwendina zimanê kurdî jî zêde bu êdî ew alfabe bi serê xwe hem têr nedikir hem jî ji aliyê metod û naverokê ve ji bo perwerda zikmakî li welatên Ewropa nediguncî. Daîreya Perwerdeya Giştî, beşa zimanên xerîban bi navê Em hîn dibin -1 û Em hîn dibin- 2, du kitêb bi hevkarîya komisyoneka sê kesan amede kir.

Ev kurdên politîk di destpêka 1980î de li Swêdê, di warê rêxistinî û hîndekariya zimanê kurdî de aktîv bûn. Bi dehan komelên sîyasî û çandî hatin damezrandin, dişan bi dehan weşanxanên kurdî hatin avakirin.

Federesyona komelên kurdan hat damezrandin. Bi vê wesilê kurdên Bakur, Başûr, Rojhilat û Rojava û yê ji Anatoliya Navîn hatin ba hev. Bi hev re, di karên politîk û çandi de kar kirin. Her bi zimanê kurdî bi hev re deng kirin. Ew hemû bû wesileyek ku êdî kurd, li Swêdê bi kurdan re radi-bûn û rûdiniştin!...

Ev têkilbûn û hevkarîyên hemwelatî bûn sebeb ku kurdên Swêdê bi her awahî xwedî li kesayetî û zimanê xwe derketin. Bi rêxistinî bûn. Ew hemû bûn sebeb ku mafên hebûn karibûn bi rihetî, bi kar bînin. Êdî zimanê kurdî jî li Swêdê wek zimanên din bûbû xwedî

statûyek û mafek ku karibû pê jiyana xwe bidomîne.

Bi sedan mamoste, tercûman û karmendên şaredariyan ku kurdî dizanîn bûn xwedî kar.

Rojname û kovarên mehane, pirtûkên perwerdê û yên zarokan, bi taybetî jî ji destpêka 1980 î heta van salên dawî jî bi awakî aktîv hatin weşandin.

Ji salên 1980î heta niha ew materyalên ji bo perwerad kurdî li derveyê welêt hatine weşandin.

1. Kurdî Hîn Dibim 1, Mahmut Aydin
Ji bo pola: 2 Weşanên YMKê
2. Kurdî Hîn Dibim 2,
Mahmut Aydin, YMKê
3. Kaniya Xwendinê, Fergîn
Melîk Aykoç, Ji bo pola: 3.
4. Tiştonek-1 Emin Akbaş, Ji
bo pola: 1-10, YMKê
5. Pexşanên Têgihîştinê-1, Emin
Akbaş, Ji bo pola: 3-5
6. Baxçeyê tîpan, ABC, (Alfabeya
Kurdî li ser CD-înteraktîf),
Dylan Saleh, Ji bo zarokên 4-
10 salî, Kitab-i Erzan, Swêd
7. Zimanê min 1, Haydar Diljen,
Ji bo şagirdên polên 1-3
8. Zimanê min 2, Haydar Diljen, Ji bo
şagirdên polên 6-9, lîse û salmezinan
9. Destpêka rêzimana kurdî,
Haydar Diljen, Ji bo şagirdên
polên 6-9, lîse û salmezinan
10. Ziwane ma Alfaba (dimilî/za-
zakî), Haydar Diljen
11. Kurterasti (sorani) A. Tîgrîs,
B. Welatevîn, Apec
12. Ansiklopedya zarokan, A – Z,
bi kurmasnci û sorani, Apec
13. Em Bixwînin -1, Amed Tîgrîs,
Ahmet Cantekin, Nesrin Aydin
14. Em bixwînin -2, Amed Tîgrîs,
Ahmet, Nesrin Aydin
15. ABC, Alfaba kurdî, M.
Emin Bozarslan
16. Şagird diçin dibistanê, Husamettîn
Aslan, Sabîha Orlu, Amed Tîgrîs
û Halûk Öztürk , Skolverket
17. Kurdîya Hêsan (Luk/Palin spel)
Xiyasedîn Zaroj Stêrk, Emîn Akbaş
û Dr. Zerdest Haco, polên 1-5,
YMK (Yekitiya Mamosteyên Kurd
18. Kurdî I, CD (Temrîn li ser te-
mayên têvel), Nefel, Ji bo polên 3-6
19. Waneyên rêzimanê kurman-
cî, Samî Tan, ji bo polên 8-9, lî-
seyê û salmezinan , Weşanên welat
20. Dergûşa nasnameyê (dîrok, wê-
je, cografya, ol û babetên din),
Haydar Diljen, Azad J. Erdem,
Remzî Kerîm û Mahmûd Lewendî
polên 8-9 û lîseyê, Skolverket (Daira
karûbarên dibistanan li Swêdê)
21. Kurdiya Hêsa, Sadik Varli, Îkram
Isler, Ramazan Turan, Cihan
Çelîk, Taha Ceyhan, polên 6 -8,
Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê

22. Alfabe, Misto Birodirêj, Apec
23. ALFUBEY kurdî, Ibrahim Amin Baldar, Apec
24. Gotinên min ên pêşîn, Hatice Polat
25. Pirtûka pêşdibistanê. Misto Brodrêj, Apec
26. Dîroka Kurd û Kurdîstanê, A Tîgrîs, A. Germiyanî, kurmaci û soranî, Apec
27. Cografya Kurdistanê, A. Tîgrîs, Naser Rezazî. Kurmanci û soranî, Apec
28. Kurterasti, A Tîgrîs, B. Welatevîn.
- Sol, pêlav, şekal, merez
 - Daçek, qertaf
 - Palkursî, palgeh, qoltix
 - Odeya xewê, odeya razanê, jûreya razanê
 - Qaryole, texte
 - Ocax, frin, kuçik
 - Badîn, şûşe, pîyale, qedex, pardax
 - Bestenî, berfeşîr, dondirmê
 - Demjimêr, katjimêr, saet
 - Eynik, awêne, neynik

Piraniya wan kitêbana, derweyî yên ku ji aliyê daîreya Perwedeya Swêdê ya Giştî ve hatine amede kirin, ji aliyê yek kesî ve hatine nivîsîn û ji ber vê yekê jî kêmasiyên xwe di çend xalên girîng de, di hemû kitêban de tê dîtin.

1. Mijar yek e.
2. Metod yek e.
3. Termînolojî cuda û guhertî ne.

Mijar û metod hema hema di hemû kitêbên ku bo hîndekariyê hatine amadekirin her wek hev in. Tenê termînolojîyên ku bi karanîne, ne wek hev in. Ew bi xwe jî sergêjîyeke mezin bo şagirtan çêdike. Bo nimûne li jêr me hinek destnîşan kirine;

- Cotmeh, kewçêr (meha dehemîn)
- Sermawez, mijdar, çiriya paşîn (meha yazdehmîn)
- Berfanbar, kanûn, berçile (meha duwazdehmîn)
- Firingî, şamik, bacanê sor, tamatês

Ji ber wan kêmasiyên ku di materiyalên perwerde û hîndekariya zimanê kurdî hene, neyên berdewam kirin divê dema kitêbên amadekirin, bi ya min, bi kêmasî ji komisyoneka sê an çar kesî ve bînin amade kirin. Ew kesên ku di wan komisyon an redaksiyonan de cih bigrên divê zimanzan, pedagoj û metodzan bin!

Çîrok, destan, stran, mamik, fabilên kurdî ku heta niha hatine berhev kirin û çapkirin ji ber ji folklorê kurdî hatine wergirtin, di aliyê ziman û navokê de baştir in.

Werger û adaptasyon ku piraniya wan dîsan li derweyî welêt hatine amadekirin, tesira welat û zimanên ku jê hatine wergerandin lêbuye. Herçiqas literatura zarokan bi zimanê kurdî hindik be jî ev kitêbên ku di van 20 salên dawî de derketine heta ciyekî wê kêmasiyê tijî dikin.

Hûn ZANÎNê dizanin?

Hevpeyvîn:
Welat Baran Mîrdesî & Sedat Turan



Amblema Komeleya Zanîne

Heval û xwandekarên hêja, me xwest ku em piçek qala ciwanên me yên li Swêd bikin. Di vê nivîsê de em Komeleya xwandekarên zanîngehê Swed, *Zanîne*, pêşkêş dikin. Avîn Ismail û Serkar Salîh ji Hewlêrê, Evîn Jamal ji Mêrdînê



Xwandekarên kurd di komçvîneke xwe de

Zanîne pêşkêş dikin. Em dipirsin ew dibersivînin.

– *Zanîn çi ye û tê çi maneyê?*

– Zanîn, komeleyeka kurdan e li ser agahî û teknolojîyê ye û Zanîn bi xwe tê maneya agahî û zanabûnê.

– *Armanca Zanîn ê çi ye?*

– Yekemîn armanca komeleyê ew e ku em xwandekar û akademîsyenên

kurd kom bibin, arîkarî û handana ciwanên kurd bikin ku ew xwe bigînin zanîngehê. Komele dixwaze girêdayiyek di navbera xwandekar û akademîsyenên kurd de çêbike, nûxwazî û toreke baş di nav endamên xwe da peyda bike.

– *Niha rewşa Zanîne çawa ye? Çiqas endamên xwe hene?*

– Vê gaveê 33 endamên me hene û bi endamên me yên kevn re hejmar dibê nêzikê 100 endaman. Piraniyê van endaman kurd in, lê belê çend endamên me yên ji xelkên din jî hene.

– *Hûn ji bo xortên kurdên ku li Swêdê dijîn çi dibêjin? Problemên wan çi ne û pêşnîyara we li ciwanên kurd çi ne?*

– **Avîn:** Problema yekemîn tunebûna kesekî nimûne ye (pozîtîf rol-model). Piraniya ciwanan li Swêd mezin bûne. Dê û bavên wan gelek êş û giranî ditine û zarokên wan jî para xwe girtine. Ji bo wê, bi "lâxhjâlp" (arîkariya dersê), em dixwazin bêjin em mîna we ne. Em ji yek cîhî ne û me jî ew êş û giraniya derbas kiriye. Em dixwazin ji wan

re bêjin ku me ew xilas kiriye, hûn jî dikarin.

– **Serkar:** Kurd û gelên dîn di berhev de ne, ciwanên kurd gelek xebatkar û çalak in. Bêguman problemên wan jî hene. Problemên wan a yekemîn mirovên ku li dor wan e. Pir ciwan piştî "Gymnasium" (lîse li Swêdê) dest pê kar dikin. Lazim e em arîkariya wan bikin ku hejmara kurdên xwenda zêde bibe. Em nikarin arîkariya hemûyan bikin, lê pêwîst e ku em ji ciheki dest pê bikin.

– *Hûn dûwaroja kurdên Swêdê çawa dibinin? Kurd dê entegre bibin yan jî pêwîst e werin entegre kirinê?*

– **Avin:** Va pirseke gelek kesanî ye, bersiv ji miroveki heta mirovekî dinê diguhure. Ez bi xwe bawer dikim entegrasyon jî jîyanek dilgeş re pêwîst e, him di malbatê de him jî di civate de. Entegrasyon naye wê manyê ku mirov xwe wenda bike.

– **Serkar:** Balans tişteki gelek girîng e di jîyanê de. Li wê ez dixwazim ku kurd entegre bibin, 30 sal şiva jî kurdî xeber bidin û Newrozê pîroz bikin.

– *Çalakiyên Zanîne çî ne?*

– **Avin:** Endamên Zanîne ê di şevan, semîneran de û di gerên piçûk de dicivin.

– **Serkar:** Zanîne amadeye ku arîkariya xwendekar û akademikerên kurd bike. Armanca me avakirina toreke bi hêz li hemû dinyayê ye.



Xwendekarên kurd di şahiya Newrozê de

– *Mirov çawa dibe endamê Zanîne? Mercên endamiyê çî ne?*

– **Avin:** Carina baş e ku mirov kesek bi hêz û bi bakrûndekê bibîne û nasbike. Em hev dibînin, bi hev re şa dibin û bi hev re tiştên baş dikin., arîkariya wan e, ditîna kar e... hwd.. Em arîkariya zarokek û xortên kurd jî dikin. Tenê merca endamiyê ew e ku mirov qet nebe 1 ECT(7.5 ECT, pûnekê li zanîngehê bixwîne yan jî zanîngeh qedandibe.

– *Ew di jwariyên ku tene peşiya Zanîne çî ne?*

– **Avin:** Em pîranî xwendekar in. Dersên me hene û ew girîng e ku mirov balanseke di navberê wane û Zanîne de çêbike. Ew jî ne hêsan e.

– *Planên we yên dûwarojê çî ne?*

– **Avin:** Em dixwazin ji bo xwendekaran bêtir aktîvîteyan çêbikin, pirtir û xortir endaman bikêşînin û bi vî awayî ew jî bi ramanê xwe piştgiriya Zanîne bikin. Di dûwarojê de em dixwazin têkiliyê bi akademî û xwendekarên Kurdistanê re daynin.

Têkilî: www.zanin.se

AKSARAY ZAZACASI (II.)

Nêçîrvan Qilorî

Aksaray Zazacasıyla ilgili yazımızın ilk bölümü dergimizin 41. sayısında yayınlanmıştı. Gramerle başlattığımız yazımıza kaldığımız yerden devam ediyoruz:

Nûno werde
Qala watte
Sayê şittî
Yisûnê merdî

Yenilmiş ekmek
Söylenmiş söz
Yıkanmış elmalar
Ölü insanlar

Gramer

4. SIFATLAR

Sifatlar, kişi, hayvan ve eşyanın, kısaca varlıkların özelliklerini belirten; renk, sayı, şekil ve benzeri durumlarını anlatan sözcüklerdir. Aksaray Zazacası'nda varolan sıfatlar adın hem önüne hem de arkasına gelerek, adı nitelerler yada sayı ve benzeri özelliklerini belirtirler.

4.1. NİTELEME SIFATLARI

Adları niteleyen ve özelliklerini belirten ve genellikle adın sonuna eklenen bu sıfatlara bazı örnekler şunlardır.

Laciko pîl	Büyük oğul
Gula sûri	Kırmızı gül
Kitawa qalini	Kalın kitap
Vergo vîşûn	Aç kurt (E.)
Kutika hari	Kuduz Köpek (D.)
Kincê hûwli	Pahalı elbiseler
Awka serdi	Soğuk su
Atîya kelayî	Kaynamış yemek
Lorika sîwkuri	Yetim kız çocuğu
Qêytê nimitî	Saklı eşyalar
Miêrdiko destihîra	Cömert adam
Kiyneka çimsîya	Karagözlü kız
Reya kirri/dergi	Kısa/Uzun yol
Tîmûna qoti	Kot pantolon

Örneklerde görüldüğü gibi sıfatla tamlanan adın dişilik durumunda, dişilik takısı olan 'î', çoğulluk durumunda da, çoğulluk takısı olan 'î' sıfat olan kelimeye eklenmektedir. Fiillerden türetilen sıfatlar, filin dili geçmiş zamandaki fil köküne, tekil durumunda *del/te*, çoğul durumunda da *dî/tî* eklenerek elde edilir.

Yeri gelmişken Aksaray Zazacasında kullanılan renk isimlerine de bir göz atalım:

Sûr	Kırmızı
Gilmor	Koyu kırmızı
Henar	Nar kırmızısı
Sipî	Beyaz
Guwr	Gri / Beyaz
Tûtik	Sarı
Zerd	Sarı
Hûz	Yeşil
Kiwo	Mavi
Sîya	Siyah
Qîyr	Koyu siyah
Portiçal	Turuncu
Mor	Mor / Kahverengi
Kalî	Mor
Qehverengî	Kahverengi
Pemme	Pembe
Belek	Ala
Hebeş	Siyah/Zenci

Kurmanci de görülen, mavi ve yeşil renklerinin birbiri yerine kullanılma durumu AZ'da sözkonusudur. Mavi anlamına gelen *kiwo* sözcüğü, bitkiler ve meyveler sözkonusu olduğunda, yeşil manasında kullanılır.

4.1.1 Ünvan sıfatları

AZ'da ünvan sıfatları hem ismin önüne hem de arkasına gelirler. Bu sıfatlarla kişinin, rütbesi, mesleği, akrabalık derecesi yada saygı gereği aldığı vasıfları belirtilir.

Appiko Ce'fer	Cafer amca
Xaltika Şemmiki	Şemik teyze
Malla Remezûn	İmam Ramazan
Siliko pehlîwûn	Pehlivan Sılık (Süleyman)
Biyriko qarîmûn	Kahraman Bıyrik (Bayram)

Ayrıca Aksaray Kürtlerinde sıkça görülen lakaplandırmaları ünvan sıfatı olarak görmek gerekir. Lakaplar bazen isimden ayrı, tek başına da kullanılırlar ve o durumda adın yerine geçerler. Lakapların ayrı yazıldığı durumları, sıfat olarak tanımlamak mümkün olsa da bunları, ad olarak tanımlamak daha doğru olacaktır.

Betiko zûraçî	Yalancı Betik (Battal)
Zûraçî	Yalancı
Mûnqîşi	Mankafa (D.)
Nîêşite	Yıkanmamış

AZ'da, varolan bazı ünvan sıfatları, ki bunlar çoğunlukla ad kombinasyonu ile birlikte kullanılanlardır, kullanım kolaylığı açısından bazen isimle kaynaşarak ve varolan adı da değiştirerek, kendi başlarına yeni bir ad olarak ortaya çıkarlar. Bazı örnekleri şunlardır:

Elefendî (Elî efendî)	Ali Efendi
Eldede (Elî dede)	Ali Dede
Millamer (Malla Omer)	İmam Ömer
Millamed (Malla Amed)	İmam Ahmet
Sîydamed (Seyîd Amed)	Seyit Ahmet

Hecomer (Hecî Omer)	Hacı Ömer
Hecmemmed (Hecî Memed)	Hacı Mehmet
Hecalî (Hecî Ali)	Hacı Ali

4.2 BELİRTME SIFATLARI

Adları sayı belirterek, işaret ederek, belgisiz olarak yada soru sorarak belirten sıfatlara belirtme sıfatları denir.

4.2.1 Sayı sıfatları

ASIL SAYI SIFATLARI / SAYILAR (HÛMARÎ)

Belirli asıl sayı sıfatları:

AZ'da sayılarla ilgili dikkati çeken bir husus yüzölçü sayılardan sonra, sayıya 'kere' anlamına gelen 're' nin eklenmesidir. Örnekler aşağıda görüldüğü gibidir.

1	Yiw
2	Di
3	Hîrê
4	Çeer/Çeher
5	Pûnc
6	Şeş
7	Hût
8	Heşt
9	Niw
10	Des
11	Des û yiw
12	Des û di
13	Des û hîre
14	Des û çeer
15	Des û pûnc
16	Des û şeş
17	Des û hût
18	Des û heşt
19	Des û niw
20	Vîst
30	Hîris
40	Çûras/Çuvras
50	Pûncas
60	Şeştî
70	Hûtê
80	Heştê
90	Niwê

100	Se
200	Di rê se
300	Hîrê rê se
400	Çeer rê se
500	Pûn rê se
1000	Hazar/Hazarêki
10.000	Des hazarî
100.000	Se hazari
1.000.000	Mîlyoni/Mîlyonêki
2.000.000	Di mîlyonî
10.000.000	Des mîlyonî
1.000.000.000	Mîlyari/Mîlyarêki

456 Çeer re se w pûncas û şeş.
 1234 Hazar û di re se w hîris û çeer.
 1.650.980 Mîlyon û şeş re se w pûncas
 hazar û niw re se w heştê.

2.555.444.836 Di mîlyarî w pûnc re se w
 pûncas û pûnc mîlyonî w çeer re se w çûras
 û çeer hazarî w heşt re se w hîris û şeş.

AZ'da **ve** anlamına gelen “**û**”, sesli bir harf ile biten bir kelimededen sonra gelirse genellikle “w” diye okunur. Yukarıdaki, *se*, *mîlyonî* ve *mîlyarî* rakamları örneklerinde görüldüğü gibi, bu rakamlar sesli harfle bittikleri halde w lie bitişik yazılmamışlardır. Yazım dilinde ayrı yazmayı uygun gördüğümüz bu sesleri okurken, doğası gereği bitişik okumamız gerekir. Yani, *sew* (=yüz ve), *mîlyonîw* (=milyon ve) ve *mîlyarîw* (=milyar ve) gibi.

Eğer sayı adları başka bir adın önüne gelirlerse bu durumda sayı sıfatlarını oluştururlar. Bazı örnekler:

Mi **pûnc literî awki** erênê
 Ben beş litre su satın aldım

Kurdasiyê Aqsara **hîre rê se serrî** verê amiye
 Akсарay Kürtleri üç yüz yıl önce gelmişler
Des engîştî yiw dest o

On parmak bir eldir.
Belirsiz asıl sayı sıfatları:
 Ûndê Bu kadar
 Çend Bir kaç
 Di hîrêki Bir kaç
 Tîêdi Hepsî

SIRA SAYI SIFATLARI

Belirli sıra sayı sıfatları:
 Yiwin Birinci (E.)
 Yiwini Birinci (D.)
 Diyin İkinci (E.)
 Diyini İkinci (D.)

Belirsiz sıra sayı sıfatları:

Verên Baştaki
 Wertî Ortanca
 Piyên Sonuncu
 Hîrêyin Üçüncü (E.)
 Hîrêyini Üçüncü (D.)
 Hazarin Bininci (E.)
 Hazarini Bininci (D.)

ÜLEŞTİRME SIFATLARI

Aksaray Zazacası'nda üleştirme sıfatları, asıl sayıların tekrarıyla yapılır. Tekrarlanan bu sayılardan ilki hızlı okunurken, ikincisi vurgulanarak okunur. Vurgu genellikle tekrarlanan ikinci sayının ikinci hecesine yapılır. Aşağıdaki örneklerde bunu siyah renkle belirttik.

Di-**di** İkişer ikişer
 Hîrê-hîrê Üçer üçer
 Çeer-çeer Dörder dörder

4.2.2 İşaret sıfatları/İşaret zamirleri
 Adları göstererek tanımlayan sıfatlara işaret sıfatları denir. Bu, şu, o diye bildiğimiz bu sözcükler aslında işaret zamirleri olup, isimlerden önce geldikleri için işaret sıfatı vasfı alırlar. AZ'daki işaret sıfatları/zamirleri, aşağıdaki tablolarda görüldüğü gibi eril ve dişil olmak üzere ve ayrıca yalın ve bü-

kümlü olmak üzere ikişer gruba ayrılırlar.

YALIN - ERİL		Yakın		Uzak	
Tekil		Çoğul		Tekil	Çoğul
No / Inno <i>Bu</i>		Nîê / Innê <i>Bunlar</i>		We / Ewe <i>O, Şu</i>	Yê / İyê <i>Onlar</i>

No lacik Bu erkek çocuk
Nîê mêrdikî Bu adamlar
We malla Şu imam
We xort O delikanlı
Yê meallimî O öğretmenler

YALIN - DIŞIL		Yakın		Uzak	
Tekil		Çoğul		Tekil	Çoğul
Na / Inna <i>Bu</i>		Nîê / Innê <i>Bunlar</i>		Ya/İya <i>O, Şu</i>	Yê/İyê <i>Onlar</i>

Na ceneki Bu kadın
Nîê kiynekî Bu kızlar
Ya meyi O ana
Yê ûnikî O nineler

BÜKÜMLÜ - ERİL		Yakın		Uzak	
Tekil		Çoğul		Tekil	Çoğul
Nî <i>Bunu/Buna</i>		Nîni <i>Bunları/Bunlara</i>		Yî <i>Onu, Şunu/Ona, Şuna</i>	Yî / Yîni <i>Onları/Onlara</i>

Nî lacîkî bişawi ke Bu oğlanı eve gönder
Yî pî ra vaci ki O babaya söyle ki
Yî bebegûn mekira bermayîş O bebekleri ağlatma
Yîni mekira bermayîş Onları ağlatma

BÜKÜMLÜ - DIŞIL		Yakın		Uzak	
Tekil		Çoğul		Tekil	Çoğul
Nê <i>Bunu/Buna</i>		Nîni <i>Bunları/Bunlara</i>		Yê <i>Onu, Şunu/Ona,Şuna</i>	Yîni <i>Onları/Onlara</i>

4.2.3 Belgisiz sıfatlar

Adları kesin olarak belirtmeyen sıfatlara belgisiz sıfatlar denir. Bunlara bazı örnekler şunlardır:

Qe, qet, yiw, di-hîrê, hire-çeer, niw-des, des-vîst, her, têyn, têdi, her.

Qe yîwêrî nîêvaki... Hiç biri demedi ki...

Yiw mîêrdik veciya tever Bir adam dışarı çıktı

Di-hirê riocûn be'de *İki üç gün sonra*
Têyn merdomî estê ki... *Bazı insanlar vardır ki...*
Milçûkûn têdini *Bütün kuşları*
Her rioc roşûn nî yo *Her gün bayram değildir*

4.2.4 Soru sıfatları

Soru sorarak adları belirten sıfatlara soru sıfatları denir. AZ'daki soru sıfatlarından bazıları şunlardır:

Çi, çito, çend, kimcira.

Ti çi gûre kennê?

Sen ne işte çalışıyorsun? (Soru erkeğedir)

Ti çi gûre kenna?

Sen ne işte çalışıyorsun? (Soru kadındır)

Ti erêbêda çito wazennê?

Sen nasıl bir araba istiyorsun? (Soru erkeğedir)

Ti erêbêda çito wazenna?

Sen nasıl bir araba istiyorsun? (Soru kadındır)

Kimcira ceneki şit dîoşenna?

Hangi kadın süt sağıyor?

5. Gün isimleri (Namê Rîocûn)

Bazar/Pazar	Pazar
Dima bazarî	Pazartesi
Salî	Salı
Çarşeme	Çarşamba
Pêrşeme	Perşembe
Yene	Cuma
Dima yene/Dima yenî	Cumartesi

Eki riocê yenî şimî

Ben cuma günü gideceğim

Ezo riocê salî bimî

Ben salı günü gelirim

Biyve riocê/rojde dima yenî yo

Düğün cumartesi günüdür

Şima riocê çarşemî se kenê?

Çarşamba günü ne yapıyorsunuz?

6. Mevsimler

Bihar / Êsar	İlkbahar
Êsar	Yaz
Payîz	Sonbahar
Zimistûn	Kış

7. Ay isimleri (Namê aşmûn)

AZ'da ay isimleri pek belirgin değildirler. Kürtçenin geneli ve diğer Zaza lehçelerinde de görülen ay isimleriyle ilgili karışıklık AZ için de fazlasıyla mevcuttur. Tek tek ay isimleri yerine, günlük hayatta genellikle mevsimlerden bahsedilir. Dolayısıyla otuz günü kapsayan bir dönemi anlatan bir sözcük yerine daha uzun bir süreyi kapsayan sözcükler tercih edilir. Örneğin, kış için, ve kış aylarını kapsayan her bir dilim için 'zimistûn' yada, karlar yada kar zamanı anlamına gelen 'wûrûn' tabirleri kullanılır. Bir diğer yöntemde ayları numaralandırarak söylemetir, dördüncü, beşinci ay gibi. Bütün bu karışıklıklara rağmen tesbit ettiğimiz bazı ay isimleri yada ay isimleri yerine geçebilecek tabirler şunlardır:

Qereqîşi	Ocak
Gûcigi	Şubat
Martî	Mart
Nîsûni	Nisan
Aşma pûncini	Mayıs
Êsarê verên/Aşma şeşini	Haziran
Êsarê wertî / Aşma hûtini	Temmuz
Êsarê piyên /Aşma heştini	Ağustos
Payîzê verên	Eylül
Payîzê wertî	Ekim
Payîzê piyên	Kasım
Wûrûn	Aralık

Bu yazı dizimizde kullandığımız bazı kısaltmalar şunlardır:

(AZ) :	Aksaray Zazacası
(E.) :	Eril
(D.) :	Dişil

Doktoreya Nebî Kesen a bi navê *Pirsgirêka kurd di pêvajoya Tirkîyê û Yekitiya Ewropayê de*

wek kitêb ji aliyê weşanxaneya Nomos ve bi zimanê almanî hatiye weşandin. Nivîskarê kovara me, Bîrnebûnê, Nebî Kesen bi xwe ji nehya Încovê/ Cihanbeyliyê ye. Bi salan e, li ser YE, Tirkîye û pirsê kurd serê xwe êşandiyê û lêkolîna xwe ya doktorayê jî li ser vê babetê di bihara îsal de kiriye.

Di vê kitêbê de li ser têkiliyên YE û Tirkîyê hûr dibe, di prosesa berendambûnê de bi taybetî li ser pirsê kurd li Tirkîyê û tesîra wê ya îndîrekt di danûstendinan de çî ne, lêkolaye.

Naveroka lêkolînê ji van beşan pêk hatiye.

1. Beş: Destpêk
2. Beş: Têkiliyên aborî û siyasî yên YE û Tirkîye wek berendam
3. Beş: Pirsên taybetî di pêvajoya danûstandinan da
4. Beş: Pirsgirêka kurd di danûstandinên endametîyê da
5. Beş: Tesîrên îndîrekt yên nêzîkbûna YE ya Tirkîyê li ser çareserkirina îxtîlafê
6. Beş: Di çareserkirina pirsê kurd ya Tirkîyê da tesîra dîrekt ya YE
7. Beş: Encam

Navnîşana peydakirina kitêbê ev e;
Weşanxane û navnîşan:

Nomos Verlagsgesellschaft
Waldseestraße 3-5
76530 Baden-Baden



Aktuelle Neuerscheinung



Die Kurdenfrage im Kontext des Beitritts der Türkei zur Europäischen Union

Von StB Dr. Nebi Kesen

2009, 343 S., brosch., 59,- €, ISBN 978-3-8329-4818-4
(Nomos Universitätschriften – Politik, Bd. 169)

Der EU-Beitrittsprozess der Türkei kann einen entscheidenden Einfluss auf die Lösung der Kurdenfrage haben. Die Vollmitgliedschaft der Türkei ist bisher neben den wirtschaftlichen Problemen an den politischen Mängeln wie defekte Demokratie, Verleugnung anderer nationalen Identitäten und der Rolle des Militärs gescheitert. Diese Problemfelder stehen in direktem Zusammenhang mit dem Kurdenkonflikt, der seit der Gründung der Republik existiert. Die Lösung der Kurdenfrage, z.B. durch den Aufbau eines föderalen Staates, ist daher eine unabdingbare Voraussetzung für den erfolgreichen Abschluss der Beitrittsverhandlungen. In diesem Kontext ist die bisherige Haltung der EU als unzureichend zu bewerten. Die Gründe für die Kurdenfrage, die Haltung der Türkei und der EU-Beitrag zur Konfliktlösung werden in diesem Buch hinterfragt und analysiert.

Bitte bestellen Sie per Fax 07221/2104-43, im Buchhandel oder **versandkostenfrei unter ► www.nomos-shop.de**

Name

Straße

PLZ, Ort

Datum, Unterschrift

Sie haben das Recht, die Ware innerhalb von 2 Wochen nach Lieferung ohne Begründung an Ihre Buchhandlung oder an den Nomos Verlag, Waldseestr. 3-5, 76530 Baden-Baden, zurückzusenden, wobei die rechtzeitige Absendung genügt. Kosten und Gefahr der Rücksendung trägt der Empfänger. Alle Preise inkl. MwSt., zuzüglich Vertriebskosten. Bei Online-Bestellung inklusive Vertriebskosten.



Nomos

Nomos Verlagsgesellschaft | 76520 Baden-Baden | www.nomos.de
Telefon 07221/2104-37/-38 | Fax 07221/2104-43 | sabine.horn@nomos.de

ZIMAN Û ZAROKÊN ME HEBÛN Û PÎROZÎYÊN ME NE!



MIZGÎNÎ JI BO ZAROKAN

Gelî zarokên qenc û şîrîn!
Mizgînîya me li we. Va ye APECê ji bo
we bi kurdî: bi zaravayê zazakî, soranî
û kurmançî ev kitêbên şîrîn weşandine.
Her kitêbek CDya xwe jî heye. Ku hûn
bixwazin, hûn dikanin di ber xwendina
kitêbê re bi deng jî guhdarî bikin.

BI DENG
LI SER
CD

BI DENG
LI SER
CD

BI DENG
LI SER
CD



BI DENG
LI SER
CD

BI DENG
LI SER
CD



Navnîşana xwestinê:
Box 8121
163 08 Spånga/Sweden
Telefon: 0046 (0)8 761 81 18
Fax: +46-8-761 24 90
E-mail: orderapec@telia.com

Navnîşana xwestinê:
Muzaffer Özgür
Postfach 900 348, D-51113 Köln
Telefon: 0049-172 298 24 51
Fax: 0049 (0)2203-30 16 30
E-mail: birnebun@hotmail.de